
Amer Çelik

DERWÊŞÊ EVDÎ

(Destan)



هەولێر – ٢٠١١

Amer Çelik

DERWÊŞÊ EVDÎ

(Destan)



Wezaretî Roşinbiri û Lawan
berêweberayetî Gıştî Rojnamegeri Çap u Bilawkirdinewe
Berêwebarayetî Çap u Bilawkirdinewe Hewlêr

Nawî Kitêb: Derwêşê Evdî
Nivîskar: Amer Çelîk
Çap: Çapxaney Roşnbirî - Çapa yekê - Hewlêr- 2011

Le berêweberayetî Gıştî Kitêbxana Gîştiyekan
Jîmara Sipardinî (1038) Salî (2011) Pêdırae

Hemû maf di parastîne Ji bo
Wezeretî Roşinbiri û Lawan û xewenî Kitêbeke
Em Kitêw Kitêbekanî Wezeretî Roşinbiri û Lawan
Le Ser Em Sayte bıxwênewe
www.kurdchap.com

sipasî ji bo :

- Hemû kalemêr û dengbêj (Hozan) kurdan yê ku arîkariya min kirin jî nivîsandina vê dastanê re .
- Wezareta Rewşenbîrî li Hikûmeta Kurdistanê li Hewlêr ku ev pirtûk daye capê

Nivîskar-Amer Çelik
Elmaniya 11.07.09

Pêşgotin û .....

gelek caran Dastana Derwêşê Evdî kefitye ber behis û vekolînan û çendîn caran wek pertûk hatî ye weşandin ,ji ber ku bi gelek şaxan tê vegêran û bi çîrok tê gotin û bi sitranî tê velorandin ..... kevintirîn têkistê nivîsîn li ber destê min yê li sala 1968 di nav pertûka nivîskar Mehemedê mela kerîm bi navê (gencîneyî foliklorê kurdî,komelek lawik û heyran) li Bexdad hatiye wşandin,dibe yekî kevintir jî hebe ! dibe ez û kak Amer Çelîk li hinek xalan li dor vê dastan hevdû negirin ,lê bi giştî ev berhem karekî pir baş û pîngavek piroze û dest xweşiyê li nivisîkarê hêja dikem .

Nivîskar Amer Çelîk di vê pertûkê da, rencek mezin kêşaye û hewil daye û ber xwe da ku vê çîrok û qehremaniyê ji tîmê malbata Evdî,yê Mulhim ve û sedemên vê evîndariye bide nivîsandin û bi gehîne ber destê xwendevan û xemxwarên folklora kurdî,helbet çend sala kêşa ye heya ku , berhem ketiye di pirtûkxana Kurdî da.

çawa stiranbêj vê dastanê di lorînin?

Stiran ev amrazê grink jib o berdwambûna her çîrokekê ,dastanekê ,rûdaneke dîrokî ya kariger dinav dîroka civatgehê kurdî da,çunke dîroka milletê me bi destê ne hez u dojminê me hatiye nîvîsandin evca wê çi ji mere binîvîsin zêdeyî reşkirina rû yê geş ji vê dîrokê,lewra stiranên dîrokî-folklorî pişkeke mezin ji dîroka milletê me dinav xweda hembêz kiriye û nehêlaye bimre û her zindî vejandîne û ev xalên xwarê wê pitir mebesta me ron û aşkira û zelal bike :

A: eger hunermendekî nîgarkêş guhê xwe bi başî bide wesf û saloxetên vê stiranê wê bi senahî wêneyê Derwêşê Evdî di xeyala xweda ava bike û dikare bêxe ser kaxezê ,hindî we bi şarazane riftarê li gel wesfê vî mêr xasî kirye ji kinarê cil û berg û ser û sîma û rabon û runiştin û zîrekî û rêveçon û deshelat û mêrxasî û pelewanî û egîdî û şûr û hesipê wî û kenî axvtin û saloxêt şer ûceng û hêrişan wisa mina filîlmeki sînemayi li ber sonahiya çavan re derbasdike.

B:şer û ceng di navbera kurdan wek berevanîker ji alyekî ve û Ereb ,Turk

wek hêrişber ji alyê dinve,wisa ji di stiranêde tê gotin(bila di bangîna bavê min werin konê meyê mezin xilsaken ji devê şoran û pala.....

Yên wek Everê Gêsî û çîl Birahîm Turkan bila di ser taximê me kurdan raneken ne bêraq û ne tu Ala...)

Li vir hestê netewayetî tê pêş û di aşkirakirin ku Ězîdî li wî ser demî pitir tevî esîretên busilmanan digunciyay bûn û wek kurd bervanî ji mavê xwe kirîne.

C: Erê gelo çima dastana (stiran) hinde binav û bang bû?

Bi dîtina min fakterê evînî û dildaryê buye ji amrazên sereke yên mana vê dastanê û belavbûna wê bi vî şêweyê bervireh,ankû heger evîndarî li gel buyerên dastanê têkhel neba wisa bi vî rengî li berxwedana xwe ne didomand û hêdî hêdî wê berev nemanê û berzebûnê çuba,û belge bo vê gotinê em cend mînakan bi rêz deken Mem û Zîn, Ferhad û şîrîn,xec û siyamend,xensê û reşo û Derwêşê Evdî û edûlê, welê li vir viya em nasbiken ku dastan tenê binavê

Derwêşê Evdî ye u Edûl ne kesatiyeke sereke ye belkû di rêya wêda stiran hatiye velorandin û raçandin ankû egîdî û mêrxasî berî evîndarî û belku evîna wan ne li vî astê jê tê gotin be.

D: stiran bi gelek şaxan tê gotin lê her yek ji ya din xweştire û bi t amtire ,ankû mirov jê bê zar nabe û her bi çi şêwazî bê gotin ,mirov li gel rûdanêt we di jît û glek daxbar dibe û jibîr dike ku Edûl busilmane û Derwêş Ězîdî ye ,ji layê din kesen busilman ji hene hez li vê stirane diken anku berê xwe diden vê stiranê bi çavê netewe parêzyê û welatperwer yê lêguhdar diken ne bi olperêsiyek berteng.

E: eger pêş pitir ji du sed sala Derwêşê Evdî hewil da be ku hez ji qîzeke busilman bike û rê bişeqîne û her baedrê û mirê şêxan qayl bike û di şonde di çe lalîşê û bavê şêx şêx Nasir şêx Hisên daxwaziya wî red dike û li ser daxwaziya wi qebûl nabe ke ,li virda xuya dibe ku heramkirin û helakirin di Ězîdiya têda li wî serdemî di destê bavê şêx da buye ,anku berê desthilatdariya rûh.nî (dînî) ya bavê şêx buye û rolê mîrî tenê an dinyewî mrêveberiû dinyadrî buye neku

di vê pileya dînî a niha de buye û ev xale bixwe diviya bibe rawestgehek ji rewşenbîran re û bi giranî lis er bi sekinin .

F: Gelo eger ev dastan bi rengê stiranê û di kirasê evînyê da neba we xwe li ber bahoza ji bîr kirinê girtiba? Ez bibawerim bersiv we bi na be ji ber ku pitirya dastanê kurdi yên here zîndî li ser binaxeyê û binewaşî evînî û dildariyê û jin jiamrazên sereke ne ji bo berxwedana vê dastanê ji demên dirêj re ,anku ya vê gotinê Evînî buye fakterkî binyatî ji b omana zindebûna dastane ,bele di rastiya xweda ne weha buye belku lehengî û pehlewanî û egîdiya Derwêşê tine pêş çav lê bi rengekî dastaneke vestirayî bi evîniyê..... û ji ber vê yekê Ězîdî hezli stirana Derwêşê Evdî tîne pêş çav eger ne weha ba dê çawa di xoşiyê xweda çîrok û dastan û stirana Derwêşê Evdî bêjîn û velorînin û Edûl ji fakter û hawkarên nêgitîve bi ditina Ězîdiyan çunke busilmane.

G: çîroka Derwêşê Evdî bi gelek şaxan tê gotin û dastan û stiran bi gelek coyin û cora tê velorandin tevî cîwazên selîqa we

,ere gelo ev çi digehîne û ev cîwazên hanê ji kur hatiye ? bi nêrîna min ev ji zengînî û dewlemendiya stiranê ye nekû yek hizr bike ev ji behayê dastanê kêm bike yanjî ji rêje ya we a filoklorî,dîrokî,civakî bîne xwar û nizim bike ,belk û ez beuvajî tê digehim,lewra geha ye pileya ser asayîre dinav civakê Ězîdi da.

H: yusif kurê Temer kurê Xelef kurê Bişar Axa kurê Mustifa kurê Mulhem kurê Evdî Axa ji minre weha got: gundê Evdî Axa olaxçê bu û heya nuha ji her gundê meye û Evdî Axa dû jin anîbûn ,Derwêş û Sedûn ji yek deykê bûn binavê Eyşa Weliya ji malbata buyib begê ji eşireta dina bû,û Derwêşê Evdî heft bira hebûn,sedûn,mulhem ,temer,meysel ,mehmûd ,begzade,xelo) û got bi texmîna min ev buyer vedger 1790 heta 1793 û gorê Derwêşê Evdî li serê girê Etşanê û nêzîkî 15km durî wêranşehrê ye.niha malên me di pirin û li suriya û turkiya û almaniya di cihwarin û eve dara binemala meye.

Çend pêzanên li dor vê dastanê

1: dastana Derwêşê Evdî buyereke dîrokiye ne pêwistî kêş û vekêşê ye û li sala 1791 z Derwêşê Evdî xwe gorî ax û namûs û cih û ware xwe kiriye û berevanî ji eşîret û qulba Milla kiriye û her li wê salê osmaniya hêriş kirye ser qulpa Temer paşa ji berk u hêşta lis er hukmî bû û nehatibû guhorîn , helbet li sala 1780 hatiye hilbijartin ji bo serokatiya êlên Kîkan ,Milan,şerqiyan ..... li sala 1790 sultan Selîm fermanda walyê bexda Silêman paşa ku hêrişekê bibe ser Millan ,helbet leşkerê walyê Musil Mehemed paşayê celîlî tevlî di be û berev Mêrdînê di hajon û di gehine cem Birahîm paşa walyê orfayê yê ku ji layê sultan Selîm ve hatiye destûrdan ji bo şerê Temer paşa tevî 20 hezar serbazan ve ,helbet şerekî giran rûda û kelha Bûk kete destê leşkerê osmaniyan û Ereb û turkan û Zor Temer Paşa şekestin xwar û Birahîm axa birayê Zor Temer hate dana wek serokê Milan

2: Rolê stiranê yê mezin di parastina dîroka kurdî da nayê windakirin ,lê hinek bizav hatîne kirin ji bo têkdana rolê stiranê û jinavbirin û pêşêlkirina stiranê û xistina

hindek stiran û dastanên kurdî di bazinê gumanêda bimerema kêmkrina bihayê wê yê dîrokî ,ev kar hatiye kirin bi handana hindek layena ji bo meremên wan yên taybet ,gelek stiranbêj ketine bin vê bandora hanê çi bizanîbûn yan jî bê ageh ,stirana Derwêşê Evdî ji ketiye ber bahoza guhorînê lewma têkistên çêkirî û nu hatine holê lê eger mirov bi çavekî ron û geş berê xwe bide van stirana û bi bihin guhê xwe bidene peyv û selîqa wan we baş zelal bek u ev têkist ne diresenin û orcinalin ,çunke têkistê resen wek peyvên resen û derîn ,wesif,wêneyên rasteqîne ji dastanê wek,dahînan û gotina stiranê û reftara stiranbêjî li gel gotin û peyvan zêdebari xuyakirina saloxetên wî serdemi û me radikêşe nav rûdanên stiranê wek pişkek û mirov xoşiyekî di hisêne ,hestekî nazik dileşê wîda dilivlive,ez bawerim stirana Derwêşê Evdî ji vê çendê qurtal ne buye wek stiranbêj Mehemed Arifê Cizîrî dibêje(Edûlê hêle û hewale dikirn bi Derwêşê Ebdî ra) ankuya vê gotinê ewe ku Edûlê tenê diviya Derwêşê Evdî bi xabîne û bihêle hemû yê berhev be ji bo berevanîkirinê ji bavê we zor temer paşa bike.

Hindek stiranbêj hene dibêjin ku çu peywendî dinav bera Derwêşê Evdî û eşîreta millan ne buye û ev stirane binavê Delîl hatiye vehûnadin û peywendî bi Derwêşê ve nîne û Edûlê evînî li gel pismamê xwe Delîl dikir û Xelîl Bakozî serkêşiya vê çendî dike û dide xuyakirin ku dujminatî dinavbera Eşîretên Ezîdiyan û Millan de hebû,lê dîrok vê çendî na selmîne.

3: hindek pêkol hatiye kirin dirêka vehûnandina hinedk stiranên lawaz ji bo şikandina Zor Temer paşa li ber çavên kurdan di her derokekî rê bi çitî mina dirustkirina rolekî aşopeyî ji Zor Temer paşa re di mesela kuştina Derwêş da û kêmkirina rolê Derwêş û bin axkirina pehlewanî û meznatî û lehengiya Derwêş.

Awireke dîrokî

Li vir em dê hewil deyin çend pêzanên dirokî û ..... Bi rêz bikeyin
Qulpa Millan: pêkhatî,
dinav xweda hembêza pir eşîret û qebîl,malmezin dikir,minak: şerqiyan,dinan,dûmiliyan,xaldiyan,kîkan ,dequriyan,paşat,meheliyan,kumneqişheyder a,koran,hesenan,seydan,dûdikan,zirkan,met inan,sorikan,nasiryan,xidirkan..... û hetd dibe hinek ji van ne kurd bûn jî mina beqare, cibûr ,û di gotina millan hezar millet
Cihwarbûna millan: li dor u berê van çiyan di geriyan Swêrk,pîrecek,Diyarbeker,Wêran şeher,Orfe û li çiyayê Qerec dax cihwar dibûn, ji Wêanşehrê heta Serê Kaniyê û çiya yê EbdulEzîz li rojavayê kurdistanê ,suriya,
Cîranên wan: Eşîretên Ereban ,şemer û Tey,Enze,babkên qeysî. zêdebarî Eşîretên Turkmanan.
Revîna Zor temer paşa ji Istanbûl û hatina wî ji bo nav Millan bo sedema duristkirna qulpa , yekgrtina Millan tevî eşretên din ji bo bersing girtina hêreşên şemer û turikmanan .

Heso Hurmî

Hollinda

Me çendik û çend şev, çendik û çend sal di bin nîrê zordariyê de buhrandin, û çendik roj û şev jî, di bin ronahiya stêrkan de buhrandin. Çend stran û miqam heliyan li ser germiya dilê me, çend xewn û xeyal,çend xem,çend hêvî sarbûn dibin zilma Turkan û Gêsan(Ereb)de. Çend gotin, axaftinên dijwar ji bê baweran û ta ji eşîrên paşverû yên destekên dijmin, di hişê me re derbas bûn. Çend hêvî westiyan li du kilamên dilan. çend dengbêj heliyan, di civat û di bin seqema,berf û baranê, di bin şewqa tavehîvê de winda bûn. Çend şivanan bilûr kevin kirin, çend hozanan bi agirê helbestê ve şewitandin dilên xwe. Çend kesan bi baweriya xwe kewandin birînên me....De heriyê....De, dengbêjoo.... Qîrka siwarê Hedban, fêris û egîdê Şerqiyan û Dinan. Ê de dengekî here siwarê ser lotê egîdê Êzidxanê, „Pêpahn", binemala Evdê Mulhim, axayê Şerqî. De herê... Dengbêjo!.Bila dengê te zîz û lal bibe li beriya Wêranşarê, li kopik û kelha Diyarbekirê, heye bigeha ser girê Etşanê, bila dengê te lal û zîz bibe li çiyayê Ebdil-Ezîzê, heye ku bigeha sînorê Cibira, belê bila dengê te balav bibe li welatê Kurdistanê li nav çil û çar eşîrên kurdan, bila dengê te bikeve guhê egîd û fêrisên eşîra Milan.
Çend caran baweriyên me hatin daxdan, û çend caran li dîwarê zilmê qelibîn baweriyên me, stranên me, yê egîdan hatin winda kirin, lê

baweriya me ya zexim rê neda mirina hêviyê.....Mirin ew cihê kû hêvî lê diqede û bê bawerî dibe.

Hêvîyên xwe yê xilasiya ji bin tariya dîrokê û bindestiyê, hêviyên jiyaneke azad û ronî; dinyaka ku ji zilm û zorê, ji belangaziyê, bircîbûn û xirabiyê paqijkirî qewîn bigirin. Bi vê hêviya xwe ve welatê rojê binivînin. Hûn jî bi stran û maqmên Kurdiya resen, dibin ronîya Şêşimis û Melek Fexredîn de, gotinên kurdî bineqşînin.

Li Kurdistanê, li herêma Wêranşarê, Batman û beriya Diyarbekir û Mêrdînê, Pêpahn hebû, binamala Evdiyê Mulhim axayê Şerqiyan û Dinan bû.

Pêpahn egîd û celeng bû, şervanekî binav û deng bû. Pêpahn bi arîkariya egîdên Şerqîyan û Dinan, xerc û bêş nedidan dewlata dakirikeran. Belê xortên xwe jî nedişandin leşkiriya wan. Xortê ku biçuya leşiya wan xwînmijan, heger nehata kujtin...Winda dibû...!! Şer û dijminiya wan xwînrêjan ketibû dilê Pêpahn. Lewma jî dijiminên merovaniyê bi arîkariya eşîrên kurdan yên kû bi navê dînî Girêdayî dewlata dakirkeran bûn, Pêpahn ji pêşiya xwe dane aliyekî.

Rojekê pişitî ku Pêpahn talanekî mezin ji kedxwaren birbû, merovekî belengaz li mala Pêpahn dibe mêvan û ji wî daxwaz dike ku dema here şer û talana bîne, wî bi xwe re bibe. Pêpahan

bi rageşî bersiv dabû û gotbû:
„«Di hewşa min de gelek ga,hêstir, hesp hene, çendike ji wan ji xwe re bibe û pêwîst nîne tu xwe bidî kuştin.» Mêvan jî bersiv wî weha dabû:
«Daxwaze min ne mal û talanin, belê dixwaza min ewe ku, agirê di dilê xwe de vemirînim. Heyfa bav-kalan ji wan xwîn rêjan hilînim. Ma tu dizanî ev çend carin ku fermana me rakirine!!...,Malê me talan kirine, zarokên me,mêrên me kuştine, jin, namûsa me dane ber lingan.»
Pêpahn û mêvanê xwe lingê dijiminên xwe ji herêmê birîbûn. Piştî ku Pêpahn bi tedibîrekê dane kuştin. Erê piştî kuştine Pêpahn eşîra Pêpahn ji hev belav bûbû.
Kurekî wî hebû heşt-neh salî ji fermanê xelas bûbû, di çiya de, di şikeftan de, mezin dibû.Navê wî Evdî bû.
Evdî ji tîne û birçîne pirr bê hal bûbû, ewî konek dîtibû, ji neçarî xwe avêtibû bin stara kon. Xudanê Malê jî, ji wî daxwaz kiribû ku ew wê xulmiya mala wî bike li himberî wî karî ewjî wê Evdî xudanbike.
Evdî kar û xulamtiya mal wî bi nan û zikê şeş-heft salan kirbû. Êdî Evdî egîdekî bi zend û bend bûbû, xudanê şûr û rim bû.

Rojekê Evdî li ber keriyê peze, dayîk, bavê wî têne bîra wî...Welat, eşîr, pismam hatibûn bîrê.

Meraq û evîna malbat û pismaman tu rê ji ramanan re di serê Evdî nehiştibûn. Di ber çavan re derbasdibû ku çawa leşkerê romê, mêr-kalemêr, jin û zarok ser jêdikribûn....Namûs li ber çavan talan kiribûn, êdî Evdî biriyara xwe dabû kû li heyfa bav-kalan bigere. Wekî şêrekî dil birîn, xwe dabû ber zinarekî ji zinarên çiyayê Batmanê. Di demeke kurt de, çil-pêncî xort û egîd yê ku ji ber zilma Roma reş bazdayî xwe li Evdî dabûn hev.

****

„Evdî dizewice, xwedê du zaro danê, navê wan danî Elî û Îskan. Îskan bi mêranî û çelengiya xwe ne kêmî bav û bapîran bû.
Elî û Îskan zewicîn xwedê kurek da Elî navê wî danî Mustefa. Îskan jî navê qîza xwe danî Qeşem. Mustefa Qeşem ji xwe re guhast, xwedê lawek da wan nav bavê xwe li ser lawik danîn (Elî). Elî zewicî û xwedê kurek dayê navê wî danî Mulhim. Mulhim navê kurê xwe danî Evdî. Evdî zewicî xwedê du kur danê nav wan danî; Derwêş û Sehdûn.

****

I

Evdî, bavê Derwêş û Sehdûn axatiya eşîra Şerqiyan û Dina dikir. Rojekê Evdî bi eşîra Gêsan re, bi Everê Gêsî re dikev şer û cengê û Ever bîrndar dike û wisa birîndar dişîne nav eşîra Gêsan. Piştî Evdî ji şer û cengê vedgerê deng li eşîrê dike ku kona dayin û bar bikin cihekî din.
Evdî gotibû;
«Gelî Şerqîyan û Dinan; em bi tenê , bi çil-pêncî egîdan ve nikarin şer bi hezar û hefsed malên Gêsan re bikin. Baş ewe ku em barkin, li ciwarî dost û biran dayînin.Ya duwemîn cihekî baştir, bo koçeriyê peyde bikin. Di wê demê Everê Gêsî ber bi konê Evdî de diçe;

Everê Gêsî gazî Evdî dike dibêje:

Axa dilê min liyane
Nebe sebebê serê xortan, keçik û bûkane
Siwarê ser lotê bavê Etmane
Jêre dakeve,marek û nejda, tirada mêrane
Em binêrin kî ji me berxe kî berane

Evdî go;

Heger te serê min danî diyarê rehmetê,
axa kendal û gurane
Tê terş û talanê Êzidxanê bibî, tevî jin û zeriyane
Têkî nav eşîra xwe Gêsane

Nemînim berka siwarê ser lotê bavê Etmane
Sekinî li himberî Evdê Mulihim zinarê mêrane
Bavê Derwêş û Sehdûn,axayê Şerqiyan û
Dinan e

Siwarê ser lotê rabûbû ser darê zengane
Gazî Evdî kirbû,go tu dorê bide mine
Em rabin hev bi şûran û rimane
Li vî erdê beriyê bê pîvane
Li beriya fereh, beriya welatê kurdane

Evdê Mulhim sekinîbû li himberî Egîdê Gêsane
Go:Ji berê û paşê de mêrê Êzîdxanê derba
bibêbextî navêjin dijminane
Her dijimin êrîş berdidin ser wane
Her tim hûn ji me dibin berê cotane
We em hêsîr kirine di warê bav-kalane

Evdî siwardibû ser pişta qemerê, diya Hedbane
Di dest de,rimek ji şazdeh movikane
Gazî Ever kir go;

Ez im Evdê Mulhim im, zinarê Mêrame
Îro ji we Gêsan bibim heyf û tola bavane
Tu îro Ji dest min nakî xelas e
Heger xwe bidî taqê ezmanê heftane
Evdî gazî birbû,Tawisî-Melek ê xwe û Yezdane
Xarek(êrîş) da ser Ever, carek û dudwane
Rim avêtibû Ever ew evêta erdê,şûr danî ser xelek gewriyê
Ever xwe avêtibû ber çoka Evdî, da lav-lav û sondane

Gotibû;
Min nekuje,ez careke din dest ranekim
li himberî mêrekî kurdane
ez ketim bextê te û yezdane
min nekuje,hîn rehla zewaca
Etman li pişt kozan û perdane
heger Etman gihîşte daxwaz û miradane
ji ter bişînim bin konê mezin, diyarî û qurbane

Lo Evaro , min sond xaweriya bi yezdane
Tu bê xwin rijandin nazîvirî li mal û xwediyane

Li bîre min tê xwişîne rimê
Te avêtibû min, canê min kirbû birîne,
birîneke xedar wekî birînên heftê û du ferman e
wekî birîna gûla mawzerê,devê tivingane
bi saxî !..vegere te tune li nav eşîra Gêsane

heger ez te nekujim, tuyê bêjî Evdê Mulhim,
ceger nekir bi min re bikeve şer û cangane

bavê Etman dîsa xwe avête çokan û lingane
jê dikir rica û minetane
Evdî go;
Bawer bike ezê xwîne te birjînim
bila xwîne te dakeve ser erdê beriyê
Ji Gêsan hilînim heyfa bav-kalane
Ji Gêsan hilînim heyfa ciwanên Kurdane
Bila nîşanên te diyar bibin
Nav heştê hezar malên Turkan û Gêsane

Egîdê Gêsan Go;

Axa bide xatirê navê Tawisî-Melek,baweriya Êzîdiyane
Tu min nekuje vê carê jî
Bila ez bibim dayîndarê mala Pêpahn e

Evdê Mulhim derbek lêdide li kêleke egîdê Gêsane Go;

Bila xwîne te birjihe ser erdê kurdane
Ta ku Gêsan bizanin xwîne kurda ne erzane
Bavê Etman; ez te nakujim.....
Te bidim xatirê Tawisî-Melek sund Êzîdiyane
lê ezê birînekê li canê te bikim,te tu ji bîr- nekî

mêraniya me kurdan e
te birîndar kim, wekî kerê garanê rêkim
nav eşîra Turk û Gêsane

Evdê Mulhim Ever tertîba kerê li ciya filtî
şandibû nav eşîra Gêsane
***

Li ser axa beriyê ya rengxwedî cîh-cîh çîm şîn bûne. Ew ne mîna şînayiyên dine.

Evdî û egîdên Şerqiyan û Dina zîvirîbûn ji şer û cenga Turkan û Gêsan, di bin konê Evdî de, li hev kombûbûn, girgerkerên Êzîdxanê, dikirin şêwir û tedibîre, bi hevre gihabûn biriyarekê ku ew bi tene xwe nikarin heştê û pênchezar malê Turkan û Gêsan, ya baş ewe ku em ji vir barkin, xwe ji Gêsan dûr bikin.
Ewan dizanî ku piştî birîndariya Everê Gêsî û tiştê anîne serê wî, Gêsa ji Şerqiyan û Dinan re nahêlin. Lewma jî Evdî deng li xortên eşîrê kirbû ku kona li ser pişta heywanan bişdînin û şivan jî terş bidine pêş xwe û berê xwe bidine erdê beriyê.

Di beriya dûr û fereh re bi karwanê Evdî, bi rê ketibû, heye şev hatibû maqamî nîvê şevê, bala xwe danê ku çem û çîman buhareke xweş û delal, êdî Evdî biriyar dabû kû li wî cihî war bikin.

Li beriya Wêranşar li himberî eşîreke mezin konê xwe danîbûn.
Li tu beriyan, li tu şînaniyan,şînayiyeke wisa nehatiye dîtin. Şînekî tarî nerm û qedîfeyî.

Hersal dema berf û baran li wê beriyê tê rawestan, buhar destpêdike, û li beriya Wêranşarê nubûnek mezin bejin dide, li beriyê bi kulîlkên kin û qalînd yên ku ji bin berf û baranê derdikevin, dixemilin. Rengê kulîlkan heya tu bixwazî birqonekin. Biçûktirîn kulîlk jî, li wê beriyê di rengê de, wek ronahiya rengan ji dûrve şîn sor, zer û mor dibiriqînin. Bîhneke giran difûrînin.

Hersal gava li beriya Wêranşarê, buhar tê bi kulîlkan, bi axe qehwerengî, bi bêhn û rengê xweş ve, Evdî kulavê xwe li pêş kona radixist, bi tîrêjên rojê re heye roj diçû ave dem dike.

Evdî dang lêkirbû siwarê Şerqiyan û Dinane
Pişta xwe dane konê Gêsane
berê xwe dabûn konê Evdî, kiribûn govend û dîlane
Go;
Axa ev çend rojin em bi Gêsan re ketine şer û cengane
te birîn kiriye egîdê Erebane
were em kona dayînin ser pişta heywanane

em bar bikin ji van warane
em xwe bighînin dost û birane
cîwar bikin êlên kurdane

Evdî go;
Gelî xort û egîdn Şerqiyane
siwarbin ser pişta hespane

Pişta xwe dabûn konê Gêsane
berê xwe dabûn erdê beriyê bê pîvane
şev hatibû nîvê şevane
bala xwe danê çem û çîmane
dabû kaba hespane
Evdî go;
Kone vedin li ser vî çem û çîmane
qîz û zerîyên me westiyane
di bin konê min de
gur bikin agirê darane
bila bihîna qehwa sibê lêxê
li pozê beriyê heta çiyane
gazîkirbû li şivanane
terş berdin erdê çêrê heye bi çiyane
ev war wekî başe ji koçeriya heywanane
***

Sibê zu xulam û xizmetkarên Zor Temir Paşayê Milî(Zengo-Zêrîn) xeber gihandidûn paşa û gotibûn:

«Paşayê min; Çend kona, li himberî konên Mila konê xwe vedane».

Paşa merovekî pir dirêj, porê wî reşsipî, pozê wî wek dimikê qertelê nikilxwar, çavên wî reş, ji her rewş û helwest û axaftina wî, ji hejandina destên wî, bi xwe bawerbûnek diyar dibe. Pirr dipeyivê û diramiyê, bi gavên xwe ên dirêj wek kabûsekî dimeşe, di nav kurkên samûr de her xwêdan dide.

Paşa bi hêrs ji xulam û xiymatkaran re gotibû:

«Ez dê wan talan bikim. Heger bazdin,xwe bidine ezmanê heftan jî, ez dê wan ji herêmê derxînim!....Çihû bin!.. Îran!... Hîndistan!.. Çîn û Maçin jîbin, ezê wan talan bikim. Bi lez û bez paşa qasidek şandibû bin konê Şerqiyan, ji wan daxwaz kiribû ku ew konê xwe rakin li pişt êla Mila dayînin, ne li himberî wan dayînin. Evdî ji vê axaftinê pir bênteng bûbû û bersiva paşê Mila bi xulam re rekirbû û gotibû:

«Kuro!...Here bêje paşayê xwe, bê êla Şerqiyan

xwe hêsîr navêja pişt konên tu kesî. Heger Paşayê te vê axaftina min qebul nake bila ji min re siba dakeve meydane şer û cengê. Ez Evdê Mulhim im, ji mala Pêpahn im»

Dema xulam zîvirîbû û navê Evdî,yê Mulhim li ser zimane xulam re hatibû gotin, paşa ji cihê pelqizîbû û çend caran di bin kon de çûbû û hatibû û nişkêve gotibû:

«Kur her bêje Evdî axa; Em dostin, em jî weke we kurdin îşev xwarina te li ba paşayê Milaya.»

Evdî tevî egîd û girkerkên Şerqiyan û Dina li bin konê paşê Mila de bûbûn misafir û mêvan.
Paşa ji Evdî re ser jêrkirbû berx û beran. Herdu eşîran bi hevre kirbûn biratî, soz û peyman bi hevre danîbûn, ku heye dinya hebe bêbextîyê bihevre nekin.

Merovên beg û paşa ji bo berjewendiya xwe pêlewanin. Ewî nav û denê Evdî Mulhim bihîstibû. Mêraniya wî ji paşa re pir lazim dibe. Paşa li ezmana li yekî weke Evdî digeriya, îcar ew bi lingê xwe hatibû ba paşê Milan.

Derbas dibûn çend rojane
xeber gihîşte bin konê Paşayê Milane
Go;
çend kone li himberî konên me hatine vedane
em nizanin eşîrin yan pêjing kotanin !?
nizanin ne eşîr kuştine û bazdane

Zor Temir paşayê Milane
deng kirbû li xulam,şandibû bin konê Şerqiyane
xulam sekinîbû li yamanca Evdê Mulhim zinarê mêrame
barê xwe barê lokane
rojên şer û cengan qedir nade tu kesane
taxiva bi devê şûr û rimane

Xulam li himberî Evdî sekinî, ziman lê negeriyane
ziman di şikefta dev de bû wekî kevirekî girane
Evdî xulam derxist ji bin kon, pirskir çi ciriyane?
Xulam axaftine paşa gihandibû axayê Şerqiyan e
Go;axa paşayê Mila dibêje;
kona rakin ji himberî konê Milan e
Konê xwe dayînin li pişt konê Milan e
Evdî go;
Xulam ji paşayê xwere bêje, ve'n çend şorane
ez Evdî ê Mulhim im bavê Derwêş û Sehdûn
zinarê mêrame

siwarê qemerê diya Hedbane
min serê xwe tucaran dananiya li himberî neyarane
ne li himberî hezar û hefsed siwarê Turkan û Gêsane
ji warê bav û bapîran heye vire ketine şer û cengane
me Êzîdxane rengîn hiştiye di nav dijmin û neyarane
ku em bijîn serbilind wekî mêrxasane
hêje paşayê Mila, em xwe hêsîr navêjin pişt konên Milan e
heger razî nabe bi van axaftin û şorane
bila siba ji min re dekeve cenga mêrane
em bihev re baxivin bi devê şûr û rimane
tucar nabe û nebuye,
mêrê Şerqî xwe hêsîr avêtiye pişt konane

xulam pişta xwe dabû, konê Evdî û Şerqiyane
berê xwe danû konê Milane

Paşayê min;
Ew kon konê Şerqiyan û Dinan e
axayê wan jêre dibêjin Evdî, yê Mulihim zinarê mêrane
ji welatê Şingalê heye li ba Milane
bi Turakn û Gêsan re ketine şer û cengane
sûnd xwarin bi soza mêrane

sûnd xwarine bi sûnda Êzîdiyane
xwe hêsîr navêjin pişt ti konane
dîsa li Êzîdxanê rabuye fermane
çav sor bûne ji şer û cengane
taxivin bi devê şûr û rimane

Silav bi min re rêkirine ji bo paşayê Milane
ev çend roj û şevên
çavê wan rehetî û xew nedîtine
go;
Bêje paşayê Milane
em xwe hêsîr navêjin pişt konê Milane
heger paşa qebûl nake van axaftinane
bila siba ji min re dakeve hola mêrane
bila paşa bizane
me rihê xwe daniya ser kefa destane

"Ji berê û pêşda" dibêjin; mêrkê beg ji bo xwe zana û zîrekin, egîdan ji xwe re dikin pal û pişt, xwe di pişt egîdan de star dikin. Zor Temir Paşê Mila jî deng kirbû li girkirekên Milan, fikra xwe bi şêwirdarên Milan re anîbû ziman.

Girgirên Mila li bin konê paşê de kom bûbûn û civiyane
Paşa go;
gelî Mila;...Egîd û siwarên Êzîdxanêne

yek ji wan berberî sed mêrane
Evdî Mulhim axayê wane
mêriko mêrkuje, rojên şer û cengane
ti qîmet nade egîd û pêlewane
tucaran nareva ji ber dijmin û neyarane
ez dizanin Evdî bi çil malê Şerqiyan ve
natirse ji sî û pênc hezar malê me Milane
ya baş ewe;
xeberê bişînin bin konê Şerqiyane
bila Evdî axa û Emer ê Şerqî li bin konê min bibin mêvane.
bi wan re dayînin soz û biratiya me kurdane
ji wan re serjêkim berx û berane
wê gelek caran dijiminan vegerînin ji ser Milane

Xeber şandibûn bin konê Şerqiyane
go em nedijiminin,em tev kurd in wek birane
Paşa îşev we vedixwende bin konê Milane
Mêvanên ezîz û qîmet girane

Evdî tevî egîd û koma Şerqiyane
li bin konê Mila bûne misafir û Mêvane
ji wan re serjêkirin berx û berane
ji Şerqiyan re kirin şîv û qurbane

Paşa go;
Ez dixwazim ji mêvanê xwe re bikim çend şorane
me dilheye bi Şerqiyan re bikin biratî û bidin

sozane
em tev kurdin weke birane.

Paşê Mila ji mêvanên xwe re ketibû axaftin û şorane

Got:
Mij bikêrî guran tê!?. Şevê zivistanên beriya Wêranşarê sar û dirêjin. Wisa jî ku ev yek ji gelek çîrokan re bûye babet. Serma, mij û tarî gur û berçemokan xwedî dike. Tirs û xofa wan jî çîrokan dixemilîne, zarokên çav reş û çav xeyal, bi jana dirêj destqelişî û çok pînekirî terbiye dike.
Lê rojên germ û ronî bi kêrî gurên berçemokan nayê. Ronahî berçemokan nexweş dixîne, lewra ewan di tariyê de nêçîra xwe dikirin, zikên xwe di tariyê de têr dikin. Em çi bikin!?... Xwezayî ew jî wisa çêkirine! Xisyetên wan jî weke yên merovan taybetî tunin. Lê tiştek din heye, xwezayî xerîbe, ew tim û tim diguhere. Ne tenê bixwe diguhere, ev bi teva hemî berhemên xwe ve diguhere. Ew guhertin pirî caran berbipêş de ye.
Merovayî ber bi rindî û bedewiyê diguhere, lê ne tenê bi bendora xwezayê ji derek şûn de bi ronahiya hişê xwe, keda dest û xwêdana eniya xwe.
Merovên hov jî hene li rûyê dinê ew bêtir nêzîkî berçemok û guran in.

Berçemok û gur di tariya xwe de nêçîra xwe dikin, ji bona hêtek goşt xwe tavêjine mirinê û zikê xwe têr dikin. Lê merovên delal ji bona tîrêjek ronahî di rojiyên mirinê de bedena xwe dihelîn in, donê xwe dikin rûnê mûma merovantiyê.

Rojiya mirinê ....berxwedan..
Ya ku merovan ji guran û berçemokan dûr dixîne berxwedan e.
Berxwedan birîna li çavên merovan bi şînahiya ezmanan dikewîne, birînên dilê merovan ber bi rojê, ber bi ronahiyê dimeşîne. Lewma jî Turk û Gêsan ji Şerqiyan jî ditirsin, her ew ji bo soz û biratiya me û we bitirsin.

Di dû tariya salan re merovên jîr û jêhatî çavên xwe kutane ronahiya ezmanê şîn ronahiyê berhev dikin, birînên xwe bi ronahiya rojê dikewînin...

Awan ji bona parastina çavkaniya jiyana xwe, ji bona tariyê ketine nava helwstek mezin. Dîsa weke her caran, ji bona fermaneke din dek û dolabên xwe saz kirine, dixwazin avê şelu bikin, mijê daxînin rûyê erdê û tarîtiyê xurtir bikin.

Wek ku min bihîstiye di navbera Şerqiyan û Turk,Gêsan de dîsa xwîn hatiye rijandin, şev û roj

tevlîhev bûn, kilamên dayîkan nîvcû man. Rojiya mirinê hêjî berdewame. Goştê bedena ciwanên me bûye qendîla merovahiya li vî welatî.

Gelî mêr û fêrsên Milan bila hûn tev bizanin ku min ji îşev de soz û peymana beratiyê da êle Şerqiyan, çi zor li wan bê, pêşin ew zor li ser min û êle Mila ye, mêrê wan werin kuştin, heyf û tola wan ji Mila tê xwestin. Bila hûn tev ji bo yezdan li ser vê axaftine min şahde bin.

Evdî bersiva paşa da û got:
-Tu camêr kurê camêrayî. Bi izna yezdanê pak û dilvan, Mila ji biratiya me zirarê nabînin, belê her hûnê xêrê dibiratiya me de bibînin. Dema mêrê Êzîdxanê soz û peymana xwe dide, heger koka wî bête qelandin, ew tucaran soza xwe xerab nake. Lewma jî em jî soz û peymanê didin paşayê Milan û em bi biratiya we kêfxweş in.

Birano, divê êdî piçek xîret li serê pozê me jî bixe û em jî wek zilaman, wek mêr û camêran li hevdu xwedî derkevin. Ya ku tê kirin, yan ku tê gotin; divê êdî piçekî pozê me bişewtîne û em jî bi lerz û bez li rastiya xwe xwedî derkevin, li hêmana xwe ya durist bizîvirin.
Ez bi xwe ji vê yekê têr bûma. Hedan û lebata min nayê.Xîreta min bar nabe, dilê min vê yeka han

ranagire, rika min bi berz, bi ber bejna min dikeve.Heçî hêrsa mine, ji zû ve rabûye pêdarê, bi ser bejin û telê min dikeve. Li himber van êrîşan, van tinazkirinê, li himber vê pêkenînê helwesta merovaniyê, ya camêriya êl û eşîrtiya kurdan divê.

Di warê bav-kalên me de pal dane, li nav çavê me hemûyan dinihêrin û bi me tinazên xwe jî dikin.Li nav çavê me dinhêrin û çîran bi me dikin. Me biçûk dibînin, bi tu awayî hebûna me nadin ber çavê xwe, tu qîmet û hirmetê nadin me. Eger bi qasî misqalekî hurmeta wan ji hebûna me re hebûye, ev kuştina heroj nedihat kirin, ev talan û wêran kirin bi ser me de nedihat kirin.
Birano!..Tu nebêje navê koletiya nû, bira!...yê ku bêxîretiyê deyne, yê ku birayê xwe bikuje, yê ku dev ji ol û tola xwe berde,yê ku li hebûne xwe xwedî dernekeve, yê ku çarrika jinan bide serê xwe, xwe di bin ala bêxîretî û necomerdiyê de veşêre tu caran ji mere nabin qam û çira.

Birano,xîret bikin!...Ujdan bikin!...
Yên ku heftê du caran ji bo namûsa dayika xwe hatine daxdan em in!...Ma kesî ji me ji wan re gotiye dev ji baweriya xwe berdin!?.. Îcar çima emê dev ji baweriyên bav-kalên xwe berdin û werin bi baweriya wan bigirn , bi zimanê wan bipeyivin ?... Heta niha bi darê zorê bi zilmê

baweriya xwe sipartin xelkên me. Ew dibêjin qeyî wê her û her weha derbas bibe, xîret li pozê miletê me nexe!?....
Baweriya wan çiqasî ji bo wan bîrozbe, ya me jî hewqasî bi me pîroze, belkî zêdetir jî.

Birano yê ku ji bo bavê min hurmet negire, ez tucar û tucar û tucar ji bo wî û bavê wî hurmet nagirim, belê wan bi kuçikê ber derîyê malê hisab nakim.Çimkî baweriya me, zimanê me, ola me, namûs û şerefa me ye, hîmê binghîn yê hebûne me ye. Ew hebe em hene, ew tunbe em jî tunin.

Bila kesek doza bênamûsiyê li me neke! Kesê dev ji baweriya xwe berde, siba dikare namûsa xwe jî di meyxanan de bifiroşe.

Paşa û Evdî hev himbêz birbûn bi germiye
soz û peyman dabûn bi biratiye
kirbûn suhbet, kêf û laqirdiye

xeber gihabû Rahma çav belek, xwîşka paşayê Milan e
li pişt kozan û çîtane
Rahmê xwîşka Paşa, nazdara qîz û bûkê.. Milane

cêriyê gotibû;
xatuna min; mêvanê birayê te,egîdê Şerqiyan e
egîdekî bi nav û bi nîşane
barê wî barê lokane
gelek ji wîre didin wesfan û pesnane
navê wî Evdî axayê Şerqiyane
dema siwar dibe li ser pişta qemerê diya Hedbane
dest tavêje şûr û rimane
kesek nikare bisekine li himberî egîdê Şerqiyane

Şerqiyan di bin bonê Milan de
xwarin birinca Qerjdaxê
goştê berxan û beranane
destê xwe şûştin ji duhinê duvê hilkane
Evdî li ser milê xwere zîvirîbû li xwedanê misîn û avê
dît Rahma çav belek,xwediya gulî û keziyane
çavê Evdî sekinîn,dil lêxisibû bi deh carane
Rahm jî bi axa re ketibû tora aşiqane
dil jê birbû, di dil de lûsiyane
Evdî serî wergerand û ramiya
Go:
Ez çiqasî li vê beriyê geriyame
Min zerî, esmer nedîtin bi vê hisin û cemal hane
dilê egîda digvêje , dibin wekî hêsîrane
Rahmê bizane evîne te ji min re çewte û girane
ez nur perestim, evîne qîzên musilmane
Ji mere qedexaye, tucaran nabe

"Evîna malwêran nasnake gunehane
diçirîne tixub û sînorane
bawerim di aşqêde, guneh tun in !?"
ji bo xatirê Rahma Milane
bimin xweş tê dujeh û are

Ezê ji paşê Mila re bînim mal û talane
Paşa jî bidie min soza Rahma Milane

Paşa dide soz û paymane
Wê bide Evdî axayê Şerqiyane
Rahma çav belek,xudana gulî û keziyane

evdî bûbû egîdê Milan û Şerqiyane
bûbû paraskarê konê Milane
dijimanan vedigerîne ji ser wane
diçe şer û cengane
tîne kerî pez û talane
ji Paşê Milan re komdike mal û milkane
Îcar bizan in barê Evdî, barekî girane

Meydane pêşberî konê Zor Temir Paşayê Milan, yê ku bi navê Paşayê Zengo zêrîn bavê Edûlê, meydaneke fireh û dirêj, di meydanê de terş û talan, piranî bi comerdiya axayê Şerqiyan li vê meydanê hatine dîtin.

Çavê Evdîyê kal li konê Milane.Girsa merovan li hev gêr dibin, diçin û tên. Çend merov!..Her celeb, her texlît. Ev merov çi dikin...Çi difikirin...Bi çi mijûlin??...Ew çi dibin bila bibin, lê belê ma ev hemû ne wekhevin? Ma ew nizanin evîn, hiskirin çi ye? Hemû merov bi vê yekê dizanin. Gelo ew bi xwe jî nizanin ku evîn ne sînoran nasdike û ne jî li emrekî disekine!?..
Merov hosteyê hîsa in,hîs û nefs ji bo merovanine!?...Merov tev wek hevin?....Digel her celebî de dijîtî û ferqî heye, lê gerekî ew wekhev bin!.Merov divê li peyî biratî û merovahiyê be. Merov li ku dibin bila bibin, çi dikin bila bikin, çi difikirin...Çi dixwin,çi vedixwin. Lê çima ev helweşandin, jihevdu veqetandin, zulim û xenqandin!??.
Çiqasî Evdî di şerê Turkan û Gêsan de bi hêrz û dijwar dibû, hewqasî evîna wî û xwîşka paşayê Milan, Rahma çav belek jî xurt û bi hisret dibû. Evdî,yê kal ji şer û cengan, ji xezo û talanan ji bo paşê Milan, li êlê nedima. Eger bihate jî, êl li dora wî kom dibû, pirs û şêwir xelas nedibûn. Wî jî wekî xortekî evîndar di bin tariya şevê de nediçû evîdarê bibîne!? Şev ji bo wî bûbûn xewnên xweş. Şev bi tenê, ji bo xew û xewnan bûn !Ma çirûsk û pêtên jînê jê re navên? Mêrê dilpak...
Evîn û hezkirin divê di bin siya şevên dirêj de devî û dar bişikivin.

Rojek ji rojên yezdan
Evdî di ber Milan de çûbû şerê dijminane
Evdî di şer de mabû bi rojan û heftiyane
girgirekên Mila bi paş re dan şêwirane
Gotibûn:
Paşa ji mere kêmiye,evîna xwîşka te Rahm
û axayê Şerqiyan e
em hêvî dikin kêmasiyê hilînî ser Milan e
Paşa go:
ji min re bikin şêwir û tedibîrane
axayê Şerqiyan bidin kuştin bi destê Gêsan e
dîsa Evdî şandibûn cenga Turkan û Gêsan e
qediya bûn deh roj û deh şevane
Evdî vegeriyabû ji cenga hane

Paşa soza xwe xerakiribû bi axayê Şerqiyan e
Rahm dabû Ruhayê,mala Baqiriyan e

Rojekê Evdî zîvirîbû ji şerê dijminan e
yek çu pêşiyê go;
Axa Rahm dana mala Baqiriyan

Evdî sekinî li himberî paşayê Milane
Go:
Paşa dema şer û cengane
em tev kurdin, egîdin , birane !
dema tirs ji ser we hat wergêrane
ez Êzîdîkî bi du qirûş û nîvame

te soza xwîşka xwe Rahmê da min bi soza mêrane
çima te xerakir soza kurdane
ez soz didim te, ezê konê Baqiriyan bidim ber devê şûrane
Hênik bikim vî dilê xwe yê bikul û jane

Bi tîrêjên rojê re, bê ku Evdî xeberê bide kesekî, xwe avêtibû ser pişta qemerê û berê xwe dabû Ruhayê.
Evdî,yê kal nema dikare durbûne Rahma Milî hilgire! Hisret û dîtina Rahmê ew tar û mar kirbû, ji hiş û tedibîran durkirbû. wisa bi Evdî hatibû ku qîmet û hisiyeta xwe jibîr kirbû.

Deşta Wêranşarê ber bi Ruhayê bi ferehî û dirêjê wî dabû ber lingê qemerê.

Niha jî ew li deşteke fireh, bê ser û bere. Deşt di nava rengekî zer de ye. Aso û deşt bihevre bûne yek. Deşt dibiriqe û carina leyîlan dide, di deştê de girên hûr hene lê Evdî tênagihê ka ew çi gir in û ji çi hatine. Rengê giran cih bi cih diguherin. Gava ew reng diguherin, rengên nû hêdî-hêdî bi ser yê kevin re tên û lê hukim dikin. Rengên giran weke rengê keskesorê dixuyin. Erdê deştê jî diguhere. Carina ew dibe qûm, carina giya û

şînahî, carina zevî, carina erdê qelaç, Ji dûr ve li nik giran jî rawirên ecêb dixuyin. Ew wan jî nas nake. Rawir jî weke tiştên din diguherin. Ew carina dibin rawirên dirende û kerî bi kerî bi kerî digerin û carina jî ew dibin rawirên firende û ref bi ref difirin.
Di deştê de ti dar û av naxuyin. Di deştê de tiştê herî xweş dengê bilura şivana ye.Dengê bilurê,dengê muzikeke têkil ji dûr ve tê, ew niqteyên ku aso û deşt bi hev re dibin yek tê.
Evdî bi tenê li qeraxa bajarê Ruhayê digere. Ji dûr deng tên, ronahî diçirisînin. Stêrik di govendê de ne. Ew dixwaze here navenda bajêr, cihê ku razan jê bi dûre.
Evdî di kuçeyên teng û biçûk re bûrîbû, xaniyên spehî ew ji xeyalên Rahmê şiyar nekir bû. Bi dû wan re deverên, qesrên mezin û spehî, tê de merovên ziktêr û halxweş in. Gujîna avê, hîrîna hespan, pirqîna keç û jinan, kalîna berxan, qeb-qeba kewan, çîvçîva bilbilan, teptepa dilan û nalîna bedenan.

Evdî berê xwe dabû malên Baqeriyan, li himberî pencerekî rawestiyabû du-sê dengan gazî Rahmê kirbû:

Sibê ronbû, roniya Şêşimis dabû erd û zeviyan e
Evdî berê xwe dabû Ruhayê bajarekî bi nîşan e

neviyê Pêpahn gihabû Ruhayê cihê kurdan e
ji Rahma çav belek re kirîbû şareke jinan e
kul û kederên xwe di nava şahrê de pêçan e
berê xwe dabû malên Baqeriyan e
sê dengan;gazî kirbû Rahma Milan e

Got:
Rahmê serê xwe derxe ji pişt perdan e
berî mirina xerab, careke din te bibînim bi çavan e
eger xwe dernexî ji şibek û penceran e
ezê serê qemerê berdim malên Baqeriyan e
Malê Baqeriyan bidim ber devê riman û şûran e

Rahimê heye navê, xwe di pencerê de derixistibû ji pişt perdan e
Evdî go;Rahmê dilê min liyan e
di dilê min de gur buye agirî daran e
ber çavê min de radibe mij û dûman e
nayê bîra min ne bav, ne bire !
ne jî her çil malê me Şerqiyan e
tê serê min ku êrîşekê bidim ser wan e
Baqiriyan wêran bikim !
cihê malên wan biçînim ceh, nîsik û nokan e

Rahmê Got:

Evdî berê xwe bide mal û xudanan e
ez ji tere nabim jin û kuflet,an e
navbera mede heye cudabûna olan e
tirsa min heye ji Baqeriyan e
gazî û hawarê bidin muslman e
te bikujin li van derane
ez nehêjame bibim jina axayê Şerqiyan e
Evdî vegerabû li xwedî û xwediyan e

Xeber, salox giha bû malê Baqeriyan ku du sibê de axayê Êzîdxanê Evdê Mulhim li himberî pencerê bi Rahma Milan re ketibû deriya evînê. Axayê Şerqiyan tu qîmet neda bû namûsa we malên Baqeriyan. Hûn dizanin ku Evîna bûka we Baqeriyan û mêrikê Êzîdî ji me tevan re kêmasîyeke mezin e. Pêwîste hûn vê şermezariyê ji ser xwe rakin.

"Barê namûsê barekî girane. Evîn, aşq di nava kurdan deqedaxeye!?...Pêwîste ku tu dengê evînê bi ser qîzê de neyê heya ku qîz bizewicê. Eger zewicî û siteke evîna merovekî din ji bilî mêrê wê derket, kuştin talankirin, belê qirkirin tê holê. Bi salan ev kuştina han naye westandin."

Malên Baqeriyan, pismam, dost û eşîr li hev

civandibûn, tev ji bo xatirê tedibîrekê dayînin ku vê kêmasiyê ji ser xwe rakin. Girgirekên Baqiriyan di şêwir û tedibîra xwe de gihabûn wê biriyarê ku Rahma Milan bikujin!! Lewma jî çarnosa Rahma Milan dabûn dest jinên Baqeriyan. Ew pilan danîbûn ku Rahmê bi jehrê bikujin ta ku xeber belav nebe. Bi vê tedibîrê Rahm hate kuştin û li zehmanê Ruhayê hate bi çal kirin.

Baqeriyan danîbûn tedbîr û şêwiran e
jehir kirbûn nav xwarina Rahma Milan e
Rahm bi çal kirbûn di nav miriyên Baqeriyan e
Gotin;
Barê namûsê barekî giran e
bi taybetî li ba me kurdan e

Evdî wekî başûkê baz şikestî û birîndar li ser evîna xwe û Rahma Milan dikir nalîn. Di dil de dikele kul û derdê Rahma çav beleke, xwîşke Zor Temir Paşayê Milan. Evdî,yê kal kêm axaftin bûbû, çarnos û şêwirên Şerqiyan ji bîr kirbû. Belê şer û cenga dijminanan, ya Turk û Gêsan ji bîr kirbû. Miheke xitim Evdî ji bin kon dernektibû.

Rojekê ji rojên xwedê, bi berbangê re deng li kurê xwe Derwêş kirbû û tevî wî berê xwe dabû bajarê Ruhayê.

Derdê aşiqê derdekî giran e
êşe jan e, tahil û zilindar e
lê gelek caran jî, xweş û jiyan e
derdê wê derdekî ne hêsan e
li ber nikare raweste
ne dilê ciwan e, û ne jî kalan e

Evdî sî rojî derneketibû ji bi konan e
dil bi kul, êş û keseran e
rojekê ji rojên xwedan e
deng kirbû li kurê xwe
Derwêş siwarê Hedban e
Got:
Kurê min were em herin Ruhayê bi nîşan e
Çavê Rahmê belek naçin ji bîra bavê te,axayê Şerqiyan e
min şeva burî dîtî xewnek şevan e
dil min ditirsa ji wê xewna han e
Evdî û kur siwar bûn li ser pişta hespan e
berê xwe dabûn malên Baqeriyan e
şivanek dîtibûn li tupraxa malan e
ji şivan pirsîbûn hal hawealê Baqeriyan e

Şivan got:
Malên Ruhayê tev taxivin bi mesele wan e
wan kuştiye bûka xwe, Rahma Milan e
biçal kirine li wî zehmanê han e

Evdî berê xwe dabû zehman e
Sekinîbû li ser tirba Rahma Milan e
Tirb kulabû Rahim derxistbû ji zehmane
Derwêş lawo were li Rahmê bike temaşan e
binêra li dîndare kezî û guliyan e
maqamê bilind, çavê reş û belek weke tariya şevan e
bûye hêlîne kêzik û kurmik, mişk û maran e
bala xwe bide bişere şêrîn bûye reng miriyan e
Çavê reş û belek,reng dan e
bejin û bal bi ser xeraqan de xeliyan e
tu were binêre nav û navkela kilîta, guhê bazine
rengê şêrîn, xilxala û zendê bazin e
bi dilê min dixe agirî daran e
dûmane vî agirî xwedaye taqê ezmanê heftan e

Derwêş got:
Bavo belaxwe veke ji miriyên goran e
stêre ku dirje ji ezman e
careke din şewqê nade erdan e
miriyên goran careke din venagerin li xudiyan e
Rahma te dîsa ranabe ser herdu lingan e
te di dilê lawê xwe de, gur kir agirî daran e
neçêtire ji diya min,Eyîşa Welêt xwediya şeş perî giran e
diya piling û şêran,egîdên Şerqiyan e
ji navê tere serma gisureke giran e
tu xwe berdi tirba tari,seba jineke Milan e

Derwêş lawo,bavê te kal e
ji sî û sê damaran,damarekê lêdan e
tê serê min êrîşekê bidim ser malên Baqeriyan e
serjêkim egîd,mêran, biqelînim tovê nêrane
erz û eyalê wan hêsîr bikim,bibim nav Milane
cegerê min hênik nabe
ne bikujtinê,ne bi talan e
Heyfa xelkê çeleng, maqamê milukî,
xwedanê tuqan û beniyan e

Evdî tevî kurê xwe Derwêş zîvirîbû ji welatê Ruhayê,lê hisret û kesera Rahma Milan bi xwe re anîbû. Heft roj û heft şevan Evdî,yê kal,bê zar û ziman di bin kon de ma bû. Kar û barê êlê ji bîr kirbû, hinav û dil wekî qazane li ser kiçikê arî diqij-qijî, dikeliye, hiş û sewdan winda kirbû. Melûl û jar bûbû. Girgirekên Şerqiya û Dinan li ber serê axayê kal bi şev û rojan ranedibûn, derman ji kul û derdên kalo re peyîda nekiribûn. Ew êş û derdê ku bi axa ketibû ew bi xwe jî mendehoş kirbûn. Ewan bi derdê kalo nizanîbûn. Roja heştan Eyşê diya Derwêş û Sehdûn li ber çoka Evdî rûnştibû û ji wî re ketibû peyv û şoran:
-Evdî ma nayê bîr te, dema ku tu dihatî welatê me nêçîra karên xezalan? Kutikekî berazan ji ber te rabûbû û tu bi hespa xwe qemerê li du wî kutikî

ketibûyî,min bi şonikê cil şûştinê û bi yek derbê ew kutik evêtibû erdê, paşê tu li mal bavê min bûbûyî mêvan û te ez xwestim. Ma şeva bûkaniya min ji bîr te çûye?!...Dema tu ji civata mêran hatî ser miraza xwe!..Te dît ku gernasek ji bilî bûkê di bin konê te de rûnştiye!...Te ji dîtine min girtibû tirs û heybet!.Ji tirse de, te kirbû ku vegerî heya ku min gazî te kirbû.....Em herdu bi hevre ketibûn cenga şêran....Du seatan bi şûran me kirbû şer û ceng...Apê te Emerê Şerqî bi hawar te ve hatibû....Te go ; apo herin ev şerê bûk û zavane...Şerê me bi golaşan domkirbû....Te nikarîbû pişta min dayînî erdê....Min tu fêrkirî şer û cengan kirî....Tu fedî nakî ku te êla Êzîdxanê ji bîr kiriye....Te Eyşa Welêt diya du şêran ji bîr kiriye tu ketiye du qîza Milan!!.....Ji navê tere şerm û heyfa!!.. Ev deh roj û deh şev in ku te zad nethmandiye....!!

Evdî û law zîvirîbûn li xwedî û xwedane
Evdî kal,melûl û jar bûbû di bin kon de
Eyşa Welêt sekinîbû li himberî Evdî kal e
ji wî re kirbû çend axaftin û şorane

Got:

Evdo ma nayê bîra te,dema hatî nêçîra xezalane
ji ber te rabûbû,kutikekî berazane
min dest avêtibû şonikê cilane
bi yek derbê beraz evêtibû erdane

ji wê rojê de,tu li mala me bûbûyî misafir û mêvane
ez guhstim; dabû min soza mêrane
Heya ez saxbim, ser min re nebînî jinane
ma te ji bîr kiriye !?
Şeva miraza tu hatî ji civata mêrane
te ez dîtim, bi şûr, rim û çekên egîdane
te ji min pirsî:
tu jinî yan mêrî,tu ensî yan mêrê cinane
te ji dîtina min girtibû tirs û heyîbetane
te li ber xwe dabû ku bireviyane
min gazî te kirbû û tu birî bin perdane
ez bi tere ketibûm şer û cenga mêrane
apê te Emer hatibû bi hawara te ve
te got: Apo herin mala xwe
ev şer,şerê bûk û zavane
şûr di destê meda neman e
em hatin hev bi golaşane
te nikarîbû min bavête erdane
min tu fêr kirî şer û cenga mêrane
hîn tu di ser min re digirî Rahma Milane !?
tu ji dilê xwe bavêje kulan û qehrane
binêre li herdu lawên xwe
Çawa bûne wekî du şêrane
Şerma bo egîdê Şerqiyane
Evdî Mulhim zinarê mêrane
wekî jinan xwe hêsîr kiriye di bin konan de
ser jineke Milan ji bîr kiriye ola Êzîdxanê

ma tu nizanî ji mere nabe evîna muslimane ?
ji rû û porê xweyî sipî şermbike
bo te kêrnayê ev evîna hane

Evdî,yê kal serê xwe berdabû ber xwe û darikekî li ber xwe dikula, ewî nikarî serê li himberî Eyşa Welêt diya Derwêş û Sehdûn bilind bikire. Lê hinav û dil wekî qazana li ser kuçikê agir dikeliya. Bêhin li Evdî,yê kal teng bûbû. Çav lê sor bûbûn. Kalo bersiva Eyşa Welê weha dabû:

Eyşê tu were li dilê kalo bike tamşan e
kula leglegê û çar seriyan e
damar û nîşana xwe pêra berdan e
li tupraxa Şerqiyan û Dinan e
Ji bîr min naça dîndara guliyên mur,
nav û navkêla qendîlî, nava kilît û kemberane
nava xilxala zindê bazinan e
agir bikeva mala qasidê mirin ê-
meliyaketê-Mewtê qasidê rihan e
feleka mal wêran,diniya rûnî û şêrîn
ji xwedane kezî û guliyan e re nadumîne û
nakemlîn e
Eyşê tu vê sibê here tewlê hespane
ji min re veke kilîta Qemerê diya Hedbane
seba gotinên te, ezê xwe qut bikim ji xwediyane
herim ciwarî çend malê Şingalê nav Êzîdiyane

Eyşê tu binêre li beriya Wêranşara xopane
ji Şerqiyan ji Milan, ji Turkan û Gêsane
tu ji tewlê derxe qemerê diya Hedabane
bişdîne zîna hespê, bikim linga li zendane
Xwe berdim vê diniya şêrîn, welat û şaristane
belkî ji vî dilê bikul re-bibînim çare û derman e

Êdî Evdî,yê Mulhim kal bûbû, qewet ji bo şer û cengan nemabû. Lê lawên wî Derwêş û Sehdûn mezin bûbûn gihabûn ku li hespan siwar bin. Derwêş di dest pêka xwe de , duzdeh-sêzdeh saliya xwe de, navekî mêranê hilgirtibû.Girkirên êle Şerqiyan û Dinanan digotin ku ew wê ji Pêpahn bi xwe jî celeng tir û mêrtirbe!.

Emê li vir bihêlin vî nivşî
Kul û derdên Evdî
Berê xwe bidin nivişê duwmîn
****

II

Dem zû derbas dibûn, dem û dewran dihatin û bûhrîn, jan û êşên kevin bi yên nû re dihatin kewandin, birînên kevin û nû li hev diketin.....
Sitran û miqamên kevin hêdî-hêdî têne ji bîrkirin. Miqamên nû gelek caran nakevin dilê merovan û dilê bi kul û jan hênik nakin. Her weha gotinên nû di ziman de gelek caran hevdû nagirin, li hiş û dilê merovan nayên,dengek,rêzek,nivîsek,helbestek, romanek, destek çavek û zimaneke. Ewan tuxmê xwe raşandiye nav axa hêwa û nerim.
Ew li benda rihma xwedê dimînin, yan jî kefa destê xwe, xwîdane eniya xwe, germiya xwîna xwe, ronahiya aqil û hişê xwe, yan bêhin û bala wan wê ji wan re bibe hêvî.....??

Êdî roj zû diçe ava, çira zû pêdikevin, derî zû têne dadanê... Lê ku dil li ser agir bikele....?!
Zivistanê! Êvar zû tê, çira zû pêdikeve, ji ber ku tarî jî zû erdê di bin reşiya xwe de dihêle. Ji bo bihntengan girtina pencer û deriyan mirine. Navbera çar dîwaran mezele... Çi kesên ku ji bo têrkirin û tijîkirina serê xwe, hiş û aqilên xwe, çiqas dem daye, çiqasî bixemil û bikemile, ewqasî serbilindî jî diqebile û dikemile. Ew ewrên ku ji

ava kaniya û çeman, gol û deriyan têr venexwin, ew nikarin bostek axa tovreşandî bi rihmeta xwe ve şil bikin, axê hişiyar û têr bikin....
Pêwîste ku merov hêvîya xwe ji zivistanê jî nebire. Ew jî demek ji demên saliyê ye. Her demek ji demên salê xweşî û nexweşiya xwe heye. Ew civatên ku haya wan ji bayê felekê tune, bê per û baskin. Di nava deriya bêser di keştiyek qels de tunin. Bayê felekê ji xwere weka çek û qewet bikar tînin. xilaskirina ji bin nîrê zordariya Turk û Gêsan keştiyê û barê wî bi xebat û celengiya egîdan eleqedar dibe.
Roj zû diçe ava. Merov zû dikişine bin konan û malan, wekî çawa çûk û çivîk dikevin hêlîn û lûsan. Her mexulqatek ji xwere sitarekê dibîne. Lê gelo Evdî,yê Mulhim sitarek ji bo êle Şerqiyan û Dina peyde kiribû....?!

Sal li du hev hatin û derbas bûbûn, wekî çawa meh û demsal sal jî derbas dibin. Gelek demsal Evdî dîtin, wekî çawa gelek şer û ceng, kuştin û ferman derbas kirin. Du zaro jî mezin kir bûn. Hêdî-hêdî lawê wî Derwêş jî cihê xwe di nav egîd mêran de çêdikir, nav û dengê Derwêş jî roj bi roj li herêmê û dinava Milan, Turk û Gêsan de bi egîdî derdiket.
Rojekê Derwêş li himberî Evdî sekinî û doza hespekî lê kirbû. Evdî jî êdî tu çare ji dest kur

nedîî bû. Ewî êdî dizanî ku kur mezin bûye, egîdî û mêranî li wî diyar dibe, lewma jî Evdî biriyara xwe dabû ku li seran-serî welatê Kurdan bigere heta ku hespekî layîqî egîdê Şerqiyan peyde bike.

Sibê roniya xwe hîn nedabû beriya Wêranşar ê, belê bi berbangê re Evdî li qemerê siwar bûbû qeste welat û çiyan kir bû, bi mebeste peydekirine hespekî, ji bo lawê xwe Derwêş.

Hîn sibe bû eve bûye hesra teng Evdî li ser pişta qemerê nehate xwar û veysanok nedabû qemerê. Rojên buharê ku li welatê kurdan gerim û hênikin, merov jî bi westandinê nehisa. Evdî li bin siya dareke hinaran rûnştibû. Kulîkên rengîn yên dara dibişkivîn, erd û ezman bi rengên xweyên xweşik kirbûn wêneyeke rind û delal. Şênî bi coşa buharê, ji malên xwe derketine. Çavê Evdî di navbera kulîkan de diçin û tên. Çav li ba pîrajinan şerm dikin li çavên xweşik û genimî binhêrin.
Hûn darên hinaran yên beriya Wêranşar ê bibînin! Xwedayo ew çi darên xweşin, ew çi kulîkên spehîne! Niha der û dorên Wêranşar ê bi rengên xweşik ji nû ve vedijin û tehima hinaran...Libên mezin û girover yên hinanran di devê merovan de dibin şekirmizî.
Evdî,yê kal dîsa ketibû ser bişta qemerê û ber bi Wanê ve ajotibû. Li dora gola Wanê êdî şev tarî

bûbû. Lê ronahiyê heyvê û sitêrkan tarî zelal kir bû. Nîvê şevê her der ker û lalin, heyv jî di kawin û tamamiya xwe de bû. Stêrik li ezmanê kurdistanê mezin û biçûk dilîzin. Ji dûr dengê wawîkan û çeqelan tê. Şeva avis li ber weladetiyê ye. Piştî niha bi demeke kurt rojeke nû wê bizê.
Evdî kurikê xwe bi ser xwe dakiribû û ketibû xewê. Çîve çîva çivîkekî hawîrdor vegertiye. Çivîk bi firê dikevin û vedinişin. Lê di wê navberê de dengekî... Dengekî tîz-tîz û zirav. Vîçe vîça çivîkekê. Weke ku ew li bin guhê Evdî vîçe vîç dike. Evdî li dora xwe dinihêre. Wîçe wîç ji kû tê?... Belê ji bin kêlekê.Di bin darê de çivîkeke pir biçûk li ser darê, di nav şax û pelan de hêlîneke biçûk. Rebena çivîkê! Çivik diperpite ku bifire. Lê ka basik? Bask hê baş li hev nehatine. Ji wîçe wîça çivîk Evdî nikarî bû bekete xewê. Êdî rabû û di wê berbangê de dest avêtibû bilûra xwe. Haya Evdî ji tiştekî tunebû. Di ronahiya berbangê de, dengê bilûrê bi tenê dihat. Evdî ji kevin de, belê ji xortaniya xwe de li bilûrê dida. Bilûreke xweş lêdida. Dibe ku li beriya Wêranşar ê merovekî bilûr weke Evdî xweş lê nedixist. Lê mixabin kesekî nedidît ku Evdî li bilûrê dida.
Hespek li dora Qemerê peyde bû! Evdî nizanî ne ji golê derket û ne jî ji ezmanan hatibû ,orê, her wî dît ku hespekî stuyê xwe ber bi taliya qemerê ve dirêj kiriye, hespekî pêçav sipî. Çendî Evdî hesp

dîtine, lê weke wî hespê nedîtiye û nabîne. Evdî hêvî ji yezdan dikir ku ew hesp bibe nesîbê lawê wî Derwêş. Hîn ew di xeyalên hesp de bû, hîrîn bi hesp û qemerê ket û pêre-pêra hesp winda bûbû.
Evdî qulibî ser pişta qemerê û berê xwe da rêya vegerê nav konên Şerqiyan û Dinana. Derwêş ber bi bav hatibû û bi rişma qemerê girtibû, bi xêrhatin dabû bavê xwe û ji bav pisîbû:
«Bavo ka hespê te ji min re anî ?!»
Bersiva Evdî jî ewbû ku heye Derwêş ji qemerê hebe û hespê ku ew dixwaze di zikê qemerê de ye. Derwêş jî kar û barê wî bûbû xwedankirine qemerê, li xwedankirine qemerê re derbas dibûn roj, meh û demsal, qemerê ji Derwêş re anîbû ciwanîkekî pêşçav sipî. Kesê ku ciwanîk didît digotin; «Me hespê weha bi vê heybet û siphîtiyê nedîtiye.Ev ciwanîk hêjaye ku bibe hespê mêrxasekî,egîd û qehremanekî, paşa û sultanekî. Layîqî wî hespî be. Gelo Dewêşê Evdî,yê Mulhim wê bibe mêrxasekî ku hêjabe li hespekî weha hêja siwar be?...Roj û demên li pêş me kefîlin ku mêrxasiya kurê Evdî bêten nerxandin.

Derwêş û ciwanîk bi hev re mezin dibûn. Êdî Derwêş zîna hespê xwe dabû çêkirinê. navê hespê xwe jî danîbû Hedban. Hevsarê Hedban bi zîv niqişandibû û ji xelekên zêr û sedef zîna Hedban

çêkiribû. Di bin zînê de kulavekî ku xweşikbûna neqişê wî ji dûr ve diyar dibûn, li ser pişta Hedban danîbû. Li ser wî kulavî bi rengan wêneyeke kevinar (Roj) çêkiribû. Li paş wêneya rojê jî dareke kesk a jiyanê bilind dibû. Li aliyê çepê jî her weha wêneyên roj û darê hebûn.Dibe ku ew wêneyên han nîşana êla Şerqiyan bû, yan jî wêneya hinek êlên navdar bûn.

Derwêş êdî şûr û rimek ji xwe re peyde kirbû, her roj rojên xwedê diçû nêçêra karên xezala. Evdî,yê kal gazî kur kirbû û çend şor ji wî re kiribûn û weha jêra got bû:
«Lawê min;baş li şorên bavê xwe guhdarî bike. Ji roja roj de parastin û qurbanî di ber êl û pismaman de kardariya malbata te ye.fîdakariya ji bo merov,erd,milk û namûsê ji aliyê mala me ve heye. Belê ji dema kalkê me Pêpahn de, em xwe nedir û qurban ji bo xatirê namûs û şerfa miletê xwe dikin. Ji bo parastin û azadiya xaka xwe. Îcar şikir ji bo xwedayê mezin va tu û birayê te Sehdûn bûne mêr. Lewma jî ez barê mêranî û egîdiyê êla Şerqiyan û Dinan dispêrim te. Lê bira her dem di hiş û bîrên te de be. Bila her tim şûrê te li dijî zilm û zordariyê be. Hevalê jar û ketiya be.Lewma ez dixwazim vê aghidariyê bi ghînim te.
Berî du rojan êla Bîzîka miletê me talan kirine,

erş û talanê wan ji koka binî ve birine, tu qîmet û
esabê fêris û egîdan re nekirine. Îro roj, roja te ye
u bavê te bizane, êdî lawê wî egîde, fêrise,
warê Hedban hêjaje navê egîdiya Şerqîyan û
)inan hilîne.»

)erwêş piştî axaftin û şorên Evdî bê bersiv û
xaftin xwe avêtibû ser pişta Hedban û berê xwe
labû şer û cenga Bîzîka.
)erwêş berê xwe dabû warê Bîzîka, di rê de
arwanê talankirî dîtibû û doz vegerandin talan
iribû. Siwarê Bîzîkan jî talan li hev par vedikirin,
îtin ku siwarekî di pêşiya karwan de rê girtiye.
)u şervanan ji şervanên Bîzîkan Everê Eyşanê
)ismamamê Everê Gêsan (Ereb) û Xişman serokê
gîdên Bîzîka xwe berdabûn pêşiya siwarê
Iedban û got bûn;
«du-sê heywanan ji talan ji xwere bibe û pêşiya
arwan berde»

)erwêş gazî wan kiribû û got bû:

Bîzano-Bîzano dilê min liyan e
hûn îro rûnştin e li ser sê daran e
dikin qisma talanê me kurdan e
li hev parevedikin keriyê mîyan e
sagê hêştiran e tewlê nejdan e
heya ez saxim li vê diniya han e

kesek dilşa nabe bi mal û tekiyana kurdan e
ma hûn min nasnakin ?
Derwêşê Evdî,me siwarê Hedban zinarê mêram e
Eger hûn mêrin, xwe berdin cenga mêran e
bi hev re biaxivin bi şûr û riman e
mêrxas wê diyar bibin li meydane mêran e
ta hûn bibînin cenga kurê Evdî siwarê Hedban e
hûn ji bîr nekin navê egîdên Şerqiyan e
ezê ji we bistînim talan e
we teve bikujim li vê hola han e
talan vegerînin li xwediyan e

Derwêş talan vegerandibû, li ber konê Evdî dabû mexel, bê ku xeberê bide bav li aliyê malê ketibû nav livînan, qasekê xwe sipart bû xewe sibê.
Evdî ji xew şiyar bûbû, dîtibû ku keriyê terş û talan li ber konê wî dane mexel. Êdî wî dizanî ku Derwêş ew talan zîvirandiye.
Evdî bi rageşî gazî girkirekên Şerqiyan û Dinan kirbû û biriyara xwe ji wan re wiha got bû:
«Gelî êla Şerqîyan û Dinan; gelî pismaman hûn dizanin ku êdî Evdî,yê Mulhim kalemêr bûye, hêz û qeweta min ji bo şer û cengan nemaya, ez egîdîya êlê dispêrim lawê xwe Derwêş. Bila hûn tev bizanin ku Derwêş bi tene xwe, talan ji Bîzîka standiye û vegeraniye.

******

Rojekê ji rojên buhara Wêranşarê, ku heywan ji giya têr bûbû, li ber ava kaniyan mexel bûbû. Seyîd Salih ku eîgdek ji egîdên bi nav û deng bû, di nava êlên Ereban (Gêsan) de.

Seyîd Salih êrîşê dibe ser eşîra Dumiliyan û çend keriyên wan talan dike û dibe.
Şêxê Dumiliyan jî xwe hêsîr tavêje bin konê Evdî,yê Mulhim, bi daxwaze ku êla Şerqiyan heyf û tola Dumiliyan ji Gêsan hilînin û talanên wan vegerînin. Evdî jî gazî Derwêş kiribû û jêra got bû;
-Kurê min;Şêxê Dumiliyan xwe hêsîr avêtiya bin konê bavê te. Xwe li bext û baweriya Êzîdxanê girtiya. Omdîda xwe bi egîdên Şerqiyan û Dina ve girêdaye, bi mebeste ku egîdên Şerqiyan omîda wî bînin cî.
Seyîd Salihê Gêsan talanê Dumiliyan ji kokê ve biriye, maşkên wan ziwa kirine, pariyê devê zarokên wan revandine. Nebûye ku merovê kurd (Êzîdî) dexîlê xwe bê omîd ji mala xwe birêkê. Lewma jî ez vî barê giran dispêrim siwarê Hedban, egîdê Şerqiyan.

Dema ku Evdî navê Seyîd Salihê Gêsan ji nav lêvên xwe derxist bû, pêra-pêra rengê Derwêş qulibî bû. Ew dizane ku Seyîd egîdekî bi nav û

denge.

Evdî di rûyê kur de melulî, belê tirs xwend. Lewma jî dîsa axaftina xwe domand û got:

-Çi ji te hat !? Mêrên Şerqiyan ji ceng û şeran natirsin. Hisabê dijmin û neyaran nakin!

«Heçî Êzîdîn e merovin serhişik in Lewma jî Turk û Gêsan ji me re dibêjin; Kurd ser hişikin.» Li kesekî guhdarî nakin. Lê kesek biçûya malên wan, yan jî xwe bavêja bextê wan, heger xwe biqelendine dest vala ji mala wan dernediket.Hêviya wan bi çi qîmetî bûye tînin cî.» Derwêş ji gotin û gala-galên Evdî bên teng bûbû û bê ku xeberê bide destbirakê xwe; Çilo Hîzolî, û nejî kekê xwe Sehdûn û ne Usiv û Bozan, bitenê berê hedban dabû şerê Seyîd Salih ê Gêsan.
Dema ku lawê Evdî diçû şer û cengan her û her xeber dida Çîlo û Sahdûn yan jî Usiv û Bozan lawên Emerê Şerqî.

Dema her çaran bihîst ku Derwêş çûya şerê Seyîd Salih her çar li peyî şopa wî ketin heye ku gihane Derwêş. Li sînorê konên Ereban (Gêsan) de her pênç gihabûn talan. Derwêş li pêşiya talan zîvirîbû, terş û talan ji şivanan standibû. Qunaxeke baş talan ber bi konên xwe ve ajotibûn,

ji nijkêve Derwêş talan dabû rawestandinê û got bû;

-Birano bawer bikin ku Evdî wê bêje we ev talan diziye !..Ka xwîna we rijandî?!...

Lewma Derwêş vegeriye bû bi ser Gêsan de û got bû şivanekî;

-Şivano her bêje Seyîd, Derwêşê Evdî talalnê we dibe heger tu mêrî were cenga min.

Şivan jî xeber gihandibû egîdê Gêsan, Seyîd Salih. Seyîd jî di wê navê de xwe gihandibû Derwêş.

Çîlo û Sehdûn, him Usiv û Bozan li ber xwe didin ku herin cenga Seyîd lê Seyîd her cengê ji Derwêş dixwaze.

Derwêş zîna hedban baş dişdîne û ji Seyîd re xwe berdide hola cengê. Herdû wekî du teyîrên baz ku êrîşê berdidine nêçîra xwe wisa jî herduwan êrîş didan hev. Rojê xwe ber bi malê ve berdide, Derwêş jî serê Seyîd jêdikir û xurcezîna Hedban de datanî û dîyarî bo Evdê Mulhim dibir.

Evdî jî bi rageşî talan ji Dumiliyan re gihandibû heye ber deriyê malên wan.

****

Ædûl qîza Zor Temir Paşayê Milan,ne kin ne dirêj bû, dagirtî bû. Genimgûnî bû. Wekî jinên

kurdên çiyayî fîstanên qat-qat li xwe dikir.Porê xwe çil kezî li hev dihûne. Gerdene wê zêr bû. Xilxalên zîv, zumrûd dixistin lingên xwe. Pir bi aqil bû. Hindik dipeyivî û nerim dikeniya. Çavên wê ên germ û xemgîn bi hesreta daxwazeke dûr diçirisîn. Edûla Milî ji serî heya neynûkên lingan evîndar bûbû. Heya bi hestiyên wê bi evîna Derwêşê kurê Evdî tijî bûbûn, destên xwe dirêjî çi dikir bi evînê dihesiya.

Derwêş kurê Evdî, yê Mulhim axayê êla Şerqiyan jî bi evîndar xwe Edûla Milî re ba bilind û evîndar bûbû. Belê bi evîna qîza Milan re sewdan winda kir bû.

Êdî di ser evîna herdû evîndaran re derbas dibûn meh û sal. Havînên gerim, payîz û zivistan, buharê jî kopik û newalên Wêranşarê, beriya Diyarbekirê xemiland bû. Evîna Derwêşê Evdî û Edûla Zor Temir paşa, paşayê Milan weka gul û çîçekên dora çemê Circib û Zerganê bihena xwe dabû konên Şerqiyan û Milan. Herkas!..Biçûk û mezin, jin û mêr, ciwan û kalamêr bi evîna herdûwan di axifîn.

Buhar ber bi dawiye xwe ve diçû, havîna Wêranşarê konên Şerqiyan û Milan hêdî-hêdî di bin bandora germiya xwe de dagirker dikir.

Derwêş û Bozan kurê Emerê Şerqî li nav konan digeriyan, dîtin ku çend xort bi xar û kap dilîzin. Ewan jî xwe berdabû nav xortan û bi xar û kap lîstin. Derwêş û Hisên ê biraziyê paşayê Milan li himberî hev rabûbûn. Yek ji Derwêş, yek ji Hisên herdûwan êrîş birin hev. Derwêş jî ber bi wî ve hatibû û jêra got bû;
«Lawa me tu ew mêrî tu li himberî min dikî axaftin û şoran !?... Me tu nizanî ez Derwêşê Evdî me,kilê çavê Edûla Milî me !!....»

Hisên bê bersiv ji ba xortan dabû rê raste-rast xwe avête bin konê apê xwe û axaftin û şorên Derwêş ji paşa re got bû. Girgirekên Milan jî bi serve zêde kirbûn û got bûn.

-Paşa gerekî tu me ji vê şermezariyê rizgar bikî, konên Şerqiyan wêran bikî, manûsa Milan biparêsî.

Ew gotin wekî gef û gurekê hatin ber çavên paşa, sor-mor bûbû,laşê wî rihilî. Mûyên wî mîna têlên kevanan hatin şidandin. Simbêlên wî wekî rimên ser binê xwe çikilandî rast bûn.Tarîtiyek bi ser çavên wî de hate xwar. Qelûna xwe dagirt. Dokel bi ser paşa ve ket. Dokel bilind bû û hilkişiya jor.Tasek av xwest. Di yek bêhnê de vexwar. Ji berîka kurkê xwe desmalek derxist û simbêlên

xwe ziha kirin.

Paşa biriyar dabû ku di bin tariya şevê de, egîdên Milan bişîne ser êla Şerqiyan û Dinan ji mêran wan wêran bikin tevan ser jêkin,û jinan li xortên Milan par vekin.
Dema ew biriyar hate standin, Çilo,yê Gozelê (Hîzolî) birayê pênc xwîşkan jî li bin konê paşayê Milan rûnştî bû.
Çilo berî heft salan çar mîrek ji eşîra xwe kuştibûn û xwe avêtiya bextê Şerqiyan. Bi mêraniya Evdî û kurê wî Derwêş Çilo di nav Milan de hatibû parstin.

Çilo dil şikestî ji bin konê Milan dabû rê û mebesta Milan ji xwîşka xwe Îslam ê re got bû, bi mebesta ku xwîşka wî Îslam here bin konê Şerqiyan û wan agehdar bike.
Heçî Çilo ye nedixwest ku xwîn di navbera herdû eşîran de birije,lewma jî qewêtî li xwîşka xwe kiribû ku Şerqiyan bi mebeste wî agehdar bike û Şerqî ji ba Milan barkin.

Evdî bi mebeste Çîlo gihîştibû û deng li êlê kirbû ku agirekî mezin li bêşberî konar gur bikin û gurîna agir re kar û barê xwe bikin ji bo barkirinê.

Doşekên atlas û qedîfe avêtin ser pişta hêştira û

hespan. Zînên Diyarbekirî li hespan kirin. Lihêfên Urfelî avêtin ser doşekan û ser pişta heywanan şidandin. Egîd û ciwanan zilxên cengê hilanîn û qulibîn ser pişta gihêlan. Zerî û esmeran guliyên xwe yê hinekirî şeh kirin û berdane ser herdû milan. kofiyên Batmanî li serê xwe de girêdan.

Di wê şevê de êla Şerqiyan û Dina bar dikin û li dora çemê Circib û Zerganê bi cih dibin.
Demeke ne dirêj di ser barkirine Şerqiyan re derbas dibe, Paşa dixwaze ku dîsa wan bîne ciwarî Milan bi war bike. Lê her çend carên ku qasidê Paşa dihate ba Evdî, Evdî qayîl nedibû û Şerqîyan cihê xwe bernedan. Lê dîsa herdû eşîran sozên biratiyê nû kirin û hiskirin û rûmet di navbera herdûwan de domand.

****

Derwêşê kurê Evdî wekî hevalbendên xwe evîndar, wekî Memo, Ferhat û Siyamend sewdan winda kiribû, ba bilind bûbû. Her wisa jî Evîndara Derwêş Edûla Paşayê Milan jî roj bi roj melûl û jar dibû. Herdû eşîr jî di vê evînê de şaş mabûn tu rê û rêbar jê derinedixestin. Milan ji aliyê xwe ve soz didan û sozên xwe xera dikirin. Şerqiyan jî, ji ber sedemên olî rê nedidan vê evînê.

Sedemên olî, Êzidiyatî û Muslmanî wekî sedda Çînê û dîwarê Qudsê dikete navbera herdû dilên evîndar. Ew daxwaz dibûn kul û kovan. Ol û mezheban çiqas dilên nêzîkî hev û birîndar, ji hev qetandine û wan bi xemên wan ve, birine nav axe sar. Ji ber guriya ol û mezheban bihêle welat, bajar û gund jî jê xlas ne bûne.
Derwêş ji xwe re digot; Edûl hêjaya ku diniyayê ji bo Zor Temir paşa re kaf û kom bikim. Belê hêja ya jiyana xwe ji bo wê diyarî û qurban bikim.
Ma Şah Cîhan qesra nav û deng Tacmahal, ji bona xatirê jina xwe Mumtaz Banû çênekirbû? Xelîfê Ebasiyan Harûn Reşîd ne bû yê xwarin amanên zêr û zîv da danî ber jina xwe Zubeydê? Em kurd jî ji aliyê eşqê de ji kê kêmtir bûn? Şêx Sen`aniyan ne bûye yê ji bona evîniya keça qeralê Ermeniyan heft salan bûbû gavanê Berazan. Ma Seydayê Cizîrî kêm gotiye? Ew ne bû yê hem keça Mîr Umaddîn, hem jî keça hukumdarê Hesenkeyfê. Ehmedê Xanî ger wî jî ji evîndaran hez ne kire, aşiq li ba wî qedirbilind ne bûyan, ma wê çima Mem û Zîn nivîsîbûya.
Dêmek yê gotî rast gotiye: « Di vê diniyayê de çi hebe eşq e»

Eşq ji bo herkesî helal û duriste, lê ji bo kurê Evdî bi tenê heram e ?!...

Ji roja pêşiyê de, baweriya wî derketin û rêwîtiye Lalişa nûranî û destûr xwestin ji Axtiyarê Mergehê bû(Babê Şêx). Dixwest ku navê wî jî bikeve nav karwanê aşiqan. Dîroka Milan de navê wî û Edûl ê bête gotin û girêdan. Ji xwe welatê Kurdistanê tev warê aşiqan û evîndaran e. Keçên çav bi kil û çav li derve di rêya bêriyê de dost, siwar û yarên xwe di dîtin. Ma qeyî eşiq ne viyaneke? Dema ku sipahîtiyên rûyê erdê û ya insanan gireşte hev, viyan dizivire eşqê. Eşq deryayeke herî kûr û fireh e. Yê melevan nebe ji xwe nikare xwe bêxe nav de jî. Gelek melevan jî di wê deryayê de xeniqîne. Bila hema ew jî yek ji wan be!... Lê ew deryayê ew niha ketî nav de, ji ya Memo kûr tir bû. Evîna Edûlê bû ku teyrê eşqê li ser milê xwe dît. Xwe wekî kulîlkeke rêya quban de, belê ya nav gerav Wanê de hesiband.

"Insan pîr dibe lê eşq û dil pîr nabe."

Derwêş her roj û her seat doz li Evdî dikir ku here Edûlê ji wî re bixwaze.Evdî jî her yek gotin bû: "Mehra jina Musliman li mêrê Êzîdî nabe!"
Lê Eyşa Welêt diya Derwêş şîretik li kurê xwe kirbû, ku here Lalişa nûranî û desturê ji babê şêx bistîne.

Agirê evîna Edûlê dilê wî girt û bernede. Dilê wî

tarî bû. Bêdengiya merovan bandor li heywanan jî kirbû. Wê şevê ne hesp û ne jî mehînek şîhiya, ne çêlekek û ne jî gayek qoriya. Şeveke ker û lal bandora xwe li konên Şerqiyan kiribû.

Derwêş jî bi berbangê re ji xew sibê rabûbû, solabendê Hedban şidand bû, self ber xwe de berdabûn, şûr û rima xwe hilgirtibûn û pişta xwe dabû ewra Milan û berê xwe dabû Lalişa nûranî.
Roj hîn qamekê bilind Hedban ê rewan siwarê xwe gihandibû Amedê û keleha bi nav û deng ji siwarê Hedban ve diyar bûbû.
Di çîrok û çîvanokan de jî kelihên wisa bi heybet ne bihîstibûn. Bawer nedikir ku ew kelih bi destên insanan ve hatiye çêkirin. Ciwaniya rezên devera Dicla yê ji baxên Îremê kêmtir nebûn. Şêx Hesen Al-Sabah jî keleha Amûtê biheşteke wisa çênekirbû. Çiqas dîrok, çiqas keda miletên xwedî bawerî ser bircên kelehê xuya dibûn.
Derwêş berê hedban da nav deştên bi xêr û berket.Hefsarê wî sist kirbû. Ne serê deştan diyar e û ne jî binê wan. Mîna stêrkên esmanan gund û bajar ketine singa erdê. Ji dûr ve merov û heywan wekî moriyan xuya dibin. Meznehiya erdê kurdistanê, boşatî û bindestiya wan mejiyê wî mîna herîkêla birincê tevlihev da. Xwest ku Edûlê bîne bîra xwe. Nehişiya derdên xwe û viyana Edûlê her wekî wêneyên dil kovan hatibûn kulan.

Şikeveftên Hesenkêf, birc û kelaha asê, qesrên kêleka rûbarê bilind bejin û bala minarên serî hildayî esmanê jor, ew serxweş kiribû. Derbas kiribû warê Mem û Zînê, Welatê Botanê. Di rê de dîtibû ku çend mêr li wê derê girêdayîne li dora wan karwanê qantir û keran di nav nefel û endekufê de diçêrin.Merovek şûr di deste û bi zirt û fûtan li wan belengazan dikir. Ew di wê dîtinê de bihîtî mabû. Ewî ji aliyekî soz dabû diya xwe Eyşa Welêt,ya duduwan ewî biriya ji Evdî re dabû dema ku egîdiya Şerqiyan û Dinan sipartibû wî ku şûrê wî ji bo rizgariya belengaz û ketiyan be. demekê bi xwe şêwirî û dawî biriyara xwe dabû ku wan ji wî sitemkarîyê rizgar bike. Derwêş berê Hedban dabû ba karwanê girêdayî, xwedanê şûr xudanê zirt û fûtan hate pêşiya Derwêş û bi dengekî bilind gota Derwêş:
- kuro!!..Hespê xwe ji min re bihêle !...Ji bo xatirê ez te nekujim.
Derwêş jî weha li vegerand:
-Van hêsîra berde!....Soz didim ku ez te nekujim!.
- Ez Nûhê Gergerî me yekî wekî te wê min bikujê !?
- Ez Derwêş Evdî me,tu li himberî min dikî axaftin !?...

Yek ji Derwêş yek ji Nûh herduwan wekî du

beranên serkozê êrîş berdan hev. Di demeke kurt de Derwêş pişta Nûh danî erdê û şûr danîbû ser zenglorka qirikê. Nûh dizanî êdî ku ewê bête ser jêkirin. Bûbû taq-teqa kenê Nûh. Derwêş li sedemên kenê wî pirsî:
- Ez dikim serê te jêkim tu dikenê !?
- Axaftinên bavê min hatin bîr min. Bavê her dem digot: « Kurê min talankirina karwanan terk bide, karwançî, rewingî belengazin gûnene.» Bavê min gelekî li ber xwe dabû ku talankirine karwanan bi min bide betal kirin. Lê min guh nede gotinên wî. Rojekê min hespa xwe amededikir şûrê xwe hildigirt, bavê min li himberî min sekinîbû û gotbû:
«Kurê min; tu çav sor bûyî, ba bilind bûyê hêvîye ji yezdanê pake ku xortekî wekî te çavsor û ba bilind li te derkeve serê te jêke û belengazan ji sitemkariye te xelas bike.»
- Rabe ser xwe bila tu xatirê bavê xwe be.Herduwan dest û biratî dane hev.Nûh soz ji Derwşê stand ku li vegerê bibe mêvanê birakê xwe.

Lawê Evdî dîsa dabû ser rêya Lalişa Nûranî. Derwêş xwe hêsîr avêtibû pêsîr Babê Şêx û hêvi û rica kiribû ji ocaxan.
Babê Şêx:
- Kurê min; daxwaze xwe bêje û bixwaze. Te mêr

kuştine yan jin revandin e, te karwan talan kirin yan posta hukumetê şelhandine ?
- min ne mêr kuştine û nejî posta şelihandine.

Derdê min derdekî giran e
derdê min evîn û eşqa dilan e
evîndara min qîza Paşayê Milan e
bavê min axayê Şerqiyan û Dinan e
mêrekî dîndar û şikestiyê ocaxan e
rê nade evîna me herduwan e
ez Êzîdî me, ew jî Musliman e
Babê Şêx:
Kurê min; mehra qîza Milan li te nabe
qapî ji bo vê yekê venabe

Babê Şêx bizane,derdê evînê derdekî giran e
eşq bi xwe jî bi emrê Yezdan e
ez ê bişkînim qapiyê olan
ez ê ji xwe re biguhêzim qîza Milane

Derwêşê Evdî dil şikestî zîvirî bû bi ser Edûla Milan de, ya ku bi durketine wira melûl û jar bûbû.

****

Dema buharê bi xweşiya xwe kopik û kuperên

beriya Wêranşarê bi rengên xwe ve dixemiland,di miha Adarê de heye miha Nîsanê...Belê ji Nîrwozê heye çarşemba sor Qewalan Tawis ji Lalişa Nûranî bi rê dikirin heye ku di wê demê digeha hewrê Milaniyê. Berî ku Tawis here nav konên Şerqiyan û Dinan,bi gihîştina Qewalan re, belê şeva yekemîn ji mêvaniya Qewalan,Qewal tevî tawisa xwe mêvanên Paşayê Milan diman. Erê ev bûbû sê-çar salin ku Tawis nehatibû nav Milan.Qewalan jî nizanîbûn ku dilmanî ketiye navbera Milan û Şerqiyan. Kêfa Paşayê Milan jî bi mêvanên wî re dilxweş bû,wî jî ji wan re wê şevê tu agehdarî li ser Şerqiyan negot bû.

Di dîwanxana Paşayê Milan; "Temîr Paşayê Zengo Zêrîn" de qasî çil-pêncî merovî rûniştî bûn. Hinek ji wan çav şîn,bejin bilind, zer û zenane bûn. Hinek ji wan mîna beranên qemer û hemdanî,hin jî te tê bigote sofiyên Evganistan in, riha wan dirêj û tevlihef. Hinek ji wan jî simbêlên wan li ber dumana qelûnan zer bibûn. Wekî çiqên heliza behî bi ser lêvên wan de hatibûn xwarê.
Piranî ji civatê xencer di ber wan de bûn. Dema ronahiya Şêşimis yan ya şemalan di avête bişkokên wan ên zêr û zîv diçirsandin, Di şerwal û kofiyên renga reng de xemilî bûn, bi usûl, edeb û rêzê pirsên diniyayê û olî, ceng û şeran dikirin. Qewalên emir mezin jî car caran bersiva wan

dida. Qewal him ji aliyê olî û him jî yê diniyayî ve herî tijî bû. Helep, Bexda û Stenbolê geriya bû. Biyaniyê ilmî û irfanê nebû. Gelek zana û gernasan ji nêzîk ve nas dikirin. Di dîwan û meclisan gelek hemdemên bi nav û deng de rûnştî bû. Ji bilî kurdî zimanê Erebî û Farisî jî baş zanîbû. Ji Hozan û dengbêjan jî pir hez dikir. Helbestvan û dengbêj ji dîwana wî kêm nedibûn.Gelek rûpelên Mishef Reş û El-Celwe jî ji ezber dizanî. Ji dîrokê jî gelek hez dikr. Dîwanxana Paşayê Milan ji gotinên pirtûkan û zar gotinên bav-kalan dijî kiribû. Zilm û zordariya Ereban,Faris û Osmaniyan li ser miletên xwe, Qewal ji civata Milan re diyar kirbû.

Wê şevê jî giranhiya deng û behsan li ser Zilm û zordariya Osmaniya û Ereban derbas bû. Dewlet çawan li ba wan bi qeder û qîmet e, ji bona parastina dewletê çawan hemî rêkên xwînmêjîyê diceribînin, hukumdarên Osmaniyan ji bona silametiya sultanên xwe çawan birayên xwe hêja zarok di dergûşan de didane kuştin, gund û bajaran çawa wêran dikirin. Merovan bi sed sed bi hezar û hezaran di avêtin nav çalan. Ereban sê xelîfên pêxember sexmeratî mezinahiya dewletê çawan dabûn ber şûr û xenceran, serê neviyê wî Hûsên çawa li deşta Kerbela jêkirin, û pê bi holanê lîstin, çawa dubendî êxistin nav Mediyan û dewleta wan cawa faşil kirin.

Kela (keliha)Dimdimê çawa hate wêran kirin, jin û zarok, bûk û nûbûk çawa di birca Narînê de, bin şûrên qizlbaşan de derbas bûn û serên wan hatin jêkirin, ji bo zilamên xwe dilsot û dilkovanî pêşkêş kirin.

Di mêjûyê de dema ku xanedanên van hersê hovan dihilweşiyan yan jî dimane birçî, çawa dihatin ser xaka wan, çawa ew qir û talan dikrin. Birayên xwe yên kurd kirine dijimin û neyarên wan, jê re qise kirin. Ji bona baweriyên xwe yên olî çawa berxwedan û serhildan kiribûn. Ne Sultan Murad, ne Herûn Reşîd, ne jî Şah Ebbas karî bûn wan baweriyên Êzîdxanê ji dilê xwedanên wan bînin der. Talan, qirkirin, xwînmêjî û xwînrijandinê zêde tu tişt ji wan re kar nema bû.

Civatê jî wekî pezê bêser guhdariya Qewal dikir û perdê dilê wan hemberê zorkar û bêbextan her stûr dibû. Kurtahiya şevên buharê demê razanê nêzîk kir. Dîwana Qewal tu caran vala nedima. Merov ji sohbeta wî têr nedibû. Peyv mîna rûbarên şîr û hingivînî di nav lêvên wî de li dûv hev diherkîn. Te dê bigota ji heft zanayên Yewnaniyan ew yek e, bi hezarên sal n şûn de li gundekî Mezopotamiyayê şînbûyî. Ji xwe xwedanê Mezopotamiyayê yên qedîm jî ew bûn.

Qewal dîsa dest avêtibû axaftinê. Berê xwe dabû Paşayê Milan wekî ji wî re diaxive.

-Ezbenî, gelê kurd, gelê kurmanc bêtifaqe... Bê çima!?... Eşîr li dijî hevû û dinin, Xwîna hevdû bê sedem dirjînin. Dijimên wan bi kêfa xwe bi wan dilîzin, bawer bikin! heger birayên me yên kurd kurdên Muslman ne dane pêşiya eskerên Romiyan,Roma reş, eskerên Romê bi tene xwe newêrin werin ser gundên me. Lê çi bêjim ji bo kêm aqilan!... çi bêjim ji bo nezanan!... dijimê qewmiyeta xwe ne. Biran roja dawî kesek ji bilî me,xêra me naxwaze!.
Erê Paşayê min!... Kurmanc mezinahiya hevdû dû qebûl nakin, dibe ev yek jî, ji ber zulmek û zordarekê hilatî be, bi çi awahî hatibe têra me hat. Îro şûn da gerek em bi zimanê xêrnexwazan ne axivin!... Bi rastî dixwazim, ji bo civata Milan bêjim; bêtifaqiya mala me hemû kurdan, wêran kriye kurdên musulman di derheqa me Êzîdiyan de, ew gelekî hatine xapandin. Osmaniyan, Ereb û Farisan mejûyê wan şûştine. Olê Îslamê daxwazên wan yên neteweyî qusandine û kor kirine. Di dil û hiş wan de, em qewmekî kafirin. Qetla me helal e, malê me ji bo wan xenîmet e. me diKujin ji bo biheştê ji xwe re qizinc bikin û qesran di wê biheştê de bistînin. Qesrên vê diniyayê bo Ereb,

Faris Rûmiyan ne, yên diniyaya din ji bona wan veşartine... Lê ez heyretgirt mame!... Biratiya me çawa ketiye dilê vî zilamî.
« Destê xwe ber bi Paşayê Milan dirêj kirbû. »

Çi !?...Agire dijminahiya me ji dilê wî derxistiye ?... Gotinên wî hemî wekî kevirên Kela Babîlê necirandî û çêkirî ne. Destê hosta û zanan hatine birîn. Di mejûyê merovan de zû cihê xwe digirin.
Neteweye kurd, mêşe-bîşe, rêl e û daristan e, paşayê min; şêr, mêr tu caran jê xilas nabin. Xudanê warekî qedîm, zeviyeke qelew e û Mezoptamiya ye... Di vê dergûşê de zanayên û mêrxasên wekî Kawa yê hesnker, lê hengên wekî Selahedînê Eyûbî mezin bûne.

Gotinê Qewal pir bi Paşa xweş hatin, lê careke din jî şikên di dilê wî de hemû nehatibûn malîn. Ew di axaftine Qewal de xwendibû ku Qewal bi bêbextiye ku li Şerqiyan kiriye, Qewal pê eghidar e ...!? Ya duwemîn jî her dem sofî dîndarên Milan baweriya wî ji Êzîdiyan dibirî. Lê baweriyek wisa li ba wî peyde bû ku Qewal di gelek dîwanên merovên aqilmend ^e rûniştîye. Guhê xwe pir dabû gotinên merovên zana û maqûl. Paşa pê gihîştibû ku ji bo insanan qencîxana herî mezin zanatiye. Nezanîn tarîtîye,

zanîn ronahîye. Rêka aqil nebe tu kes nagihe armanca xwe.

Îdî şevê nîvê xwe derbas kirbû. Civata Paşa jî belav bûbû. Sibe ronahî bûbû,Qewalan jî ber bi şêşimis (ROJ) ve Rawestiyabûn û du,a xwe kiribûn û berê xwe dabûn konên Şerqiyan.

"Emê qasekê Qewalan li mêvaniya Şerqiyan û dinan de bihêlin, dîsa vegerin bin konê paşê Milan."

****

Dema ber bi êvarî ve diçe, rojên buharî li beriya Wêranşarê, esra-teng, ji rojên buharê, bihêna gul û gulçîçekên beriyê dilê rûnştiyên herêmê rageş û xweş dike.

Paşa bi çend xulaman ve li sînga kon ve rûnştibûn. Siwarek wekî gula berno,yê ber bi konê paşê ve xwe dikişîne, bên li wî û hespê wî çikiyayî, xwe ji ser pişta hesp avêtibû ber lingê Paşa û got bû:
-Paşayê Min; me du merovên Ereb li beriyê girtine,ewan ev nama ji bo Paşayê Milan ji ba

mezinên Ereban û Turkan anîne ji bo cenabê we. Xulam nama ber bi Paşa ve da. Paşa jî şandibû du Mele Xelîl serokê katiban. Mele Xelî nama du-sê caran xwendibû, wekî ku bawer nedikir. Mele Xelîl devê xwe anîbû ber guhên Paşa û jêr naveroka namê gotibû. Bi axaftinên Mele Xelîl re rengê Paşê reş qemer bûbû û pêra-pêra deng li xulaman kiribû û got bû:

-Zû lezikin! qasê Milan li bin konê min de kombikin.

Di buharê de qasên Milan berê xwe didan koçeriyê. Îsal jî wekî her sal piraniyên Milan ji beriyê barkirine û berê xwe dane koçeriyê. Milan vê salê bi du şopan ji beriyê xwe berdane koçeriyê. Şopekê xwe berdabû biniya bajarê Reqa, yê û şopa din xwe berdaye sînorê Şemer a, derbas kiribûn sînorê Îraqê.

Mele Xelîl bi fermana Paşayê Milan du nama şandibûn li du herdu şopên Milan û got bû:
„dema nama min bigeha destê we, di wê demê de li ber konê bin !!"

Deh roj qediyan ku Paşa namên xwe şandibûn ji bo koçerên Milan re,dem derbas bûbû roja

yazdehan, hezar û pêncsed siwar ji fêra eşiren Milan li ber konê paşayê Milan xwe berdabûn ser darî riman.

Paşa rabûbû ser pîyan, herdu destên xwe dabû pişt xwe û di bin kon de li nîvê civata Milan çû û hat û gotibû:
-Milan o!.. Sibeye bila dengê min bê we tevan, dijminên we li hev kom bûne wekî wawik û mawîkên devê çeman, Turk û Gêsan ji hevra sûnd xwerina bi kitêb û Quran,a ku kuştina wan heye, lê vegera wan tune bê talan û namûsa Milan.

Kom mezina, cerd girana... Hezar û hefsed siwarî Gêsan, û hezar û hefsed siwarî Turkan, Şemir û Badû, xwe berdane beriya kurdan qûtkirine kepezê Kîkan, berê komê li warê Milan e. Li beriyê diherikin wekî kûlhên bejik, li pêş xwe dibirin ter û hişik, heftê keçikên Şêxan û mezinan bi wan re ne. Heçî ji egîd û girgirekên Milan ji min re bîne salox-sloxêdane wê cerd û koma giran, ez bidimê qîza xwe Edûl, qîza nazdar xwedane morî û mircana, qîzika çar gulî, Edûl me'dene zêran. Ezê ji wan re vedim konekî li ser çardeh situnan, berdim pêşiya konê mezin boşê hêştiran û hespan,keriyên dewar û hilkan, bi ser van tevan de ezê Edûla Temir Paşayê Zengo Zêrîn dîrka bîst û çar eşîrên kurdan, bikim kebaniya

mala wan e.
Di bin konê Paşê de rûnştine, beg, axa û egîd û girgirekên Milan.

Xwînê xwe berdaye navbera goşt û neyînokan. Qehwaçî qehwa danîbû ser zilfa zêrîn gerandibû li civata Milan ,heçî vexwe fincana qehwê, wê here şerê wê cerd û koma giran e.

Marekî xwe bi çend fitaln pêçaya li fincanê, zimanê xwe dirêj kiriye bostekê û çar tiliyan.

Sê caran fincana qehwê çûbû wî serî civata Milan vegeriya bû serê dinî civatê, kesekî ji civata Milan ceger nekirbû ser sifirê hilîna fincana qehwê, hilgire barê cenga Gêsan û Turkan.

Di bin kon de rûnştibûn tev egîd, beg û axa, tev filan ibn filan in, xwedanê hespan e,yê keriyê mihan e,maqulê malan e. Tevan serê xwe berdabûn ber xwe wekî jinan, bostekê ax li ber xwe kolan e.

Temir Paşa gazî kiribû Mele Xelîl serokê katiban, ji wî re gotibû:

-Mele Xelîl rabe kaxezekê binvîsa bişîne ba Evdê Mulhim, nav her çil malên Êzîdxanê, belkî Evdî

axa bi gazîya Milan ve bişîne Herdû şêrên xwe, Derwêş û Sehdûn. Mefera me maye Derwêşê Evdî lawîkî Êzîdî, siwarî Hedban. Belkî Derwêş ji ser Milan vegerîne koma Turkan û Gêsan.

Mele Xelîl li Paşa zîvirîbû bersiva paşê weha dabû:
-Paşa!.. Ez nizanim tu xurifî bi hukmê salane!?... Paşa me tu nizanî ku ev pênc salin cenabê we xeyîdandiya axayê Şerqiyan, bavê Derwêş zinarê mêran.. !
Paşa were em xwe hêsîr bavêjin bin konê Evdî,yê Mulhim axayê Êzîdxanê, belkî Evdî bide me herdû şêrên xwe Derwêş û Sehdûn. Ez sûndixum bi Quranî ezîm, ku lawê Evdî ji ser Milan venegerîne cerd û koma girana, kesek ji Milan ceger nake û venagerîne koma Turkan û Gêsan e!...

Paşa û Mele Xelîl siwar bûbûn li hespan, berê xwe dabûn konê Şerqiyan.

Evdîyê Mulhim axayê Şerqiyan, bavê Derwêş û Sehdûn, emrê wî ketiye heftê û Pênc salan, Jina wî Eyşa Welêt emrê wê ketiye heftê û du salan, çavekî wê kor bûye û yê din jî bi dûmana. Herdû rabûbûn ser piyan û pêşberî Paşa ve çûbûn, xêrhatin dabûn wan, qedirekî mezin ji bo Paşayê

xwe girtibûn, wekî mêvanekî ezîz û qîmet giran.
Evdî wisa ji Paşa re diyar kirbû wekî ku bêje ; « Paşa: Bi hatine te dilman ji aliyê min ve hate jibîrkirin.«
Evdî bi xwe jî, ji hatina Paşa ecêmayê bûbû, ji xwe re digot : »Gelo Paşa hatiya ba min çi ?! »
Ewî dizanî ku qedereke mezin hatiye ser Paşa, lewma jî Evdî nema sebir kirbû û Paşa pirsî :

-Paşa ez nizanim çi ecêb bi serê te hatiye ?!... Te îro berê xwe daye bin konên me Şerqiyan, rengê te ketiye rengê miriyan. Ez sund dixuim bi sunda mêran,tirseke mezin ketiye dilê paşayê kurdan, hêviye min ji yezdan paka ku tirsa paşayê kurdan ji xwena şevan be. De ji Evdî re daxwaze xwe bêje.

Mele Xelîl axaftine Evdî birîbû û berî Paşa bersiva dabû :

-Kekê Evdî, ma we nebihîstiye ?!... Ji Paşa re namak ji Turkan û Gêsan, Şemir û Badû`an hatiye, Turk û Gêsan li hev kom bûne wekî gûlihên bejik, sund xwarine bi Quranan ku ewê êrîşê bibin ser Milan, malê Milan ji koĸ de talan bikin, namûsa Milan bidin ber lingan, wê qîza Paşayê Milan bibin ji beg û Şêxên xwe re.

Turk û Gês ji Milan dixwazin şer û cenga mêrane, qeb-qeba kewane. Mezinê Gêsan gotiye;
" wê yekê bi serê Milan de bînin ku heye heftê û du bavê kurdan rabin, ev şer û ceng han neçe ji bîra kurdan."

Turkan û Gêsan karê xwe kirine ku şerf û namûsa Milan bifiroşin li sûk û dikana, namûsa kurdan bînin qîmetî du qiruş û nîvan.
Heger namûsa!.. Namûs namûsa me kurdan e.

Evdo keko, kî bîne salox û solaxdan wê koma giran, paşa wê bidiyê qîzika nazdar, xwedane morî û mircana, Edûla qîza Paşayê Milan xwediye gûliyên hinekirî, bazinên zêran. Wê bi ser de jî jêra vedê konekî ser çardeh stûnan, berdê pêşiya kon, boşê hêştiran keriyên mihan û hilikan.

Dema Evdî axaftinên Mele Xelîl bihîstibûn çavên wî sor bûbûn wekî agirî daran, rayên aniya wî hatibûn hev, pora serî desmala Mosilî bilind kiribû, bersiva Mele Xelîl dabû, lê berê xwe dabû Paşa û got:

- Paşa ez nizanim ne tu xurifî bi hukmê salan e, ne jî te aqilê xwe windakiriye,ji qehrê nama Gêsan û Turkan, ne jî, ji tirsa windabûna Paşatiya Milan e !!??

Hûn mala Paşê malake bêbextin, telaq reş in, hûn qedrê camêr û mêrxasan nasnakin. Dema hûn di ferhiyê dene, em ji bo we ne tiştekin, em ji bo we Êzidiyên kafirin, qîmetê me du qiroş û nîvin. Ji berê û paşê de tu bi çend malên me Şerqiyan û Dinan dilîzî!! Ma nayê bîra te, dema ez siwar bûbûm li qemerê diya Hedban, tu jî li hespekî kihêl ku bi stêran re dibezî, em çûbûn nêçîra xezalan, li tixub û sînorê dijminan, bi sadan li me derketibûn siwarên Hacî Faris, ji tirsa siwarên Hacî Faris rengê te ketibû rengê miriyan.Te gote min; „ Evdo em ji xwe re bazdin! Wê min bikujin...Milan wê bimînin bê Paşa û beg.“ Wê çaxê min berê qemerê dabû nav koma siwaran, siwar kuştin bi dehan, yên din jî ji ber bavê Derwêş û Sehdûna bazdan. Dema em zîvirin ba Milan, cenabê we di civata xwe de û li himberî Milan gotbû: „ Evdo,yê Mulhim mêrekî ne Muslman e...Kafire...Bê kitêb û bê Yezdan e !!
Paşa cenabê we çima nizane bi qedirê camêran, xwedan namûs û egîdan... ?!

Eyşa Welêt axaftina mêrê xwe Evdî birîbû û weha gotbû:
- Evdo çima li himberî Paşa dikî van şorane?! Namûsa Milan, namûsa me Şerqiyan e jî, namûsa me kurdan tevan e. Bavê Edûlê, Paşayê Zengo Zêrîn, paşayê bîst û du eşîrên kurdan e, Evdo

pêwîsta ku Paşa bizane ku ji aliyê me ve gelekî kiriya kêmasî û qusûre. Lê îro roj roja namûsêye, barê namûsê barekî girane.
Paşa here dîwanxane xwe rûne wekî tu Paşa. Evdo wê bi hawara Milan ve, belê ji bo rizgariya namûsa Milan re ji bo te bişîne herdû lawên xwe Derwêş û Sehdûnê xwedanê guliyan e. Heger Xwedê neke, namûsa kurdan bikeve bin lingên Gêsan û Turkan, saxî û silanetiya Evdo û kurê wî Derwêş siwarê Hedban ji bo çi ye!!..

****

Derwêş û Sehdûn hatibûn ji nêçîra xezalan.

Karê egîd û siwaran di dema ku ceng û şer tunebin, nêçêr bû.

Evdî jî sebir nekirbû bi gihandine herdu lawên wî ji nêçîrê, hatina Paşa û mebesta wî ji Derwêş û Sehdûn re gotibû. Belê Evdî li vê yekê ne sekinîbû Ceng û şer, belê rizgariya Milan danîbû ser milên wan, kirbû kardariya lawên xwe.
Derwêş û sehdûn berê xwe dabûn konên Milan. Silav li civata Milan kirbûn, lê egîd û girgirekên Milan bi serê lêvan silava lawên Evdî vegerandibûn. Paşa silav Derwêş û sehdûn vegrandibû û gotibû:
- Derwêş birazî were li kêleka apê xwe ser

doşekan rûne.

-Paşa!.. Cihê me malên Şerqiyan di civata Milan de nav pêlava ya. Cihê bavê min Evdo hawirî devihane, axurî hespane. Hûn mala Paşê, maleke bêbextin,telaq reş in, dema tirs ji ser we rabe hûn qedir nadin egîd û mêran, Paşa ma nayê bîra te ?!... Dema ez û tu çubûn nêçîra karên xezalan ji ber ma rabûbûn du xezal, li beriyê min kuştibûn herdû xezal, wê demê li me derketibûn dused siwar, te gote min;

" Derwêş birazî em ji xwe re bazdin,xwe xelaskin ji destê van siwaran."

Tê bîra te bersiva lawê Evdî!
" Ji siwarê hedban re şerma ku paşayê Milan bazdê." Min ling kiribû rikêbên Hedban êrîş dabû siwaran, siwar ji ber kekê Sehdûn ji hevbelav bûbûn, qîz û esmer derketibûn pêşiya Hedban û gotbûn:

" Kul û kesere dilê me siwarê Hedban e."

Dema em gihîştin malê, di mecilsa Milan de ji te hate pirsîn, li ser mêranî û egîdiya кurê Evdî te gotibû:

- Kurê Evdî,xwarzê Elî Gor!!... Lawikî Êzîdî qîmetê xwe du qirûş û nîvin. Te nogt; aferim Derwêş birazî! Egîdekî kurdan e.
Lê paşa dîsa jî bêjim; saxiya siwarî Hedban, lawikî Êzidî, egîdê Şerqiyan ji bo çiye!? ku namûsa kurdan bibe lîstika pêxaws û qaçaxçiyan. Wê demê mirin ji bo min serfirazî û azadiye. Ez îro hatima vexuim fincana qehawê hilgirim barê cenga Turkan û Gêsan. Paşa bizane ku heye siwarê Hedban, lawikî Êzîdî saxbe li vê diniyayê kesek nikare êrîşê bibe ser Milan yan qal û behisa namûsa kurdan bête kirin.

Çav li Paşê sor bûbûn wekî perngî daran, dil û hinav keliyan!..Wekî sêla sorbûyî li ser dîstan. Rahiştibû kopal ketibû nav meclisa Milan. Di meclisa Milan de rabûbû ser qametî lingan, bûbû virta-virt kolosên girgrekên Milan, di bin çîtê kon de tev revîne. Her yekî ji bin konê Paşê bazdide, di cihê xwe de hiştibûn kurk,şûr û mertal, kesek di bin kon de nemabû,ji bilî Paşa û Derwêş, Çîlo, Sehdûn û Mele Xelîl e.

Bi gihîştina Derwêş li bin konê Milan, xeber gihabû Edûla Paşê qîzika evîndar.

Qîzên Milan jî li Edûlê kom bûbûn, qîzik ketibûn wesif û pesnê egîdan, her yekê ji wan qîzan

siwarê xwe, yarê xwe, egîd û mêrxas şervan û siwar diyar dikir, lê Edûlê bersiva qîzan weha dabû:

-A, niha hûnê bizanin kî egîde...Kî mêrxasa... Kî wê hilgire barê cenga Turkan û Gêsan e...??!!
Paşa dîsa gazî mecilsa Milan kirbû û ji wan re gotibû:
-Yê ku hilgire barê cenga Gêsan û Turkan ezê bidimê qîza xwe Edûl!...,Ezê bidimê mal û milkan, boşê devihan û keriyên mihan.

Edûl bi xwe şêwîbû û gihabû biriyarê ku here li himberî Derwêş bike çend axaftinan, belkî Derwêş ji biriyar xwe vegere û neçe cenga dijiminan, ew bi xwe re gihabû wê bawriyê ku heçî her cengê bi saxî vegere wî tune .
Edûl li himberî mecilsa bavê xwe rawestiya û gazî girgirek û egîdên Milan kirbû û gotibû:
- Milan o!... Milan o!... Bila dengê min bête we tevan. Ma qeyî mêr û egîd di nav we de nemane ku hûn dixwazin Derwêşê Evdî, lawikî Êzîdî yê ku hûn tev di dilê xwe de wekî dijminekî wî dibînin, lê pir başa ku hûn ji wî jî pir ditirsin. Hûn dixwazin wî bişînin cenga Ereban û Turkan. Ez baş dizanim ku hûn dixwazin wî bişînin cê cenga han, ji bo xatirê bi saxî venegere li Evdiyê Mulhim û Eyşa Welêt, belê hûn wî dişînin ji bo

xatirê ku sax venegere li Edûla Paşayê Milan.
Gelî Milano!... qeyî mirin ketiye navbera goşt û neyînokê!? Ev fincana qehwê li ser zilfa zêrîn bûye golorekî maran!... Vî marî zimanê xwe derxistiye bostekê û çar tiliyan. Kesê ku destê xwe bavêje fincana qehwê, heftîk ji emrê wî maye!...

Bê dengiyê konê xwe li ser civata malan danîbû. Derwêş jî wekî şêrekî bi zinciran girêdayî, ji cihê xwe rabû ser piyan,zincîr bi çend xelkan qetandibû, bi dengê xwe yê bilind ku gazî qehwaçî kirbû û gotibû:
- Qehweçî!... Tu ji min re dagire, qehwakê duduwane.

Qheweçî bi emrê xwe zaroka, lê lawikekî bi aqil û zîreke, dizanî bi qedrê egîd û mêrxasan. Qehwaçî qehwa danîbû ser kûçikî arî kelandibû qehwak wekî aravê çekane. Danîbû ser zilfa zêrîn dîsa gerandibû li civata Milan, gerandibû li egîd û girgirekên Milan. Tu temaşeke li vê civatê!! Tevan serê xwe berdane ber xwe wekî jinanan. Di civatê de hene egîd hene girgirek, hene nefs mezin û ba bilind, tev filan ibn filan in, malxweyê malane, xwedanê mal û milkane, beg in Şêx in, mezinên eşîr û bavikane.

Sê caran qehwaçî di ber civata Milan re çûbû û

hatibû vî serî û wî serî civatê, kesekî ji civata Milan ceger nekir, mêranî û ceger di kesekî de negeriye!...
Pozê axayekî, egîdekî, ku navê egîdiye êlê li ser xwe danîbû, pozê kesekî ji Milan neşewitî û negotbû;
«Namûsa kurdan wê li ber lingê hespên Turk û Gêsan pête perçiqandin!?,»

Derwêş wekî teyerkî baz destê xwe avêtibû fincana qehwê,higirtibû barê şer û cenga Gêsan û Turkan. Derwêş fincane qehwê bi ser xwe dagirbû û deng li civatê kirbû û gotibû:

-Paşa ezê hilgirim barê hezar û hefsed siwarên Milan,herim cenga Gêsan û Turkan. Paşa bizane heye siwarê Hedban li vê diniyayê bijît, kesek nikare êrîşê bibe ser eşîrên kurdan. Her dem gerekî namûs û şerefa begê kurdan bavê Edûla çilgûlî ser bilind be namûs û şerfea Paşê Milan, namûsa me teva ne. Lê paşa! heger ez hatima kuştin tê bidê diya min Eyşa Welêt keriyekî miyan ji bo doşanê.
Lê bêjim ji bo şer û cengê! Paşa tê bide min Sehdûn ê bira xwedanê guliyan,xelefa Evdê Mulhim. Paşa Tê bide min Çiloyê Hîzolî, mehkumê destê xwediyan, qatilê çend mêran e... Seba xatirê her pênc xwîşkên xwe ji welatê Hîzola

firar bûye, xwe hêsîr avêtiye bextê paşayê kurdan, eşîra Milan, seba xatirê her Pênc xwîşkan him şivane, him gavane, him serwane.
T'ê bide min, herdu lawên Ferhê Dolikî.
T'ê bide min,herdu pismamên min lawên Usiv yek Emer û yek Bozan e.
Edûlê xwe gihandibû Derwêş seba ku ji wî bike reca û minetan,ta ku Çîlo bi xwe re nebe vî şerê giran. Xwîşka Çîlo Îslam jî rica ji Edûlê kirbû ku ew jî bike reca ji evîndarê xwe ji bo xatirê birayê wan yê bi tenê nere vî şerî, lewma jî Edûlê serê xwe danîbû ser çoka siwarê hedban û gotibû:
-Derwêş were bîstekê bi Edûla xwe re bike henek û laqirdiyan, devê xwe têxe bin guharên heyderî, gerdene gewir nav morî û mircanan. Ez bi xwedê kim çuna te heye vegera te li Edûla te tune. Lo Derwêşo were miraza min bi cî bîne, êdî bile yezdanê pak me bighîne hev du di bin axe sar de li wî zehmanê Êzîdxanê li qerexe çiyayê Şingalê.

Berî ji delalê xwe bixwazim xatiran, hêvî dikim ku Çilo bi xwere nebe şerê Turkan û Gêsan.
- Edûl bizane ku cenga han, cengekek zor girane, baweriya min jî ewe ku careke din ez Edûla Milan nabîn im. Lê Edûl barê namûsê barekî girane, heger xwedê neke ku namûsa Milan bikeve destê Turkan û gêsan jiyane Derwêşê te, li vê diniyayê ji bo çiye !?... Evîna min û te gerekî bi serbilindî

bijît. Evîn heger ne ser bilind be, ne evîne, xwedanê wê evînê ne hêjane ku bijîn, belê nehêjane ku navê evîndaran li ser xwe dayînin !!....

Edûl û Derwêş ketibûn henek û laqirdiyan, herdû ketibûn deriya evînê eşqe dilan, ji lizete evînê xwe ji bîr kiribûn. Serwanê devihan wan dibîne, şûrê xwe ji qalik dikşîne û êrîşê dibe ser herduwan.

- Lo lawiko ! ezê te bikujim çawa tu ceger dikî dest dirêjê bikî qîza Paşayê Milan !... Te devê xwe kiriye gewriya mor, destê xwe daniya ser taximê beran. Lawê Evdî destê xwe neke hemu qulane ! Qulin hene di wan de peyde dibin kilorê marane, ezê li vê beriyê te bikujim, malê te talan bikim, li ser Şerqiyan bikim bahuz û duwmane.

Çav li Derwêş sor bûbûn wekî perengî agirî daran, dest avêtibû şûr, lê Edûlê ew sekinand, berê xwe dabû serwanek û gotibû:
- Serwaneko! Ma tu dixwazî kuştî li mala xwe bizîvirî?! Ez vê carê ziman dirêjiya te bidim xatirê zarokên te, nahêlim Derwêş te bikuje! Bazde!... Here karê xwe .
- Derwêş!...Edûlê!... Li qisûra min negirin,min ziman dirêjayîk kir, qisura min bikin bin pêlava xwe. Hisab bikin ku min hûn nedîtine.

Edûl û Derwêş di bin bandora lezete evînê de dem ji bîr kiribûn. Ew esra-teng bû,niha jî berbange. Edûlê deng li Derwêş kirbû:
-Derwêş,dem kete berbangê,raba bejna xwe girêde,ji bo çûna cenga Gêsan û Turkan. Hêviya min ewe tu sax silametî li Edûla xwe bizîvirî, lê eger tu di vî şerî de hatî kuştin, soza min bi te û yezdan re piştî Derwêş lawê Evdî, kesek bi bejin û bala Edûla Milî dilşa û miraz nebe. Ez ji vê kêlîkê de bûka Evdê Mulhim im, piştî şehîdiye te! Mêvana axa sar im.

****

Bi gihîştina Derwêş re Sehdûn ber bi wî ve hatibû û ji wî pirs kirbû,sedemên winda bûne wî heye berbangê!?...
Derwêş jî ,ji Sehdûn re gotibû ku ew ji duh êvar de heye berbangê bi evîndare xwe Edûla Paşê re bû. Sehdûn ji axaftinên Derwêş dil teng bûbû, sedmên wan axaftinên Derwêş Sehdûn bersiv wî weha dabû:

- Derwêş bira heger ne ji tirsa min be xelk wê ji te bistînin dora aşan.
Axaftinek ji Sehdûn, yek ji derwêş, herduwan dest avêtibû şûran, bûbû,şinga-şinga şûran virta-virta pesin û wesfan. Herdu li himberî hev sekinîbûn wekî du çiyan.

Eyşa Welêt gazî Evdî kirbû ku xwe têke navbera herduwan. Evdî jî qîrek dabû lawên xwe û gotibû: «Law hûn li min bikin guhdarî, ez dixwazim ji bo herdu lawên xwe re bikim çend şoran. Heger hûn wisa mêrên û mêrxasin, bila Derwêş siwar be li Hedban, Sehdûn jî li Delo, ez jî li Qemerê diya Hedban emê xwe berdin beriya Milan binêrin kî ji me berxa kî berane ?! Xwedê mala we xerab kiriye hûn tên hev bi şûr û riman?!..Min digot belkî herdu şêrên min welatê kurdan rizgar kirine!?..Min digot belkî herdu lawên min Koma giran ya Turkan û Kêsan ji ser Milan dane alî...Lewma jî dilîzin bi şûran û riman!!...Min nizanî ku herdu lawên min dîn û har bûne!...Habîl û Qabîl in!..Dixwazin xwîne biratî birjînin. Dilê dijminan bi Şerqiyan û Milan şa bikin. Heger hûn ji pişta Evdî û ji hinavê Eyşa Welêt in, hûnê a niha rabin siwarbin herin bin konê Paşayê Milî, û dura berê xwe bidin beriya Wêranşarê cenga Gêsan û Turkan, namûsa me kurdan biparêzin ji destê dijminan.»

Di bin konê Evdî de,li hev civiyabûn nejda hawarê, Derwêş û Sehdûn, Çîlo, Emer, Bozan û herdu lawên Ferhê Dolikî, Ji Evdî diprsîn; Derfet û hîlên cengadarên Gêsan û Turkan. Evdî bi xwe por sipî kirbû di cengan de, piranî cenga bi Turkan û Gêsan re.

****

Felek dem û dewran e
diniye milkê rebil-Alemîn e
her heft tebeqê erd û ezman e
tev erdî yezdan e

Roja me hilatîye ji mala rebê- Alemê,
ji roj hilat e
şewq û şemala vê rojê xwe daye beriye,
Wêranşarê beriya bê pîvan e
diniyake pûçe,derwîne,milkê xwedan e
tiştekî me evdan têda tun e
emrê me derbas bû şêst-heftê salan e
emê herin mezelên kûr,axe goran e

Roja me ji nîvro dageriyan e
xortekî ji Milanî rahiştibû darê dûrbînê,
li ber çavê xwe daniy e
gerandî li beriya Wêranşarê,beriye Urfa,
berîya serê kaniyê bê pîvan e
carekê bala xwe dayê toz,ecacek û dûman e
xubareke sê siwaran e

Hineke digot; siwarên Şerqiyan û Dinan e
hineke digot; siwarên Kîka û Milan e
hineke digot; siwarên Gêsan û Turkan e

Hercê wan li ser milan e
ji xwedê bawer bike

her sê siwar,siwarî qantüran e
li devê deriyê konê mezin peyabûne,
konê bavê Edûlê Paşayê Milane
paşayê Zengo zêrîn,dûreke
pîst û çar eşîrên kurdan e
bendê eşîra dane

Xulam û xizmetkar bi qantürê wan ve dibeziy e
qantürî wan tewlandin li tewlxan e

bala xwe didim hersê siwaran e
hersê siwar,Erebê pî valan e
kirasê wan mînana kirasî maran e
yekî kaxezek derxistî jî berîk û cêban e

Paşa gazî kirbû Mele Xelîl:
Serokê çil û çar katiban e

Mele Xelîl ew kaxez xwendin daye
pîst û sê imza li ser wê kaxezê dane
di neqebe bîst û sê imzan de,
mohrek lê dane, bi qasî binê qazan e
bi qasî binê tawan e
Everê Gêsî û pêra
hezar û hefsed siwarên Turka¬ e
xwedê dizane cerdekî mezin e
komekî giran e
ketine qoça Çelogiyê, girê Qayîdiyê

kepezê Kîkan e

Mebesta wan ne ewe
bibin boşê devihan e
keriyê miyan e
rabotî hespan e
mebeste wan ew e
hilmê keçike xweşik,
di bin konê Milan de bihîstin e
keçikê bi darê zorê birevîn in
ecêbekî bînin serê kurdan e
heta heftê û du bavê kurdan rabin
ku neçe ji bîra wan e

Keko buhara,emê ketine miha sêya û çaran e
koç û keriyên Milaniyê ji hev qetiyan e
bi du şopan e
bi du rêzan e
şopekê xwe berdaiye biniya
bajarê Reqa,yê bi nîşan e
şopa dudwan,
xwe berdaye,sînorê Şemiran e
derkas kirine hidudê Îraqê malik wêran e

uihara; ji bilî sêsed û du kon e
li dora konê paşê neman e
hêstirê çavê bavê Edûlê diherkin mîna ne
ava çeman û kaniyan e

cerdeke mezine
komekî giran e

Paşa gazî Mele Xelîl kire
serokê çil û çar katiban e

tu meyzeke li çavê Paşê Milan e
bûne mîna gulî topan e
çirka-çirka diranên wî,
mîna ne xwerina nokan e
kî... Li himberî wî bike du gotinan e
namûsa wî dike bin lingan e
malê wî dike talan e

qelema destê Mele Xelîl diçe û tê
mîna perçak qeşa
mînanî layîlan e

Kaxezek çêkirî bi du şopan e
kaxezek şandibû,bajarê Reqa bi nîşan e
kaxeza din rêkirin,Îraqê malik wêran e

Çardeh şev,çardeh rojên van kaxezan qediyan e
ketibû şeva pasdeh-şazdehan e
Pêncsed konî,li dora konê paşê
çît û berdên xwe vedan e
bi qasî stêrkên ezman e

tev mom, fener û çirayên wane
vê sibê,dengê gum-guma misîn û qehwane
diçe ezmanî heftan e
kel û dumana qehwê
diçe herşê xwedan e

Paşê Milan gazî dike:

Milan o!... Milan o!...
Everê Gêsî û Ibrahîm ê Turko
bi herduwan re,
du hezar û hefsed siwarî Ereb û Turkan e
cerdekî mezine
komekî giran e
ketine qoça Çelogiyê
girê qayîdiyan
kepezê Kîkan e
ji me dixwazin
qaqebû – şerî kewan e
şerî kurî bavan e

Edûlê rahişte zilfa zêrin, tijîkirî fincana qehwê
danî ser zilfa zêrin, kete milê diwanê

gazî dike:
Milan o!... Milano!...
ev ne dawete ne dîlan e
ne kirîvaniya me û Gêsan e

ne xwarina kulmê birincê
xwarina dûvê hilkan û berxan e
ev şerekî mezin e
komekî giran e
cerdekî mal wêran e
kesê ji bavê min re bîne elumê vê cerde han e
bavê min wê bide wan e
boşê devihan,rapotê hespan e
hezar miyê qerreş wê ji wan re bike doşan e
konekî mezin ji wan re vedê li kêleke Paşê Milan e
bi ser vî malê han de
wê min ji wan re bike bermaliya konê wane

Tu bala bide vî Milanî, poz kutane
serî berdaye ber xwe wekî jinan e
simbêlên wan şorbûne ser lêvan e
xwe berdane bi ser qelûnê kareban e
bostekî û çar tiliyan,ax li ber xwe kolan e

Milan li dîwanxane paşê rûnştîne
bi sê rêzan û çar rêzan e
hemu filan ibn filan e
xwediyê niviştan e
xwediyê gundan e
siwarî kihêlan e
mixtarî odan e maqûlî malan e
Sê şev û sê rojî Edûlê qediyan e

li oda paşayê Milan e
fincana qehwê diçe vî milî, wî milî diwanê
li fincanê pêçaya, kilorekî maran e
vî marî zimanê xwe derxistiye
bostekê û çar tiliyan e
kesê dest bavêje fincanê
çarîk wext jî emrê wî namîn e

****

Felek dem û dewranek î xwedan e
Edûl dîsa gazî dike:

Milao!... Milano!...
Milano!...min hûn li mezelê xerîbe veşartîn o
ev ne dawet e, ne dîlan e
nexwarina dûvê hilkan û berxan e
ev şerekî mezina,komekî giran e
ez bala xwe didim we Milan e
guhê we dirêj bûne
wekî guhê kerê Germuşiyan e
we serê xwe berdaye ber xwe
wekî pepok û sêwiyan e
kesek ji we nikare ji bavê min re
bûne ilm û cewaba vê cerda girane

Êdî Edûla gelekî bênteng bûbû û berê xwe dabû bavê xwe û gotibû:

Lo bavo dilê min liyan e
felekê dem û dewran e
hûn qedirê mêran qet nizan in
roja hûn di tengayê kev in
Derwêşê Evdî şêrekî bi nîşan e
xiyalî hespane
ji pişta Eyşa Welêt qetiyan e
şêrê şer û cengan e

Roja hûn di ferehiyê kev in
hûn qedrê wî nizan in

Ez çiqasî bala xwe didim paşayê Milan e
malake xayîn in telaq reş in
bê dîn in,bê wijdan in

Bavo rabe kaxezê bişîne
Çemê Circib û Zergan ê
heger şêrê kurdan,lawikî Êzîdxanê
ji me re neyne ilmê cerda giran e
kesek nikare ji Milan,ji paşê re
bîne ilumê cerd û koma giran e

Keko!... Çavê paşê sor bûne, mîna gulî topane
çirka-çirka diranin wî,mina xwarina nokan e
sê dengan gazî kirbû,Mele Xelîl
serokê çil û çar katibane
qelema destê Mele Xelîl

mînaya perçak qeşa,mînaya laylan e
mektubek bi defa hawarê re şandibûn
bin konê Evdî,bavê Derwêş,axayê Şerqiyan e

Berî mektub bighe bin konên Dinan,ba Evdî yê Mulhim Eyşê gazî Evdî kirbû û gotibû:

Evdo rabe em herin milê diwanê
herdu şêrên me li hev dikin zirtan û fûtane

li milê diwanxanê Derwêş û Sehdûn li hev aliyan e

rabe em herin dîwanê li herdu şêran
bikin seyaran û temaşan e
herdu axtiyar çûne dîwanxanê

Derwêş got:

Sehdûn keko tu li himberî min dikî şoran e
tu hîn berxikî nebûyî beran e
ez ê rimekî li qulincê texim,
movikî şehrkirî,dunzdeh qeytan e
mala Evdo xerab bikim
ocaxa wî kor bikim
warê wî bikim wêran e

Hîn herduwan bi zirt û fotan didane ber hev, dengê defa hawarê li hewşê hate kutan.

Sehdûn:

Derwêş keko ev çi dewata, çi dîlan e

Derwêş:

Sehdûn o keko tiştê te dur dixwest, jî te re hate ber lingan.
Keko ev ne dawete û ne jî dîlane,
ev defa hawarê,defa şer û cenga girane.
Li Milan siwar buye du hezar û hefsed siwarî
Gêsan û Turkan e.

Keko; Turk û Gêsan bi du hezar û hefsed siwaran e
ketine qûça Çelogiyê kepezê Kîkan e
jî Milan dixwazin,qeb-qebî kewan e
şerî mêr û egîdan e
mebesta wan ne boşî devihan û rebotî hespane
mebesta wan ewe,namûsa kurdan
bidin ber lingan e
ev defa hawarê şandin
ez û tu herin bi hawara Milan e

Evdî digot:

Lawo Derwêş dilê min liyan e
îsa pênc salên me qediyan e

ketine sala şeşan e
hisabê me û paşê bi hevre qediyane
oxlim! Namûsa wan bixwe serê wan
wan û bavî wane
bixwedê heye şivanekî Milan hebe
ew qîzên xwe nadin me Şerqiyan e
te sebe qîza Milan, aqilî xwe berdan e
tê berê xwe bidî heleketeke girane

Kurê mino!... Tu çûyî Lalişa nûranî
te pirsa xwe kirbû, ji Babê Şêx Axtiyarê Mergihê
ji tere destûr nedan e

Kurê min o!...
namûsa wan bixwe serê wan û bavê wane
bawer bike,berî sî û pênc salan e
Paşê Milan soza xwîşka xwe
Rehma çav belek bi min re dabû
Paşa bi min re,xerab kirbû
qerar, peyman û sozî mêran e
kurê min!...
îşê me tune bi şer û cenga giran e

Eyşa Welê xwe avêtibû navbera Evdî û kurê xwe Derwêş

Derwêş law dilê min liyan e
bala xwe ji bavê xwe veke

bavê te axtiyar bûye,aqilî xwe berday e
sewdan di serî axtiyar de qet nemay e

pêwîsta tu herî desturê bixwazî ji Pîr ê Adiyan e
tu û birayê te, û herçar pismamên xwe
pêwîsta hûn êrîş bikin ser cerd û koma giran e
heger derbên we ji pişt ve bin
bila kuçik,goştê we bixwin li çolan e
hûn ji hinavê min û Evdî,ne qetiyan e

kurê min!...
dema ez keçik bûm, li mala bavê xwe bûm
xwedê şahid bê, şad-nişûdê diya te hene
li ber teşte çekan,min du xenzîr kuştin
bi şonik, li ber teştî çekan e

Keko Derwêşê Evdî rabûbû ser piyane
deng kirbû li Sehdûnê biran e
deng kirbû li herdu pismamên xwe Emer û Boxane
bîst û pênc keçikên Dina û Şerqiyan e
esmer ,bisk bitêl,rahiştine rişma Hedban e
guliyên sor dan ber meqesan e
avêtibû erdê,ber lingê Hedban e

****

Edûlê digot:

Bavo te xeber şandiya ji bo şêrê kurdan e
ez dîsa dibêjim; mala Paşê malek xayîn in
bêbextin, telaq reş in
heger nête bîra te, bavo bînim bir te
wê roja han e
tu û xelefa Evdî,yê Mulhim,ji hinavê
Eyşa Welêt, şêrê kurdan
Siwarî Hedban e
we berê xwe dabû bajarî Urfayê bi nîşan e
ji bo bikirin xemlî bûkan e
li vegerê li we derketibûn,dused û pêncî
siwarî Tukan û Gêsan e
te gotibû Derwêş:
law em birevin
hespê me kihêlin
gulî soran
bi şêrê mehregiyan avdan e
Derwêş li te vegrandibû û gotibû
bazdan ji navê paşayê kurdan re şerme
heger em bazdin,kesek li gundê xwe
me nake şivan û gavan e
paşa tu li vir,bisekine
ji min re bibe mabûd û sekan e
tu kom bike,çenta û heqîbê wan e
îşê te tun e, bi şerê min û wan e

Derwêş ketibû li du siwaran e
siwar şikandibûn bi du şopan e
şopek xistibû Germûşiyê gundê Filan e
şopa duduwan;
ajotibû bajarê Urfayê bi nûşane
zerî û esmeran
serê xwe derxistin
ji pişt berdan û penceran e
gotibûn:
kul û kedera dilê me
ev siwarî han e
Derwêş rast hatibû li midurî hebsê
û sê qirdiyan e
Derwêş qera nêrdewan kişandibû ji kalan e
jê kirbû,serê midur û hersê qirdiyan e
pênsed kurî bavan ji hebsê berdan e
li zarok û malên hebisçiyan
Kirbû, dawet, şahî û qurban e

Dema hûn zîvirîbûn warê Milan e
ji te pirsîbûn;
mêraniya kurê Evdo çawane ?!
te di civata Milan de gotibû:
Êzîdîkî bi du qirûş û nîvan e
ne yê cerd û komên giran e

****

Keko pênc siwar derketibûn jî bin konê

Şerqîyan e

Derwêş, Sehdûn û hersê pismamên wan e

berê xwe dabûn konî Milan e

lî tenşta kon,Sehdûn silav dabû ce`amatî Milane

kesekî silav Sehdûn vengerdî ser seran û çavan e

Sehdûn berê xwe dabû derwêş û bi hêrz jêre gotibû:

Derwêşo!.... Seba qîza Milan e

te aqilî xwe berdan e

mal xerabo! Merovê silava venegerîn e

ser seran û ser çavan e

namûsa wan bixwe serî wan e

serî wan û bavî wan e

Derwêş:

Sehdûn keko tu lî soza bin konê Evdî de dayî bûyî poşman e ?!

Sehdûn keko ezê herim silavekê bidim Milan e

heger paşa jî ber kekê te ranbe ser lingan e

ezê serê girgirekên Milan bidim ber devê şûran e

bi soza biratîyê ezê konê milan bidim ber şûran û rîman e

ezê bikim salekê teyr û turê çolê

xelas nekin kelaşê mêrên Milan e

Derwêş berê xwe daye konê Milan e
silav dabû Paşê û ce'amatî Milan e
Paşa rabûbû ser piyan û ser lingan e
go Derwêş law were ser doşekan e
rûne li kêleke apê xwe, ser yazîxan e
Derwêş dibêje;
Paşa her yek ji me cihê xwe dizan e
di bin konê bavê min de
balîvê bavê min Evdo hawidî devihan e

Roja hûn di tengayîyê kevin, ez Derwêşê Evdî
me,kekê Sehdûn şêrê bi nav û nîşan im.
Lê dema hûn di ferehiyê kevin, em Êzîdîne temenê
me du qerûş û nîvin. Em ne yê şer û cerd û komên
giranin!!...

Xumîn kete dîwaxana Milane
mîrek rûnştine bi sê-çar sefan û rêzane
hemu filan kurê filane
maqulî malane
xwediyê kaxz,ben û nivîştane

Edûlê careke din rahiştibû sifriya Zêrîn,
li ser danîbû fincana qehwê û ketibû milê
dîwanxanê.
Li fincanê geriyayî gilorekî mai ıne
kesê dest bavêje fincana qehwê, carîk wext di
emrê wî kesî namîne.

Ji çûn û hatina milê dîwanxanê, lingên Edûl
werimîbûn wekî hebane.

Edûl mendhoş bûbû û berê xwe dabû bavê xwe û got:

Milano... Milano!!...
min hûn li mezelê xerîbe bi destê xwe veşartin o
ev ne daweta ne dîlane
ev ne kirivaniya me û Gêsane
ne xwrina kulmê birincê,dûvê hilkan e
ev cedeke mezine, komeke girane
kesê ji bavê min re bîne
ilm û ulumê koma girane
bavê min wê bidiyê
boşê devihan e,keriyê miyan e
konekî mezin,çardeh stûnî ji wan re vede
bi ser de Edûla paşê ji wî re bike
bermaliya konê giran e

Keko vî Milanî poz kutan e
yek sipartî duduwan û sisiyan e
wekî jinan bostekî û çar tiliyan
erd li ber xwe de kolan e

Derwêş rabûbû ser lingan e
dest avêtibû fincana qehwan ê
edeta mala bavê min;

vedïxin fincanekî duduwan e
vedïxuin fincana jehrî maran e
Edûlê; ez ïm jï bavê te re bîn ïm
ilumê vê cerd û koma giran e
paşa wê bide dïya min Eyşa Welêt
hezar miyê qirqaş jï bo doşan ê
wê bide min Edûla paşê xwedane guliyan e

Çavê Paşê Milan, sor bûne wekî gulê topane
dest avêtbû şonikî ketibû nav Milan e
mîrek tev dabû ber şonikan e
dï bïn kon ê paşê Milan e
bûbû şeva reş,tuz û dûman e
mîrekek dï bïn kon de neman e
heftê û pênc,kurik û hewranîyê
mîrekan bê xwedî dï bïn kon de man e
dîwan bûbû,mazata kurik û hewraniyaiyn e

Edûlê got:
Derwêş li himberî bavê min neke van
şoran e
li wangotinên xwe tu bibe poşman e

Derwêş:
Edûlê!.... Gotinên min ne yê jïnan e
tu here bejïna xwe bide ber toqan û beniyan e
bila dï guhê min keve,xûşîne xilal û doberan e

ez im ji bavê te re tîne ilmê agderiyên
cerd û koma giran e

Edûlê:
Derwêşo! Derwêşekî minî pakî
berxkî sê mehî berû makî
qurban heger tu derwan nakî !?
bêje; tê kî ji Milan bi xwe re rakî ?

Ez kesekî ji Milan bi xwe re rankim
Ji bilî herdu lawên Ferho yek Usiv û Bozan e
Kekê xwe Sehdûn xwedanê guliyan e
Herdu lawên Emrê Şerqî ji pismaman e

Ferho ku ya star rrr
ev serê sê rojane
rehla herdu kurên min ser terziyan e
min ji wan re xwestine
du keçikên me Kîkan e

Dema ku Derwêş navê egîdên ku bi xwe re bibe gotibû, Çiloyê Hîzolî jî li wir bû,lê Derwêş navê wî negotibû.
Çîlo berê xwe dabû Derwêş û gotibû:

-Derwêş !... Keko ma tu û birayê xwe tenê mêrin ?!....
Ma tu me mêr hisab nakê !?....Ma qayî em ne

mêrin ?

Tu rabe siwar be li Hedban e
Bila birayê te jî li qemer e
Ez jî siwar bim li saglawî
Xwe ji min re berdin meydane mêran e
Min heft mîrek kuştine li Adî-yaman ê
tu birayê xwe jî bibin yê heştan û nehan e

Tiq-tiq Derwêş keniyane
lawo Çilo, şeş sal berê ez û tu dest biran e
tu xwînî li ba Paşê Milan e
tu serok û mezinê pênc xwîşkan e
emê herin rêya çûn û nehatiniy e
heger tu were kuştin, Milan bê bextin
telaq reşin, bê îman in
wê naqûşkan li ser ava kaniyan
li tenştina xwîşkên te xin
xwîşkên te wê bimînin bê xwedî û xwedan e
keko veger me tune li xwediyan e
tu bimîne nav her pênc xwîşkan e

Derwêş ji Çîlo nekir rayî û îmkan e

Derwêş siwar bûbû tevî Sehdûnê biran e
Herdu kurê Emrê Şerqî, pismamên wan e
Apê wan Şiwêş, ewjî ji Eyşa Welêt

Bihîstibû Xebera hane,
ketibû peyî şopa Hedban e
Herdu lawên Ferhê û Çiloyê Hîzolî birayê
Pênc xwîşkan e

****

Heşt siwar,siwarbûbûn li kihêlan,derketibûn ji hewrî Milan,(warî Milan) xwe berdane erdê beriyê, qut kiribûn qelaçan, Pişta wan koz bûye ser piştî hespan. Heft roj û heft şevî wan qediyane, zadê cot neketiye zikî wan û hespî wane. Zimanê wan ji tîne û birçîn e dirêj bûbû çar tiliyane bi hisreta aveke kaniyan, razane wan ser qerpozî hespane.

Heft roj û heft şevên Derwêş û hevalên wî qediyan, navbera her yekî ji wan her dem berekî cotan, vexwarina wan xwêdane bin pêlêkê guhane. Di bin wan de reş bûye pişta hespan wekî qeytan. Xewa şevan neketiye çavê wan. Nanê zewêda nektibû zikê wan û hespê wan e.

Çîlo gazî Derwêş kirbû û gotibû :

- Lawê Evdî !... Te sebe qîza Milan aqilê xwe winda kiriye, law ev heft roj û heft şevên me

qediyan ketin roja heştan e, neketiye zikê me û van heywanan berê cotan, neketiye çavê me xewa şevan û.....

Derwêş axaftina Çilo birîbû û bersiv weha dabû :

- Ez dizan im hûn ne yê şer û cengên giran in, we bêriya himbêza jinên xwe kiriye!?...

- Law Derwêş!... Ma nayê bîra te? Ez û tu di civata Milan de hatin hev bi şûran, heger mêvanan ji min nekirine rica minê tu bikujte, law me tu tenê mêrî !? Were em hev biceribînin li vê çola hanê, emê bibînin kî ji me mêra... Kî egîde??...

Sehdûn xwe avêtibû nave axaftinê û weha ji wan re gotibû :

- Birano ! hûn herdu mêraniya xwe bihêlin heye ku em dighin kom û cerda giran. Bawer bikin ku Everê Gêsî a niha li benda we bênteng bûye, ew tevî duhezar û pêncsed siwarên Ereb û Turkan ve bendewarî weye. Şerma ji egîd û fêrsên kurdan li himberî hev bi şûran diaxivin, dilê dijminan bi me şa dikin. Birano!...Her dem ev serhişkî karê kurdane!... Bira, birayê xwe dikije û dijminên xwe ji kuştina birayê xwe rehat dike û dilê wî şa dike.

Herduwan li Sehdûn nerîbûn û herduwan hev û du himbêz kribûn û çavê hev ramusîn.

Derwêş berê xwe dabû Sehdûn û gotibû:

- Sehdûno birao bizane ku Çîloyê Hîzolê birayê min e,birakî gelekî li ber dilê birayê xwe Derwêş şêrîne.
Birano hûn westiyan, qasekê bikevin xewê, paşê emê riya xwe dom bikin

Koma siwarên hawarê yên kurdan, serê xwe kiribûn bin kurkan, Derwêş jî nobaçî mabû hilkişiya ser kopekî û dûrbîn li ber çavê xwe danîbû, berî kin û ferh,dûr û dirêj kontirol kirbû.

Dîsa siwarên me ketibûn riya çûnê, di rê de şivanekî dîtibûn, ji şivan ilm û ilumên koma Gêsan û Turkan pirsîbûn. Şivan jî qasekê li bejin û bala siwarên kurdan temaşa kirbû û gotibû:
- Kurê Evdî!.. Ev heft roj in ez ji bo xatirê te bûme şivan. Gelek silavê Everê Gêsî li te hene û gotiye; şer girane, kom mezine tu bi şeş-heft siwaran nikarî şer bi Gêsan û Turkan re bikî, veger mala xwe, bawer bike ku Paşayê Milan tu şandiye vê cerda giran ji bo ku tu bêyî kuştin.

Derwêş û hevalên xwe qîmet nedabûn axaftinên

şivan û rêya xwe domandin.

Koma siwarên kurdan raste-rast bi ser koma Gêsan û Turkan ve hilatibûn. Derwêş deng li hevalan kiribû û gotibû:
- Biran hûn xwarinekê ji mere hazir bikin, heye ez herim nav koma dijminan belkî ji bo we bîn im agehdariyekê,ta em bizanin çawa dayînin tedibîr û şêwran,em çawa bikin bi vê cenga mal wêran.

Derwêş xwe berdabû nav konan, li ber tenûrê du jin dîtibûn û ji wan pirsîbû ku çend devhên wî winda bûn, gelo wan tu agehdarî li ser devihên windabûyî tune !?

Yekê ji wan bersiva Derwêş dabû û got:

- Xorto!... Ma tu ji bavê xwe fedî nakî, ji jinan pirsa dikî ? Ha wê haye konê Ever bavê Osman mezinê Gêsan ku ala şer û cengê li ser konê mezin bilind kiriye. Here pirsa xwe ji wî bike.
Derwêş bê deng berê Hedban dabû konê mezin ku li ser heştê dîrekî vedaye. Di bin kon de kalekî emrê wî li dora heftê salî. Kalamêr ber bi Derwêş ve hatibû,rişma Hedban girtibû û gotibû:
- Siwaro... were peyabe!!... Qehwakê bi apê xwe re vexwe,qehwa serê sibê aqil dide bîlmez û cahilan.

- Apo, ez dixwazim ji te bikim çend pirsan e. Gelo qîzên şêxê we reviyane!?... Ez nizan im ne yekî ezîz li ber dilê we miriye!?... Jinên we xemila xwe di bin reşê de winda kirine, tu bi xwe kalekî emrê te ketiye dora heftê salî te bejina xwe xemilandiye di bin zelxê cengan e, tu ji min re nabêjî; ev koma giran ya şervanan ji bo çi ye ?
- Lo siwaro!... Ez nizanin îşê te çi ye? Tu digerî li van doran e.

- Apo... îro heft roj û heft şevên min qediyane, heft devihên min terqiyane, nizan im ne bahoz havînê ye vê beriyê ew birine ezmanî heftan!... Ez nizan im ne ku bûne berf xwe berdan e qulî mişkane!... min winda kiriye rê û şopa wan devihan.

- Siwaro! Lo siwaro,ez sûnd dixwim bi Quranî ezîm heger Derwêş Evdî hebe li vê diniyayê, tu Derwêşê Evdî yê Mulhim, î. Lawu binêr li siwaran, du hezar û hefsed siwarî Gêsan û Turkan, Badu û Cibiran. Law kom mezin e cerd girane, heger tu bibî baran tu nikarî tevan şil bikî Ya duwamîn, em tev musliman in û tu Êzîdî, xwe ji navbera me bide alî.
- Apo raste hûn tev muslman in û ez jî Êzîdî me,lê bizane ku Milan jî kurd in, miletê me ne, parastine namûsa kurdan ji egîdên wan tê xwestin. Ez jî

egîdekî kurd im, yan bêjim egîdekî Milan im. Apo bizane heya Derwêşê Evdî saxbe li vê diniyayê kesek nikare cerda derxe li ser Milan. Dîsa ji apê xwe re bêjim; hûn Turk û Gêsan çima hûn ji warê me dernakevin narin welatê xwe!? Bizane ku heya hûn warê me diçêrîn in,ne kurd û ne hûn rehetîyê dibîn in.
Derwêş zîvirîbû ba hevalan.
Koma Milan xwe berdabû hola şer û cengê. Şer domkiribû heya danê êvarî, çarsed siwar ji Turkan û Gêsan hatibûn kuştin. Ji aliyê Milan jî herdu lawên Ferhê Dolikî hatibûn kuştin.

Piştî du seatan rawestandin, şer dîsa wekî germa beriya Wêranşar ê germ bûbû. Şer domkiribû heya reş ketibû erdê. Rê û rêbar li pal konan û li hola şer ji kuştiyan nemabû. Ji aliyê Milan jî Sehdûn û pismamen xwe Emer û Bozan hatibûn kuştin.
Roja din ji sibê de şer germ bûbû. Berî nîvro şer rawestanek dabû siwaran, kuştî û birîndar ne dihatin hijmarê. Çîloyê Hîzolî jî hatibû kuştin.

Derwêş cinazê hevalên xwe li kêleka hev de razandibû. Herdu guliyê Sehdûn jî bi kêleka qemerê ve şidandibûn û berê qemerê dabû nav konên Şerqiyan. giyanê Sehdûnê bira diyarî ji kalê Evdî û Eyşa Welêt re şandibû.

Emê Derwêş di şer û ceng Turkan û Gêsan de bihêlin û berê xwe bidin bin konên Şerqiyan.....

***

Heft roj û heft şev, ketibû roja heştan û ya nehane ku çavê Evdî û Eyşa Welêt xewa şevan nedîtine û ne jî nanê zewade neketiye nav hinavê wan.
Çavê wan beloq bûne li beriyê li bende, gaziyekê!... Mizgînekê!... Siwarekî yan şîhîne hespekî!....
Li dora nîvê şevê bû,dengê şîhîne maka Hedban ketibû guhê Eyşê Welêt. Eyşê deng li Evdî kiribû û gotibû:

Evdo bê olo dilê min liyan e
tu rabe ser qametî lingan e
hisabê min;
tê dengê şîhîna maka Hedban e

Evdê Mulhim emrê wî ketiye heftê û pênc salan e
Kalamêr bûye,qewta şer û cengan lê nemaye
Eyşa Welêt jî ketiye heftê du salan e
Çavekî wê kore,yekî bi dûman e

Evdo rabûbû ser qametî lingan e
sekinîbû li kêleka maka Hedban e

destê xwe gerandibû li kêkekî maka Hedban e
dîtibû pêve daleqandîne gulên Sehdûnê bê miraz
xudanê guliyan e

Gazî Eyşê kiribû û gotibû:
Eyşê mizgîne min li te be
bi maka hedban e daliqiyane
guliyê Sehdûn berxê bûye beran e

Eyşê:
Evdo dilê min liyan e
hisabê min awldên min ne qelsin
pişta xwe nadin dijminan e
tu destê xwe bigerîne li qurika maka Hedban e
heger birînin wî ji paş ve bin niha xwînê
xwe avêtiye ser guliyên maka Hedban e
heger ji paş ve be
xwînê xwe avêtiye qurika maka Hedban e
niha xwîn bûye qire reş û qetran e

Evdo wê demê destê xwe gerandibû li quika hespê,berê xwe dabû Eyşa welêt û got:

Eyşê mizgîniya min li ba te b e
awladê me,pişta xwe nedaye dijminan e

Eyşê dest dabû ber dev û lêvan e
çend dengan lîlandibû,ji bo egîdê Şerqiyan e

bûbû,him-him û lorandine Eyşa Welêt e

***

Sehdûn lawo dilê min liyan e
beriya Wêranşarê beriya mêran e
tu bi egîdê kurdan re çûyê cenga giran e
te birayê xwe hiştiye di nav destê dijminan e
dijminên we bêbextin, nakin qîmet jibo egîdan e
tirsa min ewe,kekê te sax bigrin bi hîlan e
Min bizane ku kekê te jî mêranî hatiy e kuştin
dilê Eyşê wê hênik bibuye ji agirî daran e

Ez ê sibê laşê lawê xwe higirim ser milan e
ser milê bîst û çar keçikên me Şerqiyan e

****

Diniya dem û dewrane,diniya digere, di guhê me de deng û maqamên jiyanê.
Feleka mal xerab her bi ya xwe dike... Dilê wê bi kesekî naşewte. Herdu lawên Evdî bûne mêr û mêrxas,di rojekê de va xebera Sehdûnê bêmiraz hatiye ji bo Eyşa Welêt ya dil bi kul û kovan bûye.
Jiyan gelek caran kilamên xwe bi dengê kuştinê, dengê wê yê sar dixemilîne. Bila bixemelîne!.. Ma ne ji bo xatirê namûs û şerfa kurdan lawên Evdî xwe didine kuştin!?...

Roj heye û ew roj wê bê, ku navê wan wê bi egîdî û comerdî di nav eşîrên kurdan de bilav bibe. Jiyan gelek caran helbestên xwe,stran û miqamên xwe, bi xwînê dixemilîne. Dibe ku ji ber vê yekê ye merovên hêja û delal ji nişka ve,bê pirs û bê wext ji nava refên bira û pismaman, yara û hizkiriyan hildide û dibe. Kesek nizan wan bi kuda dibe!... lê dibêjin yê weka Sehdûn mêr û mêrxas cihekî teybetî li ba rebê jor heye. Lê ya ku ez dizanim felek wan ji bo kilamên xwe dike dohinê finda ronahiye xwe.

Eyşê li derê konê mezin rûnştibû, dest li kaban dide û got:

«Çavê felekê kor be, mala wê bişewite... Careke din mal li me xirabkir, derî li me dada û konê me ji nav konan bar kir. Felek her dem bi me re xayîn e, ne tenê xayîne, ew çiqasî xayîne hewqasî jî bê sebir û bê rihim û bê dil e.»

Bayê felekê bi tema xweya tûj ve careke din li ser eniya çend malên Şerqiyan yê reben melûlî danî, bi birîna xwe ve mijûl bûn. Lê carek din jî adarê xwe siparte dilê rebenên Milan. Roj ber bi buhara gulan ve xwe hildikşîne. Kurdistan her dem xwe ji bona buhareke nû amede dike. Beriya Wêranşarê birîne xwe vediroje. Zivistan jî li benda rojên

xweyên dawîne....

Careke dîn jî Evdî sêwî ma. Bi destê xwe lawê xwe hilda bir paleke rût û tazî, li ser girekî kire mezel û poşman, bi êş û jan,bi hêstir û girî,dest vala vegeriya mal.

Turk û Gês gurên xwe berdane nav keriyên me. Di dilê me de agirê mirinê dada, felekê dil û cegerên me bi agirê fermanan sot....

Careke dîn, Milan o xwe bişdînin, pêwîstiya we bi hêviyê heye?!..

Evdî,yê Mulhim bi herdu lawên xwe ve jî bo Şerqiyan û Milan re bav û bira bû. Ew dostên jar û belangazan bû, di dîwanxana Paşayê Milan de bervedêrê rêncber û belengazan bû. Ew di dilê merovên Şerqiyan û Milan de hêviyeke gerim bû. Lawê wî Derwêş jî bi mêraniya xwe warê Milan xemilandîbû.

*****

Jiyan teşiya xwe dirêse bi tilî û pêcîkên xwe yê zirav û dirêj ve. Pêvajo dişuxule lewra hinar qaqilkê xwe diqelêşe,sipîndar ber bi ezmanê şîn

ve dikudîne...
Van gotinên hanê jî ji xwe re ji hêviyê didizim. Îro tenê ev ji destê min tê. Kevan başe lê xwiyaye ku nîşandar nîşandarekî jêhatiye. Lewra derba xwe gihandiye ciyê ku dixwest.
Îro jî çerx digere. Sal û meh vedigerin û em di nava lehiya xwîn û xwêdana xwe de dizivirin. Em digerin. Em li du çerxa felekê perwende ne!..

...Em vegerin ser şervanê azadiyê!...Lawê Evdî,yê Mulhim"Derwêş"

****

Derwêş bi tenê mabû! Çavê wî sor bûbûn, dîn û har bûbû, dest birakê wî Çîloyê Hîzolî hatibû bira wî. Birînên Kekê wî Sehdûnê bê miraz dihate hiş û sewdan, melûlî û jariya Emer û Bozan di ber çavan re derbas dibû. Rehela bûkaniya herdu lawên Ferho yê Dolikî hatibûn ber çavan.Derwêş tevî wan kul û kederan xwe berdabû şer û cengê. Çep û rast lê dida. Wekî gurekî bikeve nav keriyek miyên mêş in, îro jî şer xwe gihandibû danê nîviro. Lawê Evdî gelek û gelek ji Turkan û Gêsan kuştibûn, kuştî û birîndar neyêne hijmarê. Ji duhezar û pêncsed siwarî li dora pênesd siwar

tenê mabûn, yê ku ji xwe re ji hola şer bazdabû yê ku hatibû kuştin û birîndar bûbû.
Egîdekî Gêsan siwarên Gêsan û Turkan li hev civandin û ji wan re weha got:

- Gelî egîd û fêrisan! Em bi şer û cenga şûr û riman nikarin bi Derwêşê lawê Evdî re şer bikin. Heger şer bi vê rewşê derbas bibe, ewê me tev bikuje! Heger em bi hîlakê wî nedin kuştin,bi şer û mêrxasiyê nikarin kurê Evdî. Lewma jî min hîlak peyde kiriye. Hîla min jî wehaye; Dema wî êrîş da ser me tev ji ber wî bazdin, berê wî bidine bajarê mişkan(erdê qûla mişkan). Heger em wî ji ser pişta hesp neyîn in xwarê, tu çare me di destê lawê Evdî nîne!!... Dema ku ew ji ser hesp hate xwarê gerekî tev êrîşî ser wî bikin, wê demê ez dikarim bêjim ku piranî zora hindikiyê dibe.

Dema dîsa şer dest pê kiribû, siwarên Gêsan û Turkan tev ji ber kekê Sehdûn revîyabûn. Berê siwarê Hedban dabûn bajarê mişkan. Di erdê qûla mişkan de herdu lingên Hedban di kabê de şikestibûn, Hedban tev siwarê xwe ketibû erdê.

Yanê yanê yanê
felekê dem û dewran e
diniya milkê rebil alemîn e
her heft tebeqî erd û ezmîn e

tev erdî xwedan e
diniyake poçe derwîn e
tiştekî me evdan têde nîn e

heşt siwar siwarbûn ji Milan iyê ye
berê xwe dane qûnaxe mirin ê ye
heft roj û heft şevên wan qediyan e
li ser pişta hespan e
ronî di çavê wan û hespê wan de neman e

Sehdûn got:
Derwêş keko te sebe qîza Milan aqilê serê xwe berdane
ev heft şev û heft rojî me qediyan e
xwarina me li ser pişta hespan e
qey kêlîkekê rehetiye nadê me ye
xortên Milaniyê ji me dikin yek-yekî gazinan e
Derwêş got:
kesê ku vegerê bila veger e
min sund xwariye,berê hedban bidin nav kom giran e
heger hûn bixwazin,xwarinekê çêkin li vê newala hane
firavinekê çêkin,ez hilkişim ser girî han e
ka ez nabînim qermtiyekî konan e
boşekî devihan, rabutekî hespan ?
toz û dûmanek siwarn û keriyan e
Derwêş bi serê girê Qeyîdê dikev e

dîtibû çi ecêb û tofan e
duhezar û pêncsed siwarî Gêsan û Turkan e
beyrqa şer û cengê hildan e
qîzek rûnştiye li ber teştî cilan e

Dema ku çavê qîzê li bejin û bal siwarê Hedan ketibû, ji xwe re gotibû; " Hebe tunbe ev ewe Derwêşê Evdî, evîndarê qîza paşayê Milan ."
Ku a niha wê bi hev kevin siwarî Milan û Turkan e

Hineke digot erd hejiyan e
hineke digot xum-xumî deriyan e
hineke digot rim-rima Hamzayî Pêlewan e

Derwêş gazî qîzê dike;

Lê qîzê dilê min liyan e
malê ma va danîne li vê newala hane
çend devihên me terqiyan e
li cem we tune salox û ilmê van devihan e

qîzê vegerand;

siwaro dilê min liyane
ji bavê xwe fedî nakî,ji jinan dikî pirsan e?!
here pirsa xwe bike ji kalê qirk,bavê Ever,hutê
binê beriyan e

bavê Ever şêrê bi nav û nîşane
a wê haye konê wî li pişt konan veda ye

Derwêş berê xwe dabû bin konê serokê Gêsan û got:

Apo dilê min liyan e
malê me va danîne li newala han e
çend devihên me terqiyan e
li cem we nîn e salox û ilmê devihan e

mêrikê Ereb erfnasa,gava çavê wî li bejin û bala
bi zilxê cengê girêdayî ketibû nas kiribû ku ew
lawê Evdî ye, bi beşerek xweş berê xwe dabû
Derwêş û got:

Lo siwaro dilê apê te liyan e
were li kêleke apê xwe rûne ser doşekan e
qehwakê vexwe,em bikin çend şoran e
qahwa serê sibê aqil tîne serê cahil û nezan e
ez te nasdikim,tu Derwêş î siwarî Hedban e
ji pişta Eyşa Welêt qetiyan e
şêrê kurdan,mêrekî bi nav û nîşan e
paşayê Milan tu şandiye cerda giran e
ji bo tu sax venegerî nav xwediyan e

Everê Gêsî dest birakê te yê şeş salan e
silav û kilamên wî li te hene

heger Derwêş hat,du xwîşkên min hene
herdu xwîşkên min bide wî,bila bibe nav Milan e
Bêjin;
Me standine bi şûran û riman e
belkî paşa jê hilgire hibreteka giran e

Derwêş go:
Apo dilê min liyane
xwedê wekîla, ez Derwêş nasnakim,xortekî cawan e
min tu caran nedîtiye bi çavan e
ya star, tu li min dikî van bêbextê hane

Kalo:
tu ne Derwêş î..., Siwarî Hedban î...??
tu pênc deqîqan iznê bid e
apê te teng û bertengê îda bişdîn e
ez û tu xwe berdin meydane mêran e
em dayînin hev du derb û nîvan e
ne hewceye tu herî nav cerd û koma giran e

Derwêş:
apo bi xwedê ez Derwêş ê Evdî me
ji pişta Eyşa Welêt qetiyam e
xelefa Evd ê Mulhim,siwarî Hadban e
xwîşkên Ever xwîşkên min in
van keçikan bibim bin konê Milan e
xalkê bêje; Êzîdîkî bi du qiruş û nîvan e

herdu qîzik girtine li qirşkan û qurmikan e
dibêje min standine bi şilfê riman e !

Kalo li Derwêş nekirbû rayî û îmkane
Derwêş vegeriyabû nav hevalan e
rabin min ji were dîtiy e
cihê cerd û koma giran e

Derwêş û hevalên xwe bi hevra firavîn xwarin,xatir ji hev xwestin. Li hev helal kirin mîna kurî bavane,soz û bextê mêran ji hev re dan.

Derwêş xwe berdaû nav cerd û koma giran e
Evrê Gêsan darê dûrbînê li ber çavan e
bala xwe dayê,teşkîla Derwêş Evdî
teşkîleke mezin û pir giran e
rayê dilê Everê Gêsî ji Derwêş qetiyan e
şandibû pêşiye Derwêş kekê xwe Etman e
birayê wî biçûk, zavayê heft rojan e
Dibêje;
Silavê min li Derwêş bike,bêje; paşayê Milan
tu şandiye vê cerd û koma giran e
ku tu sax nezîvirî nev xwediyan e
du xwîşkê min hene
yekê bi tedim,yek jî bo Sehdûnê biran e
herdu xwîşkên min bibe bin konê Milan e
belkî paşa jê bigire hibretka mezin û pir giran e

Etman dike û nake,ji Derwêş nake rayî û îmkan e
Derwêş şûr dikişîne ji qerdewan ji kalan e
derbek lê daye li qûlincî Etman e
cinazê wî kirî du percan e
evêtibû wê meydanê,erdî xwedan e

Ever xwe berdaye pêşiye Derwêş:
Derwêş bira dilê min liyan e
şeş salan berê ez û tu dest biran e
te birayê min Etman kuşt !
hisab bike tu li min bûye mêvan e
min beranê serkozê ji ter kire qûrban e
neçe ser kom û cerda giran e
Paşayê Milan tu şandiye bi hîlan e
ku sax venegerî li xudiyan e
dikê û nakê li Derwêş nake îmkane

Derwêş rabûbû ser qametî lingan e
bi teng û berteng hatibû Hedban e
berê Hedbane daye nav cerde giran e
li aliyekî navtêdane kurî bavan e
şirka-şirka şûran û riman e
ev şerê Rastemî Zal e,Hemzeyî pêlewan e
Elî şer derketiye ji beriya Wêranşar ê
qûça Çelogiyê kepezê Kîkan e
li meydane mêra,şad û şûdê Derwêş hene
qêmîşî rima xwe nake
lêxe li qûlincî siwaran e

bi siwarn digire,tavêje ji ser pişta hespan e
mîrek ji komê diqetiyan e
kom ji hev qetiyan e
bûne bi koman e,bi rêzan û refan e
şerê wan xweştira ji govend û dîlan e
ev şer ne wekî şerê han e
xweştira ji şerî Rastemî Zal e
xweştira ji şerî Hemzeyî Pêlewan e
şirka –şirka darê rima Derwêş
mîna tavî teyrokê, mînaye laylane
agir û birûsk diçe ji devî şûran e
qedera sê saetên şer qediyan e
tu bala xwe bidiyê
li pişta girê Qeyidê
bi sedan ji berx û beran e
ji egîd,fêrs û pêlewan e
birîndar û kuştiyê Turkan û Gêsan e
bala xwe didim ê
sund dixwim bi sunda qesemê
ji Derwêş û Hedban pêda
kesek li meydan e şer qet menane

bala xwe dayê li milî çepê
pazdeh-bîst siwar li Sehdûn civiyan e
Derwêş êrîş dabû ser siwaran e
xwedê xerabike fen û futên Ereban e
siwar ji ber Derwêş bazdan e
berê Derwêş dabûn bajarekî mişkan e

rast û çep herdu lingê Hedban şikiyan e
Derwêş birîndar bûbû birînên tîran e
sê-çar û pên derban e
Turk û Ereb êrîş dane ser siwarî Hedban e
siwar ser Derwêş kom bûnbûn,bi sedan e
lê lawê Evdî şer domkiribû bi rojane

***

... Derwêş wisa birîndar şerê xwe li gel Turk û Gêsan domand. Siwarên Turkan û Gêsan ceger nedikirin ku xwe rasta-rast xwe bidine ser Derwêş. Derwêş jî ji aliyekî tevî birînên xwe şer dikir û aliyek din ve kilam avêtibû ser xwe û hespê xwe Hedban û got:

Hedban o...Hedban o...Hedban o
min tu xweyî kirî bi salan o
bi şekirî kabikan o
bi şîr ê makan o
li te siwar nebûm
rojên şahiya û dawetan o
min tu hiştî ji bo rojan o
şer û cengên giran o

ji xêra xwedê re

careke din mîna caran o
ji min re rabuye ser lingan o
min dîsa xwe berdaye
nav koma Turkan û Gêsan o
te temaşe bikire şerî lawikî Êzidiyan o
bibe vira-vira darî riman o
cawa min li dora xwe kom kiriye
kuştî û birîndarên Turkan û Gêsan o

Hedban o... Hedban o
heye kekê Sehdûn saxe
te nahêlim di nav koma dijminan o

Hedban o... Hedban o... Hedban o
ma tu dengê Everê Gêsî nakî !?
dibêj;
Derwêş were teslîm bibe
ezê bi te didim hespa xwe Borborê
te bibim nav Turkan û Gêsan e
çiqas egîd û mezinên me hen e
em tev li ber kekê Sehdûn
têkevin bin çokan û zendan e
soz didim heye Derwêş Evdî sax e
emê cerda nabin ser Şerqiyan û Milan e

Derwêş gazî Ever dike û dibêje:
Ever o dilê min liyan e

heger tu derewa nakî
tê bide min taseke avê
ji kêleke Borborê ava kaniyan e
Ever o bizane heye Derwêş sax e
xwe hêsîr nade dest Turkan û Gêsan e

„Sê şev û sê rojên Derwêş di şer de qediyan e
zimanê hilkişiye bostekê û çar tiliyan e“

Hedbano... Hedban o... Hedban o
mala te şewitiyo
ez ne wekî te bê wijdanim
min ziman kişandiye
bostekê û çar tiliyan o
wa daniya li kêleke Borborê
ava çeman û kaniyan e
tu ji siwarê xwe re çenke
bavêje dera han e
belkî li canê siwarê te
bibe merhem û derman e

Lo Hedbano...Lo Hedan o
xwezî tu careke din wekî caran e
ji min re rabuye ser qametî lingan e
minê êrîş berdaye ser Turkan û Gêsan e
qasê kurdan azad bikirin e
ji zulm û zordariye wan e

belkî min hilaniya heyfa egîdan e
Çiloyê Hîzolî mehkumê destê xwediyan e
qatilê çar mêran e
ji welatê Hîzola rabuye
bûbû destbiratakê kekê Sehdûn e

Hedban o... Hedban o... Heban o...
xwezî tu careke din wekî caran e
rabuye ser qametî lingan e
belkî min hilaniye heyfa kekê xwe
Sehdûnê bê miraz xwedanê guliyan e
xelefa Evdî,yê Mulhim û Eyşa Welêt e
Emer û Bozan e
herdu lawên Ferhê Dolikî
belê hezar û pêncsed kuştî û birîndarên
Turkan û Gêsan e
nayên xelefa herdu guliyên Edûla paşayê Milan e

Emê dîsa Derwêş di şer û gevzandine xwînê de bihêlin, berê xwe bidin bin konên Şerqiyan û Milan.

****

...Piştî ku Evdî tê gihîşt ku lawê wî Sehdûn şehîd ketiye, hespa wî ji bo hawarê şandine Evdî û

Eyşa Welêt har û dîn bûbûn.
Şeve nivê şevê li her çil malê Şerqiyan bû heyde-heyîd.
Dengê hawar-hawara Eyşa Welêt qasê Şerqiyan ji xewê şiyar kiribûn. Di demeke kurt qasê Şerqiyan, jin û mêr,biçûk mezin li konê Evdî kom bûbûn.

Hatin,hatin yê peya dihatin,yê siwar dihat, yê ku qame şûr hilgirtin, yê ku rim dest xwe ve hilanî ber bi konê Evdî,yê Mulhim ve bazdidan. Wekî nav û namûsa kurdîtiyê, ya eşîrtiyê, xwîna ciwan û egîdên xwe li erdê nehêlin.
Şeva hêsayî, şiyar bûbû, stêrikên rûyê ezmên li hev diketin, hîve çerdeh şevî kete bin ewr. Şivanê guherê pez da hişiyar bûn, guhê xwe dane ser tevgerê çi qewimiye... Gelo koma Turkan û Gêsan gihane topraxê Milan...?? Şerqî bi ser hev ra diçûn, ewte,ewte kuçikan bû,ringe-ringa lingê hespan,hêrîna wan diçû ber perê ezmên.

« De bajo Evdî o bajo, agîdo bajo »

Her kesî dilezand, tajot, ber bi konê bavê Derwêş û Sehdûn ve bazdidan. Diniya li hev diket. Êzîdxane rabûbû ser piyan,kurd ji xewa mirinê hişiyar bûbûn!! kurd, Turk û Ereb wê koka hevdu bibirin. Yan Kurd,yan jî Ereb û Turk. Wê heyên kevin û nû ji hevdu hilînin.

Serê hespan berdan wekî kêlîkê berî kêlîkê bigihêjina hawariyê, ji xwe re namûsekê qizinc kin.
Evdî xeber gihandibû bin konê Paşayê Milan jî, paşa jî deng li Milan kiribû wisa wekî Şerqiyan li Milan jî hatibû, biçûk û mezin, mêr û kalemêr,jin û zarok li ber derê konê mezin yê Zor Temir paşa ê, Zengo Zêrin, bavê Edûlê kom bûbûn.
Ji bona roja nav û namûsê kî dikarîbû xwe bida paş, lê wê jin zarokan çi bigotane!?... Kelam,stran çawa ser derxistane!... Kesekî wêrabû li mala xwe bimaye!?...
Hawara Milan bi serkêşiye Evdî gihabû hola şer. Yê ku ji ber şerê Derwêş û hevalên wî xelas bûbû, Evdî bi kom Şerqiyan û Milan tev dabûn ber devê şûran, yê hate kuştin yê ku birîndar bû yê ku ji xwe re bazde.
Milan şehîdên xwe bi çal kirin û vegerîyan warên xwe ser firaz û azad.
Paşayê Milan biriyar xwe da bû ku jina pêşin di nav êlê de biwelida, xwedê ewledekî bide wê, wê navê wî ewledî dayînin"Derwêş" ewldê dudwan, navê wî wê Çîlo be, yê sisiyan Sehdûn be û her weha paşa biriya da ku heya salekê jina ewladekî bîne wê navê her heşt şehîdê azadiyê li ser lawên xwe dayine.
Di nav her çil malên Şerqiyan de jî bûka Şiwêş welidî xwedê kurek dayê, navê wî danîn Derwêş.

Xwîşka Çîlo ya mezin welidî xwedê qîzek û kurek cêwî dayê navê wan danî Çîlo û Edûl. Piştî çil rojî, xwîşka Çîlo " Îslam" ya biçûk welidî xwedê kuerk dayê navê wî danî Derwêş. Çil rojên Derwêşê kurê Îslamê qediyan,îslam Derwêş bi xwe re rakir berê xwe da bin konê Evdî, Evdî bi xwe biribû û çûbû ba xwîşka xwe mezin diya Çîlo û Edûl û got:

- Xwîşka min! Min Apê Evdî bi xwe re anî ez hatima ku qîza te Edûl ji bo kurê xwe Derwêş bixwazim.Heger sedemên olî, gevezan nehiştin ku şêrê kurdan Derwêşê Evdî û Edûla xwedane morî û mircanan, qîza paşayê Milan bi evîna xwe şa bibin, pêwîsta Derwêşê Îslamê û Edûla te bi mirazê xwe şa bibin.

Dewêş û Edûla hîn di pêçekê de şêraniya wan xwrin.

Em herdu zarokan „ Derwêş û Edûl xwarzên Çîlo di Pêçeka wan de bihêlin heta mezin dibin, werin ser Edûla Zor Temir Paşayê Milan.

****

Edûl bi evîn û kulên Derwêş Evdî re medehoş bûbû, bi rê û rêbaran diket, pirsa siwarê Hedban dikir, tiştek di dest Edûlê de nemabû ji belî rondikbarandin û girêdane qeyîd û stranan . Edûlê

soz xwe bi Derwêşê Evdî re xerab nekir û piştî Derwêş mêr nekir.
Edûlê dest avêta helbestê û li ser evîna xwe û lawikê xwe Derwêş helbest girêdan. Navê wî di helbest û qeyîdên xwe de danî „ Delal“
Em bikevin deriya evîna Edûla Milan û Derwêşê Evdî ji aliyê helbestên Edûlê ve „Delal“

****

Beşa dawî „ Delal“

Edûl dibêje;

Delal dilê min dêre
hilatî benda qurixê sêtreke bi şewqa wekî mecal xêre
bila şewq û şemala vê stêrê lênexiste
bilaniye Serhedê pozê Bingolê mexelê mor qurîne pezê nêre
bila pêra-pêra xwe neda pira Batmanê sur û
bedena bajarê Diyarbekirê peytexta qerêle
kelha Mêrdîn ê pozê zinêre
bila pêra xwe neda qurmê Qerjdaxê
cî û mekanê zerî û esmere
ciyê yatax û kula mandelalê,textê xwendikêr e
bila di pêra şewq û şemala vê stêrê lênxist e
beriya Wêranşarê nav hewra Milan e
dîreke bîst û çar eşîrên kurdan,benda eşîran kutan
bila di pêra lênexiste li pozê Kîka li devê xabûrê begêr e
bila di pêra lênexiste neqebe tek-teka
dugerna şikeftê Samarê mixarê beriye Herupî
nizan im pêgera meşhêne,nizan im pêgera siwêr e
delal beyabe were jêr e
taximê sing û berê min ji ter e
bûne mêrga çuqleşiyê quriya dewletê
hewceyî xatûnê, nefel têde xêr û bêr e

peyab-peyabe li hêlekê bike henek û misqal e
li hêla din nûmal û misqalê te têde biçêr e
Delal peyabe were jêr e
sing û berê min ji tere bûn bexçê Himaloxlî
dorê wî di sur in,surê wî bi qapîne
qapiyê wî bi begçîne, begçiyê xwe
ji gerima Îraqê anîne,wekî bavan kurdîn e
min ji bo xatirê te
qapî şkandîne
begçî qewtandîn e
çil û çar çapê zîvî pirtandîn e
peyabe sîng û berê min ji te re bê xwedîn e

Delal bila min serê xwe daniye ser
kêle kevirî axe van kendale
bila ez nebûme keça paş, beg û ne qeral e
sê rojin,sê şevin min xwe nedaye ser balîve
doşekan,xwe nedaye sertext û rewal e
zend û bendên min hişk bûne
nizanim ne ji zîlabendê Diyarbikrê
û ne jî ji xeyal e
stûyê min xwar bûne ji xeraqa ji guhar e
miz û milê min sist bûne ji rakirin e
fincanên ferforî ji van peyal e
min digot; were bavo,emê gaziye xwe
bighînin pênc hezar malên Şingalê
xwe bavêjin ocaxa malê bav e

ocaxa mala Adiya,tev ziyaret e
Pîr û Şêx û van Qewal e
bila digaziye me werin,konê me
mezin xelaskin ji devê şûran û metal e
yê weke Everê Gêsî û Ibrahîm ê Turk o
li ser sînga me kurda
ranekin ne beyraqa, tal e

xwezî min xwe bernede bin konê Evdî,yê Mulhim
min negote delal were mal e
min ji delal re avêtin erdê sê karî xezal e
yek ji bo lawikî Êzîdî,dudu jî ji bo hogir û heval e
ez li kêleke delal rûnştim
tengalê xwe da tengal e
bi delal re ketim aşqa dil e
destê delal kete nav taximê sîng û berê min keçikê
nav beniye zêr,morikan,mircan û kehreban e
bi delal re ketim aşqa dila û gala-gal e
beşera dilê min delal

****

Dema ku delal gihîşte bin konê Milan e
ez derketim pêşiye delal bi xemil û xêzeke kurmanciy e
mînaye xemil û xêze bajarê me Urfay ê
min ji sibê de ji delal re qehwa Yemenê kelandî
min danî ser tebeqa zêrî

bi destê xwe yê hine kirî
minê fincana qahwê didayê
bi qahwêre sîng û berê xwe tiştîrê didayê
piştî vexwarina qehwê
delal tevî heşt siwaran me Milan
xwe berda deşta Wêranşar ê
piştî delal sebir û hedane min anyê

****

Ava talanê ketiye konan e
agir ketiye malan e
kalên heftê salî
xwe dane ser kopalan e
bûkên salê derketin
ji bin çîtan û perdan e
ji deşta me ye jêrîn
radibe toz û lêlan e
hineke digotin; tewlê nejdan e
hineke digotin talan e
hineke digotin dewran e
hineke digotin ferman e
min dît celebek siwarê me kurdan e
siwarê pêşî Elî,ê Mistê ye
rima di dest de ji darî çam e
bidilê min xist agirî daran e
kalên heftê salî derketin pêşiye wan e
min dizanî şer giran e

siwarê duduyê kekê Şêx e
siwarê sisiyan Bozan e
siwarê çaran Silêman e
siwarê pêncê Sehdûnê biraye
siwarê şeşê farisê Miliye
pêlewanekî nav giran e
siwarê heftê Çîlo,yê Hîzolî tayê bi tenê
birayê pênc xwîşkan, bi Derwêşê Evdî can bi can e
siwarê heştê girgirê Miliy e
siwarê nehê Mistê ferhê ye
siwarê dehê Elî,yê Zêdê kekê Kerxê
lokê deşta Sirûcê ye
siwarê yazdehan,min bala xwe dayê
Mehmê Temê ye
siwarê dûnzdahan Usivê bê şûr û bê mertal e
nivîsarê şeran û cengan e
lê min delal nedît di nav siwaran e
hingê min bi mirine delal kirî înan e
siwar vegeriyan li xwedî û malan e
xelkê perdê reş ji ser konan hilanîn e
perdê kesk,sor û zer bi kona da berdan e
bi dil û cegerê min xistin agirî daran e
delal ne bi jine, ne bi mal e
kesek naxwe xema tu kesan e
min xwe berda pêşiya Sehdûnê biran e
Sehdûn go Edûlê nexwe tu xeman e
Derwêşê te li beriya kurdan e

ketiye pey siwarê Gêsan û Turkan e
di nîvê şevê de Derwêş ê te
wê vegere li mal û li xwediyan e
lê Edûlê bizane şer giran e
Beşera dilê min delal

Piştî nîvê şevê,nizan im seat ketibû yekê ne
duduwan e
pista-pist ketibû konan e
li çavê hev nerîn xwediyê şûran û mertalan e
di bin konê bavê min de hat şîhîne hespê delal e
dengê hespê delal di bin konê bavê min hilaniyê
dilê min qîzikê dirihilî û ne ditebitî
piştî gihîştine delal dîwana Mila
min li dîwanê nerî,dîwaneke dijî
min go lo mêvano, lo delal o
ji êvar de qehwa ji tere dikeliye û diqij-qijî
min rakir fincana fera-firî
min danî ser sifiriye zêr î
ez nizan im, ne aşqê canê min girt
nizanim ne lingê min li sola delal likûmî
bejina min li pêşiye lawikê Êzîdî dihjhijî
qehwa Yemenê bi ser delalê mala bavê min de rijî

Li min nemayê,li min gerdane xeliyayê
li min hestî şikiyayê, li min pepoka Mlayê
tirsa min ewe,siba di şer û cenga Turkan û Gêsan
de

heval û hogirên delal, ji delal bikin lomayê
ezê rakim sabûne Bexdayê
rakim çil keçikên me Milayê
xwe berdim ber ava Muradê aveke xilbeye talî
nayê
min şehra Riwêsê da ber darî keleşayê
lê sebir û hedane min pê nayê
min bala xwe dayê
şehra Riwêsê nayê rayê
rakim şehra delal xwe bighînim ser ave
Eûdê, aveke zelale,talî nayê
dîsa şehra delal da ber darî Keleşayê
bala xwe dayê nayê rayê
şehra serê delal xeriqî
ave kaniyê tev çikî
qehwa Yemenê ji ser şehrê ne dilebitî

****

Delal dilê min dêr e
dîsa siwarê me xwe berdane deşta me ya jêr e
min xwe berda pêşiya delal
bala xwe dayê sê siwar in
zengî dane zengiy e
siwarî tewrî pêşî,siwarbûne delêl e
siwarî duduwan, Aliyê Zengêr e
siwarî sisêyan, xwarziyê Teyêre

di bin delal de tê bar-bara hespî nêr e
dest avêtî hefsarî nûmanî nêr e
min go delal were jêr e
delal ez te nadim,bi Ahmedî Bişêr e
te nadim bi Ali,yê Siwêr e
te nadim bi Hasê Zûbêr e
te nadim bi Hemê Musik e
lo delal te nadim bi bavê xwe
Zor Temir Paşayê Milan e
heftî salin ku qirûşekî wî nekitiye xezîne xûndkêr e
hezar û hefsed siwarên Kîkan û Milan
ji xwarine goşt û birincê dikirin têr e

****

Delalê min lawê Evdî,yê Şerqiya
Evdî Şerqî,ji deşta Wanê,ji taximê
Salihê Seydo axayê kurdada
heta deşta Mosilê,herê Abdil-Ezîzê
tixubê Cibir e
heftê û pênc sala di şer û cengan de
xwe nekir destê Turkan û Ereban de

Beşerd dilê delal

****

Delal were jêre

li peyabûn delal ezê bidimê ramûsanekê
ji xum-xumê gerwriyê ji nav morî û mircan e
ezê ji Derwêş,ê xwe re li erdê xim doşeka Xursê
li ser raxim lihêfa bajarê Qursê
qelûna delal dagirim ji tutina Mûş ê
herdu tiliyên xwe ji delal re bikim nav agir û pêt e
bila dela bigote,Edûlê te xêr e

havîna meya bi gerim û kîn e
zivistana meya bi seqem û berfîne
payîza pel weşîn e
bihara meya xweş rengîn e
tu were bi guliyê min bigire
bavêje ser pişta hespî nêr e
bila di nav heştê û yek eşîrên kurdan de
bêjin; Edûla Paşayê Milan e
di bin konê Evdî,yê Mulhim de bi mêr e
ji bilî sindoq û sebetên bûka
ji min re rakirine tevir û bêre
Delal tu li çiya,mêvano li gere
bila yezdan mirazê xwendevan bikire
mirazê min û lawikî Êzîdî jî bikire
paşê îzrahîlê qasidê mirinê
bihate emanetê xwe ji min bistande
canê min bibirie

loma ji min nekin gelî heval û hogire
gava çavê min li Kûkebî Mila
li lawikî Êzîdî dikeve
sewdanî min difire,can pêre

delal ez,a bê mal im
ne bi malim ,ne bi mêr im
ne Bayaza Elo me
ne keça Hemo me
dotmama Elî me
keça paşayê Milî me
yara Derwêşê Evdî me

****

Bi jana delal ez dimirim
ji bo delal ta digirim
bi xemil û xêza xweve
li pêş dîwana Milan de
diçim u têm û dixindirim
lo delal ji bo te
rojê sê caran ez dimirim
delal dilê min ne polate û nejî kevanekî hesine
derdê xelkê mal û milkê diniyê
yê min aşqa,meraqa dilaye û dilketin
li pozê Qerjdaxê sê konên vegertine
yek jê konê bavê min e

yek jî konê Emerê Haciy e
yek jî konê Derwêş Evdî ye
xwestekî canê min e
konê mezin li ser heştê dîrekî,kes têde nîn e
mînaye mezelî bavê min e
kesek ji omedî Muhemed nîn e
bi destê min bigire bavêje bine
xwesteke min ji rebî jor e
xwe bidîte di bin konê Derwêş de
kebanî û bermalîm e
Derwêşê Evdî îlac û dermanê kula min e
Beşera dilê min delal

****

Çavê min li pêşiya delal qerimîn e
min dît siwarek tê ji beriyê dikutin e
jêra dibêjin; Elî siwarî me coriy e
min rahişta teşiya Mûşî,destekî zêrîn e
min xwe berde pêşiye siwar
min go;
lo siwaro dilê min ji dila dilekî dîn e
ji kula de,bikula,ji birînde, bi birîn e
birînên min li min axivîn e
sê rojin,sê şevin,Edûla Milan bi qîrîn e
bi hawar û qîrîn e,
erdî dibhîze,ezmanî hiltîn e
sê şevin,sê rojin,delalê min xwe berdaye
xêma beriya meya jêrîn e

ez nizan im ne sax e,yan bi birîn e
tu saxbûne delal bi min bighîn e

Siwar go lê qîzê;
Siwar pirin li deşta beriyê
Delal hene,delalê delalan e
Pir qîzên weke te li benda delalê xwe ne
Delal hene ling û qerem lê şikîn e
Delal hene di deşt û siwêreke re revîne
Delal hene birîndarin,birînên wan çar tilîn e
Delal hene sê şev û sê rojin çek û zilx ji xwe dananîne
Ji min re bêje nav û nîşanê delalê te çîne ?

Lo siwaro nav û nîşanê delalê min belîne
li delal kirasekî melasîn e
li milê delal zilxê dawidîn e
bi ser zilxê dawîdî de berdaye habakî hasewîn e
bi ser habada berdaye meşleha zelalîn e
li sînga delal bişkokên polatîn e
li nava delal kembereke zîvîne
şapikê delal qelemîn e
li serê delal şehreka Riwêsê
bi arîkariye çil keçikên Mila guliyê şehrê baydayîn e
simbêlê delal bi hina Urfa,ya şewitî sorbûyîne
Hedbanî delal girgirîne
rima delal omediye

şûr û qerqalê delal kasa misêrbin e
serê rima delal bi guliyê Edûla Milan xemilandîn e

Siwar go lê Edûlê:
siwarê tu dibêjî; Derwêş î Evdî, ye
delalê Edûla paşayê Milî, ye
vexwariye fincana qahwa bi xwîne
li beriyê çavê siwarên Turkan û Ereban jê şikestîn e
çiqas kuştî û birîndarên wan hene bi destê wî ne
em bêjin delalê te qelbandin li erdî qûla mişkan e
herdu lingê hespê wî têde şikastîn e
xwe berde erdê beriyê bi saxê delalê xwe bibîn e
min avête evdê teşiya Mûşê,giloka zêrîn e
min xwe berdaye erdê beriyê erdekî xayîne
min bala xwe dayê delal bi birîn e
ez ji berê de dizanim,siwarê Êzîdxanê,rim gerîn e
li şer û talane,li ceng û ferman e
serê xwe li ber dijmin dananîn e

****

Hayê delalê Edûlê rab e
bejina min zirava ji te re xemilandîye
eniya kala gewira ji te re rapelîne
biriyê min zirafin,reş tarîn e

çavê min belekin ji te re kil dayîne
dêmê min gulîn e
rûçikê min ji te re sêvên xelatîn e
sor in him zer û sipîn e
pozê minî têlîn e,
xelekî bi ser lêvanda min berdayîn e
bi ser de berdayî xizemeke zêrîn e
lêvê min tenikin,wekî pelê tutinîn e
diranên min hûrin, dev dixemilîne
gweriya min zirava ji te re dizgarin e
çengê min topin! Li bajarê Şamê
di nava hinê de danîne
guharê min zêrîn in, bi ser gerden e
xeraqê guliyan de berdayîn e
li bajarê Diyarbekir e şewitî
bi destê hosta kutayîn e
li nava min kembera zîvê heynelîne
memikê min ji te re hinarê Meltiyê
di taxim û sînga min de rametîne
sînga min beyaz e
qirka min bi çîn e
li serê min şehreke bi gûl û rêşîn e
guliyê min bi morin ji te re tizbîn e
delal ez kewa Şingal û Êzîdxane jorîm e
ordeka xaburê jêrîme
qaza Feratê hêlîm e
keça paşayê Milî me
li vê diniyayê ne layîqî tu kesî me

ez ne layîqî pismamê xwe Usivê Elî, me
ne layîqî Miho Paşayê zêrî, me
ez ne ya faris û girgirekên Milî ,me
ez ne ya Ibrahîmê Turk û Everê Gêsî me
ez layîqî Derwêşê Evdî lawikî Êzîdî me
piştî Derwêş,layîqî mezelê Şingalê
gora reş û tarî me
Beşera dilê min delal

Delal ez nemînim
di pişt te re delal ez nemînim
qehwa Yemenê ji kesî re nakelînim
li dîwana paşayê Milan nagerînim
bejin û bala xwe ji kesekî re naxemilîn im
lo delal piştî te nadim ti soz û qerare
ti bext û miraza ez nabîn im
li ber darê dergûşê rûnanim û nahejîn im
ezê bi serê çiya kevim û bilorîn im
her û her bêjim delal
bi serê çiya kevim,bêjim delal
bi dengê bilûra şivana re bêjim delal
bi gurma-gurma tavê biharê re bêjim delal
hey lo del delal bi gav û seatê delal
siwarê mala bavê mino delal

De way-waylê, de way-waylê
Delalo, mîrê Ûnisî vê sibê deng li çêra kir
got:"gazî Derwêşê Evdî kin
weynin heramê dîwanê
destê lêxin kelamçê ye
lingê deynin li qeydê ye
bigrin, bavêjin zindanê ye".
Delalo, dilîko
te malî piro êlî hindiko
ji xelkê re ne tişteko
ji min, her tiştoez daketime deşta Bêlecûko
têkevime nava hezar û hefsid hinarî,
hinrekî ji xwere hilbijêrim, şîrino, bê dendiko.
Way-waylê, way-waylê,way-waylê,
Delalo, tu delalî.

De way-waylê, de way-waylê
Derwêşê Evdî gote mîrê Ûnisî
Ev xeber ji devê te û heft bavê te zêdeye
heta tu destê min deynî kelamçeye
lingê min lêxî qeydê ye
min bigrî, bavêjî zindanê ye
bi îzna rebê alemê, ezê sêsid mêrê Ûnisî
rehet kim orta dîwanê bi soranîyê ye".
Way-waylê, way-waylê, way-waylê,
Delalo, tu delalî.

Way-waylê, way-waylê, way-waylê,

Delalo, minê vê sibê ji xwedanê xwere çi bixwesta
jê çi bixwesta?
mala bavê min bar kir, danîye zozanê
Şerfedînê, çîyayê Eledaxê, çîyayê Giridawê,
hersêk mil bidana, serkonê mala bavê min,
bihata xarê, stûna konê pêşin ji ortê ve bişkesta
Derwêşê Evdî, hûtê binê berîya jêrîn
Siwarê Hadban, xwedanê zeng û zêrîn,
bajota, bihata derê çadira min porkura,
Xwedê bi sekinîya, şîrin taseka ava sar ji min bixwesta
Minê dest bibira cêba xwe, tasa zêre-zîve
nexşkiriye derxista, biçûme ser kanîya
Kurd Elo Memed paşa tijî ava sar kira,
banîya, pîr, marîfet, kemedar bûma, bidama li desta
awirê çavan, birûyê belek,
şirikê xizêma xwe bi lêvê xwe bi gesta.
Delalo, deliko
te malî piro, êlî hindiko
xwedanê şeşxana kiniko
ji xelqê re netişteko
ji min re hertişto

dakevime deşta Bêlecûko
têkevim nava hezar hefsid hinarî,
hinarek ji xwera hilbijêrim, şîrino, bêdendiko
Way-waylê, way-waylê, way-waylê,
delalo, tu delalî.

Way-waylê, way-waylê, way-waylê,
Çûme odê, ode têre tijî, çûme dîwanê, dîwaneke têre tijî
mesînê qahwê ser dar çîmê wê dikelijî
min go:"Qaweçîyo, yekê tijîke,
bide destê delaliyê dilê min jî".
tebata dilê min neda, minê destê xwe dirêjî
fincana qahwê kir,
tijî kir, birda desta, minê nizanibû ji şerma bû,
ji germa bû, ji tirsa bû, destê min reçivî,
çoka min lerizî,
niqutek rijiya ser ebayê Besrayê Derwêşê Evdî rijî.
Kubara sibê rabûm, min qûlî zêrê serê xwe qetand,
çûme li Hemayê, li Hekayê, li Şamê, li Bexdayê,
derê dikanê wan beqala min da heft qalib reqîya sabûnê,
hildam pêda-pêda meşîyam çûme ser ava xabûrê,
minê ebayê Besrayê Dewrêşê Evdî,
hûtê binîya berîya jêrîn, siwarê hadban,
xwedanê zeng û zêrîn,şûştî ye,
heft qalib sabûnê destê min de mefîyaye,
ava Xabûrê, bextê min porkurê, ser min demiçiqîye,
eba Derwêşê Evdî temîz nebû ji vê qirêjê,
ku li derdê eba ma dilê min jî.

Delalo, deliko

te malî piro, êlî hindiko
xwedanê şeşxana kiniko
ji xelqê re netişteko
Ji min re hertişto

dakevime deşta Bêlecûko
têkevim nava hezar hefsid hinarî,
hinarek ji xwera hilbijêrim, şîrino,bêdendiko
Way-waylê, way-waylê, way-waylê,
delalo, tu delalî.

Way-waylê, way-waylê, way-waylê,
Delalo behare, heramê derketine
xanî germ bûne, kêç ketine
Pîra dîya min hatîye ber mirinê
Kale bavê min hatî ye ber şûştinê
Heft birê min porkurê hatine ber kuştinê
wexta çavê min li çavê Derwêşê Evdî,
hûtê binê berîya jêrîn dikeve,
ji min tirê temama saxin hingî rû dinê.
Delalo, deliko
e malî piro, êlî hindiko
xwedanê şeşxana kiniko
ji xelqê re netişteko
Ji min re hertişto

dakevime deşta Bêlecûko
têkevim nava hezar hefsid hinarî,
hinarek ji xwera hilbijêrim, şîrino,bêdendiko

Way-waylê, way-waylê, way-waylê,
delalo, tu delalî.

Wey delal, wey delal, wey delal, wey delal
ber dilê evdalî xwedê de, tiyo netişteko
ber dilê min evdala xwedê de, hinarî deşta
Bêlacûkê, xurê kalan û pîran bêheb û bêdendiko
di devê, mesînê qahwê ser darî darçinîya dikelijî
ezê çûme alê dîwanê, dîwaneke tijî
ezê çûme alê malê, maleke tijî
ezê çûme alê odexanê,şêst û pênc pêlewan têde rûniştî
wexta min çayê û qahwe digerandî,
xema min mehrûma xwedê nebû
wexta ezê diçûme koşa Derwêşê Evdî, lewandê şevê, lawkê Êzîdî
nizam kerbiyana bû, şerma bû, yan ji tirsan bû,
çavê min reşeve dihatin, tilîpêçîyê min,
dihijyan, çokê min dilerizîn, minê niquteka qahwê,
rijandibû ser eba Derwêşê Evdî.
wey delal, wey delal, wey delal,wey delal
ezê pey Derwêşê Evdî, lawkê Êzîdî re, nabêjim tu delalî

Diwê navê kapêk pol pere cem min tine bû
Minê destê xwe bire nava sîng û berê xwe,
zêrekî diha dîtibû xercê şeherê bavê minî heft sala bû
minê hildabû, ez çûme dikanê van etara

minê go, dikançîyo, ha, dikançîyo, minê niqutka
qahwê rijandî ye ser eba Derwêşê Evdî
minê hildabû heft qalib sabûne, teşt û sîtile,
ezê çûme ber çemê payê vê mîrayê
çemê payê mîrayê, ava çil û çar kanîya bû.
ava çil û çar kanîya min şikîya bû
tilî pêçîyê min maşîya bû
heft qalib sabûna min helîya bû
teşt û sîtilê min qul bibû,
hê niqutka qahwê ser eba Derwêşê Evdî neçû bû.
Wey delal, wey delal, wey delal,wey delal
Ezê pey Derwêşê Evdî, lawkê Êzîdî re,
navê mêra nayînime ser xwe.

Divê, beharê, heyamê êlê derketinê
malê me kevin bûne kêç ketinê
heft kurapê minê ber girtinê
Kale bavê mine li ber mirinê
Pîredayîka mine li ber şûştinê
çaxê çavê min çavê Derwêşê Evdî dikeve,
minê tirê, gişte xweşe rû akara dinê.
Wey delal, wey delal, wey delal,wey delal
Ezê pey Derwêşê Evdî, lawkê Êzîdî re, nabêjim tu delalî

Mîr go:"Gelî qewaza, rabin pêya
herin bêjin Dewrêşê Evdî bê, mîr te dixwaze ji dîwanê ye".

Cotê qewaza rabûn pêye
çûn go:"Derwêşê Evdî, mîr te dixwaze ji dîwanê ye!"
Derwêş hat go:"Mîr, te çi divê ye?"
Mîr go:"derwêşo, dilê min dibê ye
Wexta li xamê jêrin dibe qîrîna kurê,
kurmanca, norîna meneqîya, şingîna kose misirîya,
wexta xûn devê zenguyê meneqî yane, gelo wî çaxî,
mêr beramberî çend mêraye?"
Derwêş go:"Mîr, dilê min dibê ye
Wexta xamê jêrin divê qîrînîya kurê
kurmanca, norîna meneqîya, şingîna kose misirîya,
wexta xûn devê zenguyê menegîya, ancax,
mêr beramberî mêr dertê ye".
Mîr got:" Gelî qewaza rabin pêye!
destê Derwêşê Evdî lêxin lelêye!
stûyê wî lêxin kelemçêye!
lingê wî lêxin qeydê ye!
milê Derwêşê Evdî bigrin, bavêjin kela zîndanê ye!".
Wey delal,ezê pey Derwêşê Evdî,
lawkê Êzîdî re, kesekî re nabêjim tu delalî

Derwêş go:"Mîr, ezê wî kim Îlahîye
ez gava rabim pêye,
ezê te temam kim sêsid û şêst û şeşmêrê di rimêye".
Mîr go:"Derwêşo, dilê min dibêye kivava kara

karxezlê ye".
Derwêş go:"Mîr, dilê min dibê ye
dilê te ne kivava kara karxezlê ye
Tu dixwazî min bi şînî pêşîya,
hezar û hefsid mêrê eskerê Emerê Ûnise, min hatî xezebê ye".
Wey delal,ezê pey Derwêşê Evdî,
lawkê Êzîdî re, kesekî re nabêjim tu delalî

Agahdarî

Ji bo çapxan an û weşanxan an.....

slaveke gerim

Berêz Heso Hurmî ji aliyê min ve, ez Amer Çelik hemu maf standine.
Ez vî mafî didim kekê xwe Heso Hurmî ku ser pirtûka min(Destan e Derwêsê Evdî) bixebite.
Nimûne; wekî çapkirin û her weha nivîsandina pêşgotinekî .....

Nivîskar
Amer Çelik
Elmaniya 11.07.09

زنجیرەی چاپکراوەکانی ساڵی 2011ی وەزارەتی رۆشنبیری و لاوان

بەڕێوەبەرایەتی گشتیی رۆژنامەنووسی و چاپ و بڵاوکردنەوە

بەڕێوەبەرایەتی بڵاوکردنەوەی هەولێر

ژ	ناوی کتێب	ناوی نووسەر	بابەت	نرخ	لاپەڕە
532	مذكرات يوسف حنا يوسف (أبو حكمت)	يوسف حنا يوسف	مذكرات	5000	264
533	لە کەناری هەرزو زمان و ئەدەبدا	عەبدولڕەحمان مەعرووف	وتار	2000	192
534	لێکدانەوەی شیعر و ئامازەکانی پشتەوەی تێکست	ئاوات محەمەد	ڕەخنەی ئەدەبی	2000	184
535	پیاسەیەک لەگەڵ زەردخەنەی (با)	سەرهەنگ خامۆش	شیعر	1500	120
536	بژی نیشتمان	و. عەبدولستار جەباری	چیرۆک	1500	112
537	پەندێن ژیانێ گوتنێن زانا نافدارین جیهانێ	محەمەد سالح پێندرۆیی	گشتی	5000	328
538	خەم و خەندە	عوسمان رسول	شیعر	1500	120
539	هونەری گوێگرتن	و. بەهزاد حەویزی	دەروونناسی	3000	246
540	فیلەکەی نادر شا	د.موحسین ئەحمەد	ڕۆمان	1000	64
541	فێمێنیزم و چەند خوێندنەوەیەکی تازە	و.ئامادەکردنی:بەیان عەزیزی	گشتی	3000	200
542	هونەرەکانی پەخشان لەگۆڤاری ژاری کرمانجیدا (1926-1932)	مستەفا سالح مستەفا	ئەدەب	5000	224
543	فیکرو فەلسەفە دەقی جیهانی	و. تاریق کاریزی	لێکۆڵینەوە	5000	336
544	ئایندەسازی	تاهیر عوسمان	کۆمەڵە وتار	3000	192
545	مرۆڤ و جڤاك	د. عارف حیتۆ	کۆمەڵە وتار	3000	312
546	بیرەوەریەکانم	مستەفا عەسکەری	بیرەوەری	5000	360
547	هێلانەکەم لە کوردستان	سازان مەدحی مەندەلاوی	گشتی	5000	304
548	عەلی شوون هەڵگر	ئەحسین شێرەانی	فۆلکلۆر	2000	80
549	خەبالێکی پووچ	بەختیار نادر	کورتە چیرۆك	1000	40
550	هەقایەت وئەفسانەی میللەتان	ئیدریس عەبدوللا	فۆلکلۆر	3000	272
551	ئەدەب وەك بەشێك لەڕوح	غەمگین بۆلی	لێکۆڵینەوەی ئەدەبی	2000	136
552	دەروازەیەك بەرەو فەلسەفە	کامەران تاهیر	وتار	1000	88

575	فێربوونی زمانی ئینگلیزی لەسەر ڕاهێنانی ئەمریکی و کەنەدیەکان	ڕەحیم شا محەمەد	زمان	2000	184
576	هزركرن د پرسێن فەلسەفێ دا	محسن ئۆسمان	هزر	3000	340
577	بووکە بەردینە	ئازاد کەریمی	ئەدەب	2000	128
578	بنیاتی هونەری لەشیعری ئەحمەد موختار بەگی جاف دا	م. سعد فاروق یوسف شیخ بزێنی	ئەدەب	3000	248
579	تاقیگەی دیقیدی	ئا. ئەنوەر نیلوفەری	IT	5000	416
580	بـــــەپێکیك دەڵـــێم بمبـــــورە ناتخۆمەوە	چنار نامیق	شیعر	2000	144
581	ئەنفال	شاخەوان شۆرش	سیاسی	3000	104
582	آیین یارسان	بەهمەن بەهرامی	گشتی	3000	400
583	کاتێك شیعر زمانی دەپژێ	سوارە قەڵادزەیی	شیعر	2000	344
584	أرض على قرني ثور	هونر كريم	روايە	1000	104
585	خەتەنەکردنی مێینە زیانەکانی و حەرامکردنی لە قورئاندا	و. محسن حسێن شێخ محمد	گشتی	2000	112
586	رێبازا سێیەم	و. جەنگیز شکاك	هزری	2000	160
587	DERWÊŞÊ EVDÎ	Amer Çelik	Destan	1000	176

553	خەونی شادی	کۆکردنەوەو نووسینی نیازی حەمە عەزیز	شیعر	2000	208
554	چەپکە گوڵێکی ڕێبوار بۆ کوردستان	ئەبوبەکر عەلی ئیسماعیل	شیعر	2000	248
555	سیاسەتی ئەمریکا لە کوردستان لە ڕوانگەی پسپۆڕانی ڕۆژئاوایی	ئا: وریا ڕەحمانی	سیاسی	4000	280
556	سیاسة الحكم	ترجمة: عبدالرحمن الباشا	دراسات	3000	168
557	کوردو ئیسلام	ئەحمەد بالایی	میژوویی	5000	548
558	ساتی ڕاستگۆیی	و: شەرمین عەبدوللا	کورتە چیرۆک	2000	136
559	مەرگی گەرانەوە	سامی سلێمان فەقێ	ڕۆمان	3000	204
560	دەردی دووری	د. ڕەفیق شوانی	شیعر	2000	208
561	پرسیار لە دەرەوەی سێوەکەی نیوتن	ئا: سۆران عەزیز	گشتی	3000	416
562	عەروز وەکو پێوەرێک بۆ ساغکردنەوەی شیعری نالی	یادگار ڕەسوول باڵەکی	لێکۆڵینەوە	4000	624
563	هەورە تریشقە	موکەڕەم ڕەشید تاڵەبانی	چیرۆک	3000	168
564	بەڵێنەکانی ئینگلیز و گوتاری منەوەرانی کورد	بەهات حەسیب قەرەداخی	سیاسی	2000	120
565	فاعلية المسرح الليبي.. بين الفكر والفن	أ.د. فيصل ابراهيم المقدادي	فنون مسرحية	5000	544
566	پل	عەزیزی مەلای ڕەش	ڕۆمان	3000	296
567	شیکارە ئەدەبییەکانی ڕۆژنامەی خەبات (2003-2006)	د. ئاریانا ئیبراهیم	ڕۆژنامەنووسی	5000	560
568	یانەی وەرزشی سۆلاف لە یادی (41) ساڵەیدا	ن. ئا: شێخ ستار عەبدوللا بەرزنجی	وەرزشی	4000	296
569	پێنج داستانی کوردەواری	یاسین حەسەن گۆران	فۆلکلۆر	3000	248
570	النظام العالمي الجديد وقضايا الفوضيات والأقليات في الشرق الأوسط	ريبوار عبدالرحيم بابكەيي	سياسي	3000	288
571	وەرە با یاری بکەین	وەرگێڕانی: ڕۆشاد محەمەد موراد	زانستی	–	48
572	سیڤیلیەکان2	ئا- وەرگێڕانی: شێرزاد هەینی	گشتی	3000	264
573	الادب الكوردي	د. كمال معروف	ادب	2000	80
574	منطقة ريكان	أراز أسماعيل عبدالله الريكاني	جغرافية	2000	96

چاپخانەی ڕۆشنبیری

١٠٠٠ دینار